Dîwan
Seyid Eliyê Fîndikî

Amadekar
Kurd û Kurdistan
Selman Dilovan

Nûbihar

Weşanên **Nûbihar**: 20
Rêza kurdî: 12

DÎWAN
Seyid 'Elî Findikî

Nusxa eslî
Ji destnivîsa Evdurrehman Erzen
Sala 1387 h. / 1967 m.

Sûretê bergê
Seyid 'Elî Findikî

Amadeyî ji bo çapê
Nûbihar

Editör
Süleyman Çevik & Selman Dilovan

Çapxane
Enes Matbaacılık

Çapa yekem
1999 Tîrmeh (Temmuz)

Nûbihar Yayınları
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. Yayınıdır.
Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3 Fatih-İstanbul
Tel: (0 212) 533 75 88 • Faks: (0 212) 524 00 38

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Seyid Elî Findikî

DÎWAN

Amadekar
Selman Dilovan

Nûbihar

JIYANA SEYID 'ELIYÊ FINDIKÎ

Seyid 'Eliyê Findikî, di sala 1309ê Hîcrî (1892ê Mîladî) li Findika Botan hatiye dunyayê.

Findik nahiya Dihê ya qeza Sêrtê ye.

Seyid 'Elî kurê Seyid Suleyman, kurê Seyid Îbrahîm, kurê Seyid 'Umer, kurê Mele Hesenê Xetîb e. Ev malbat bi rêya Şêx Evdilqadirê Geylanî digihêje Îmamê Hesen.

Dema ku Tataran bi ser Bexdayê de girt û îşxal kirin, kalikên Seyid 'Elî koç kirin, hatin li Erzenê bi cih bûn. Niha ji Erzenê re dibêjin "Xirabbajar." Ev gund dikeve navbera Misircê (Kurtalan) û Qubînê (Beşiri). Piştî demekê ji Erzenê re "Xerzan" hatiye gotin. Seba vê, dema qanûna paşnavan derket, mezinên me, ji me re paşnavê "Erzen" bijartine, da ku ev nav neyê jibîrkirin.

≈≈≈

Seyid 'Elî, zaroktiya xwe li Findikê derbas kiriye, pêşî li cem bavê xwe xwendiye. Piştre weke adetên zeman ji Findikê derketiye û çûye Harûnan. Harûnan eşîreke cînarê me ye. Seyda li wir qedercki feqîtî kiriye.

Piştre li gundê Bafê, li cem Mela Îsmaîl, li Kercosê li cem Mela Necmeddîn, li Bişêriyê li cem Mele Îbrahîmê Koriki xwendiye. Piştre Seyid 'Elî çûye Farqînê. Li Mizgefta Behlûl Beg li cem Miftî Seyid Evdurrehman û Mela Hesenê Kiçik, û li cem Mela Yaqûb û Mela Hamid heft salan (ji 1333an heta 1340î) xwendiye. Di van salan de dersa feqiyan daye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Dersa Farisî li cem Hecî Fettahê Hezroyî xwendiye, herwisa Seyid 'Elî jî dersa wî ya feraîzê (zanîna werasetê) dayê.

Seyid 'Elî îcaza xwe ji Seyid Evdurrehman sitandiye.

Piştî ku vegeriya Findikê, demekî li cem apê bavê xwe Şêx Hesenê Findikî xwendiye û îcazeyek ilmî ji wî jî standiye. Piştî îcazê, Şêx Hesenê Findikî keça xwe Rehîme daye wî, êdî Seyid 'Elî bûye zavayê Şêx Hesenê Findikî.

Ev îcaza ku sitandiye ji hêla hukûmetê ve tehsîla mezin hatiye qebûlkirin û leşkerî nekiriye.

Seyda muddetekî li Findikê melatiya gund kiriye, dersa feqiyan daye. Fetwayên Findikê û derdora wê, wê demê tev li hêviya wî mane.

Li ser teklîfa Şêx Evdullah kurê Şêx Mihemed Nûrî yê Dêrşewî, muddetekî li gundê Senatiyê ders daye feqiyan.

Sala 1927an de Şêx Seydayê Cizîrê, ji bo dersdayinê, wî dawetî cem xwe kiriye. Li Serdehlê –ku gundê Şêx Seyda bû– demeke dirêj ders daye zarokên mala Şêx Seyda û feqiyên wan.

Li ser xwestina ehlê Cinibrê, Şêx Seyda îzna wî daye, çûye Cinibrê. Cinibrê gundekî Cizîrê ye. Seyda 25 salan li Cinibrê maye; ders daye û bi fetwayan meşxûl bûye.

Şêx Seyda hem îcaza ilmê, hem jî îcaza xelîfetiyê daye Findikî. Findikî xelîfê Şêx Seyda ye. Şêx Îbrahîm Heqiyê Basret jî îcaza xelîfetiyê daye Findikî.

≈≈≈

Seyid 'Eliyê Findikî çawa ku alimekî mezin bû, wisa şair jî bû. Qesîdên wî di nava xelkê de gelekî bi qîmet in, û gelekî jî belav bûne.

Ev dîwana wî zimanê wê gelekî hêsan e; herkes jê fêhm dike. Bi piranî qesîdên wî şîret û we'z in.

Zimanê wî gelekî şîrîn bû. Gelek caran di sohbetên xwe de henek dikirin. Ji deveran xelk dihatin cem, da ku dersekê ji bo teberrukê li bal wî bixwînin.

Seyid 'Elî tu caran dilê kesî nedihişt, hertim beşşaş bû.

Sê kur û du keçên wî hebûn. Kurê wî yê mezin Seyid Evdurrehman bîst û sê salan miftîtiya Cizîrê kir, di sala 1996an de li wir wefat kir. Kurê wî yê piçûk Muhemmed Baba niha jî li Cizîrê melatiyê dike. Van herdu kurên wî îcaze li cem wî sitandine. Kurê wî yê navîn Masûm jî, li Cinibrê çûye rehma Xwedê, li wêderê defin bûye.

Keça xwe ya mezin Fatma daye Şêx Evdullahê Qesrikî. Qesrikê gundekî Şirnex e. Ya piçûk Zeyneb jî, daye kurê wî Şêx Emîn; ango kur û bav hevlingê hev in. Fatma li heyatê ye, niha li Cizîrê dijî, lê Zeynebê rehmet kiriye, li Sêrtê hatiye definkirin.

Seyid 'Elî di sala 1387ê Hîcrî (1967ê Mîladî) de wefat kiriye. Li Cizîrê, li cem tirba Şêx Seyda li Taxa Qelê hatiye definkirin. Li ser tirba wî ev beyta wî ya meşhûr hatiye nivîsîn:

Di dunyaê heçî rabê / Feqîr û şeyx û axa bê

Ji her mirnê xilas nabê / Di şerq û hem di xerbê da

Gelek berhemên Seyda hene. Mixabin bêyî dîwana wî ya ku niha *Nûbihar* çap dike, berhemên wî yên din çap nebûne.

Berhemên Findikî

1. Dîwan
2. Def'uş-Şubuhat fî Nezm et-Terchat (Erebî ye li ser fikr e)
3. Hewaşîn 'Ela Tefsîrî Qadî el-Beydawî (Tefsîr)
4. Rîsalet el-Lem'e fî Îadetî el-Cumu'e (Fiqih)
5. Rîsaletun fî Necatî Ebeweynî en-Nebiyyî (Îtîqad-Siyer)
6. Rîsaletun fî Cewazî Def'î ez-Zekatî Îla Benî Haşîm we Benî el-Muttalib
7. Zulfeqarê 'Elî 'ela Reqebetî Munkîr el-Îstîmdadî Mîn Nebiyyîn ew Welî ('Eqîde)
8. Hewaşîn 'Ela Dîwan el-Cezerî (Hinck îzahat in, li ser dîwana Melayê Cizîrî.)

Biraziyê Seyid 'Eliyê Findikî
MELA SEÎD ERZEN
07. 07.1999

Kurd û Kurdistan

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

AMADEKIRINA VÊ BERHEMÊ

Bi gelemperî, edebiyata kurdî ya klasîk bi tîpên erebî hatiye nivîsandin. Li Tirkiyê kurdên ku di mektebên fermî de xwendine û fêrî tîpên erebî nebûne, nikarin van berhemên xwe yên klasîk bixwînin. Kesên ku di medresan de bi alfaba erebî xwendine, ew jî bi hêsanî nikarin berhemên latînî bixwînin. Yanê, hinek kurd ji berhemên bi tîpên erebî, hinek jî ji berhemên bi tîpên latînî bêagah in. Di encamê de, gelek kes ji beşeke çand û edebiyata xwe mehrûm dimînin.

Bi armanca xwendevanê zimanê kurdî, ji klasîkên xwe bêpar nemîne û di navbera xebatên berê û yên îro de pirek çêbibe, *Nûhihar* tiştekî nû dike.

Di vê berhemê de, li alîkî tîpên erebî, li alîkî jî tîpên latînî li pêşberî hev hatine nivîsandin. Ji vir û pê ve, me niyet e em berhemên xwe yên klasîk bi vî awayî biweşînin. Wê demê, hem orjînaltiya berhemê tête parastin, hem jî berhem bi tîpên latînî digihêje nifşên nû.

Wekî din, kurdên Iraq û Îranê jî dikarin ji van kitêban îstîfade bikin. Xwendevanê zimanê kurdî, dikare du alfabeyan bi hev muqayese bike û bi herdu alfabeyan xwendina xwe pêş de bibe.

Bêguman amadekirina kitêbeke bi vî awayî, li gor derfet û îmkanên me gelekî bi zehmet e. Lê hêja ye ku meriv vê zehmetê bikşîne.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Di amadekirina vê kitêbê de gelek alîkariya birarziyê Seyid Eliyê Findikî, Mela Seîd Erzen gihaştiye me. Me ev berhem li cem wî xwendiye û rast kiriye. Ji bo alîkariya Seyda Mela Seîd Erzen, em jê re spas dikin.

Di tîpderbasiya latînî de me eslê kitêbê bingeh girtiye. Ji bo ku eslê berhemê bête parastin, ji rêzimana îro bêhtir, awayê bikaranîna peyvên wê demê û wê herêmê me esas girtine. Peyv bi çi awayî hatibe gotin me mudaxele nekiriye.

Nivîskar hinek peyv bi du awayan bi kar anîne. Mînak: Cudacida, kur-kir, kuşt-kişt, yekî-yêkî, tazîm-te'zîm, pur-pir, dunyayê-dunyaê û hwd... Me ev peyv tev; hem di tîpên erebî, hem jî di tîpên latînî de, bi eynî awayê ku hatine gotin, nivîsîn.

Di tîpderbasiya latînî de, me herfa ع (eyn)ê jî bi çengala (') nîşan daye.

Ji me hereket, ji Xwedê bereket!

Nûbihar

ديوان

سيد عليي فندكي

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

بسم الله الرحمن الرحيم

(١)

مَفَاعِيلُنْ مَفَاعِيلُنْ مَفَاعِيلُنْ مَفَاعِيلُنْ
هَزَجْ سَالِمْ مُثَمَّنْ بِي چِقَا خُوشْ تِي دِ نَظْمِيدَا

عَلِي رَابَه حَتَا كَنْگِى تُو غَافِلْ بِي بِقِي رَنْگِي
بِشُو قَلْبِي ژِ قِي ژَنْگِي هَرَه رِي رَاسْتْ دِ جَعْدِيدَا

تَه بِي فَايْدَه عُمُرْ بُورَانْدْ دِ قَلْبِي خَوَه لَعِينْ رُونَانْدْ
هَچِي قَنْجِي تَه ژِي فُورَانْدْ رِژَا تَفْ چُو بِمَرْدِيدَا

دِ بِي پُشْمَانْ لِقِى عُمْرِي دَمَا كُو تُو بِچِي بِمْرِي
هَچِي عُمْرِي تَه مَا گُورِي بِبُورِينَه دِ تَوْبِيدَا

بِكَه تَوْبَه بِقَلْبِي صَافْ أَيَا بِى عَقْلُ و بِي اِنْصَافْ
نَكُو دِيسَا بِكِي اِخْلَافْ دِقِي سُوزُو دِعَهْدِيدَا

Kurd û Kurdistan

BI NAVÊ XWEDAYÊ MIHRÎBAN Û DILOVAN

1.

Mefa'îlun mefa'îlun
Mefa'îlun mefa'îlun
Hezec salim musemmen bî
Çiqa xweş tê di nezmê da

'Elî rabe heta kengê
Tu xafil bî bi vê rengê
Bişo qelbê ji vê jengê
Here rêrast di ce'dê da

Te bê fayde 'umur bûrand
Di qelbê xwe Le'în rûnand
Heçî qencî te jê fûrand
Rija tev çû bi erdê da

Dibî poşman li vî 'umrî
Dema ku tu biçî bimrî
Heçî 'umrê te ma gorî
Bibûrîne di tewbê da

Bike tewbe bi qelbê saf
Eya bê'eql û bêînsaf
Ne ku dîsa bikî îxlaf
Di vê soz û di 'ehdê da

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

چكُو تُو پُرْ نَه گُوهْدَارِي دكِي تَوبَه بِصَدْ زَارِي
ژ صُبْهِي نَابِي اِيقَارِي تُو تِي جَارْدِي بِشُونِيدا

حَتَا كَنْگِي تُوِي هَابِي ژقِي رَازَانِي رَانَابِي
لِسَرْ رِيكَا خوَه كَارْ نَابِي هَقَالْ چُونَه تُومَايْ جِيدَا

دَكَا رَابَه ژ قِي حَالِي نَبَه مَغْرُورْ بِقِي مَالِي
قَه نَابِيژِي دَمَكْ خَالِي دِچِي آخِرْ دِقَبْرِيدَا

دِدُنْيَائِي هَچِي رَابِي فَقِيرُو شَيْخُ وَآغَابِي
ژ بَرْ مِرْنِي خَلَاصْ نَابِي د شَرْقُ و هَمْ دِغَرْبِيدَا

اَلاَ اَيْ صَاحِبِي قَصْرِي دَمَا كُو تُو بِچِي قَبْرِي
نِزَامْ چَاوَا بِكِي صَبْرِي دِوِي تُوزُو دِغَبْرِيدَا

دِوِي تُوزِي دِ وِي غَبْرِي دِبِينِي بِي حِسَابْ قَحْرِي
چِرَا هِنْدَه دِكِي غَدْرِي دِبِي رُوزَشْ دِ حَشْرِيدَا

Çi ku tu pur ne guhdar î
Dikî tewbe bi sed zarî
Ji subhê nabî êvarî
Tu tê cardî bi şûnê da

Heta kengî tuwê ha bî
Ji vê razanê ranabî
Li ser rêka xwe kar nabî
Heval çûne tu may cî da

De ka rabe ji vî halî
Nebe mexrûr bi vî malî
Qe nabêjî demek xalî
Diçî axir di qebrê da

Di dunyaê heçî rabê
Feqîr û şeyx û axa bê
Ji ber mirnê xilas nabê
Di şerq û hem di xerbê da

Ela ey sahibê qesrê
Dema ku tu biçî qebrê
Nizam çawa bikî sebrê
Di wê toz û di xebrê da

Di wê tozê di wê xebrê
Dibînî bê hîsab qehrê
Çira hinde dikî xedrê
Dibî rûreş di heşrê da

Kurd û Kurdistan

Mexrûr: Pozbilind.
Xebr: Ax.
Xedr: Neqencî, sitem.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دحشریدا دبی روژش چوا هندە دبی کیف خوش
ددنیائی دبی دل گش دڤی لعب و دلهویدا

ددنیائی تە کیف پر کر تە ظلم وجوروحیف پر کر
بنیر کا تە چە حاصل کر دڤی رسم و دڤی ریدا

گلەك کس تیدا غرانە دماچون مانە پوشمانە
فقط بوری ژ دس وانە کسی چو نای بشونیدا

دنی ملکی کسیی نینە چقا بی بخت و خایینە
کسی گوه بدیی او دینە خوە هندە برندە تیدا

علیی تو بی کس و ژاری ژ دس گنهاکا بریندارێ
حسابا منزلا طاری چرا ناکی ژڤر پیدا

دبس رازە وکیی زاڤا ژ ڤی نومی ڤکە چاڤا
سڤك باڤیژە چند گاڤا دە تو نمنی دحریدا

Di heşrê da dibî rûreş
Çewa hinde dibî keyfxweş
Di dunyaê dibî dilgeş
Di vê le'b û di lehwê da

Di dunyaê te keyf pur kir
Te zulm û cewr û heyf pur kir
Binêr ka te çi hasil kir
Di vê resm û di vê rê da

Gelek kes tê da xirrane
Dema çûn mane poşmane
Feqet borî ji des wane
Kesê çû nay bi şûnê da

Dinê mulkê kesî nîn e
Çiqa bêbext û xayîn e
Kesê goh bidyê ew dîn e
Xwe hinde bernede tê da

'Elî tu bêkus û jar î
Ji dest gunha birîndar î
Hisaba menzila tarî
Çira nakî ji vir pê da

De bes raze wekî zava
Ji vê newmê veke çava
Sivik bavêje çend gava
De tu nemnî di heryê da

Kurd û Kurdistan

Le'b: Leystik.
Cewr: Sitem, neheqî.
Resm: Esl, usûl.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

چرا هندە تو بي فكرى نزانى قي تُوى بمرى
لسر خوە بيهنكى بگرى وكي يخسيرى حبسيداَ

منيرە اهلي وقتي خوە دني باڤيژ ژ قلبي خوە
بكە دوربين د دستي خوە بنيرە آخرتي تيداَ

ژبو دُنيائي تو رحتي د امرى آخرتي شحتي
بقلبي خوە تو وكْ تحتي قە نرمْ نابي د وعظيداَ

چە طامْ ديتْ تە ژدُنيائي كو هندە تە تباتْ نائي
دكمْ ناكمْ تو نايْ رائي ترا كتمە بلايداَ

Çira hinde tu bêfikr î
Nizanî qey tuwê bimrî
Li ser xwe bêhnekî bigrî
Wekî yexsîrê hebsê da

Menêre ehlê weqtê xwe
Dinê bavêj ji qelbê xwe
Bike dûrbên di destê xwe
Binêre axretê tê da

Ji bo dunyaê tu reht î
Di emrê axretê şeht î
Bi qelbê xwe tu wek teht î
Qe nerm nabî di we'zê da

Çi tam dît te ji dunyaê
Ku hinde te tebat naê
Dikim nakim tu nay raê
Te ra ketme belayê da

Kurd û Kurdistan

Reht: Meraqdar, bêsemax.
Şeht: Seqet.
Yexsîr: Êsîr.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

2.

Mefa‘îlun mefa‘îlun
Mefa‘îlun mefa‘îlun
Hezec salim musemmen ke
De ka qelbê me ranakî

‘Elî rabe wiha nabê
Bi hîl û pîle çênabê
‘Umur borî mirin ha bê
Çira tedbîrekê nakî

Eve ‘umrê te çil sal e
Te ne milk e ne pertal e
Xwelî l’ser te qebir mal e
De ka tê kengê peyda kî

Heval çûne tu paş mayî
Dikin gazî çira nayî
Dibêjim tu ne zana yî
Ji lew guhdariyê nakî

(٢)

مَفاعِيلُنْ مَفاعِيلُنْ مَفاعِيلُنْ مَفاعِيلُنْ
هَزَجْ سالِمْ مُثَمَّنْ كَه دكا قَلْبِي مَه رانَاكِي

عَلِي رابَه وهَا نَابِي بِحِيلُ و پِيلَه چِينَابِي
عُمُرْ بُورِي مِرِنْ هَا بِي چِرا تَدْبِيرَكِي نَاكِي

أَڤَه عُمْرِي تَه چِلْ سالَه تَه نَه مُلْكَه نَه پَرْطالَه
خَوَلِي لْسَرْ تَه قَبِرْ مالَه دكا تِي كَنْگِي پَيْدَاكِي

هَڤَالْ چُونَه تُو پاشْ مايِي دكِنْ گازِي چِرا نَايِي
دِيزِمْ تُو نَزانَايِي ژلَوْ گُوهْدارِيِ نَاكِي

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

تُو زانی کو تُو ری دوُری گلو ما قی تُوی کوُری
هچی هاتُ و ژتە بوُری تُو رانابی لزی ناکی

دکا رابە تُو بس رازە خوە پیك بینە گلك تازە
لپیش تە کاشُ و افرازە ژقی رازانی شرمْ ناکی

مُرادا مە ژ خوی ای جانْ چوا گوتی فقهی طیرانْ
أوە هرْ غفلتا قلبانْ نکو ظاهرْ تو مەنا کی

أوە تدبیرْ بکی توبی بنفسیرا بکی حربی
ژ دستی تە حتا هو بی دکا تو خوە خلاصْ ناکی

دعیبی خوە بکە تفتیشْ بقلبی خوە ببە درویشْ
د دُنیای مبە سربیشْ أڤی باری نکا راکی

أگرْ دُنیا تمامیلە بیتْ مُلکی تە بی حیلە
ژ غیری جاوکی شیلە ژقی مُلکی خلاصْ ناکی

Kurd û Kurdistan

Tu zanî ku tu rêdûr î
Gelo ma qey tuwê kor î
Heçî hat û ji te borî
Tu ranabî lezê nakî

De ka rabe tu bes raze
Xwe pêk bîne gelek taze
Li pêş te kaş û efraz e
Ji vê razanê şerm nakî

Murada me j'xewê ey can
Çewa gotî Feqhê Teyran
Ew e her xefleta qelban
Ne ku zahir tu me'na kî

Ew e tedbîr bikî tewbê
Bi nefsê ra bikî herbê
Ji destê te heta hew bê
De ka tu xwe xilas nakî

Di 'eybê xwe bike teftêş
Bi qelbê xwe bibe derwêş
Di dunyayê mebe serbêş
Evî barî nika rakî

Eger dunya temamîle
Bibit mulkê te bê hîle
Ji xeyrî cawekî şîle
Ji vî mulkî xilas nakî

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

بِكَه مِثَالْ دِ عَقْلِيدَا وَكِي خَانَا دِقِي رِيدَا
تُو ايِقَارِي بِچِي تِيدَا صِبِي رَابِي تُوژِي، بَارْكِي

مَكَه خَانِي أَقِي خَانِي بِنِيرَه حَالِي دَوْرَانِي
مُحَمَّدْ مُصْطَفَىٰ كَانِي هَمَا قَطْ أَمْ دِرِيژنَاكِي

صَلَاتِي بِي عَدَدْ هَرْ دَمْ بِكَه هَدْيَه أَيَا أَرْحَمْ
لِوِي كُو مِثْلِي وِي أَكْرَمْ تَه چِينَكْرُو تُو چِينَاكِي

دَخِيلِمْ يَا أَبَاالْقَاسِمْ تُو بِي اِمْدَادُو هَاوَارِمْ
دِمَا جَانِي خُوه بِسپَارِم ژ جِم مِن تُولَعِين رَاكِي

نَهِيلِي مِنْ بِطِرْسِينِي بِحِيلَه مِنْ بِخَاپِينِي
ژ مِنْ ايمَانِي بِسْتِينِي كِي خُوَه لَبَرْ دِگْرِي، يَكْ بَاكِي

دِنِي أَفْ رَنْگُ وَأَفْ طَرْزَه ژِنَكْ بِي سُوزُو بِي عَرْزَه
گِلَكْ بَرْدَانَا وِي فَرْزَه تُو بِي عَقْلِي خُوَه ژِي نَاكِي

Bike mîsal di ‘eqlê da
Wekî xana devê rê da
Tu êvarî biçî tê da
Sibê rabî tu jê bar kî

Meke xanî evê xanê
Binêre halê dewranê
Muhammed Mustefa kanê
Hema qet em dirêj nakî

Salatê bê ‘eded her dem
Bike hedye eya erhem
Li wî ku mislê wî ekrem
Te çênekr û tu çênakî

Dexîlim ya Ebel-Qasim
Tu bê îmdad û hawarim
Dema canê xwe bisparim
Ji cem min tu le‘în rakî

Nehêlî min bitirsînî
Bi hîle min bixapînî
Ji min îmanê bistînî
Kî xwe l'ber digrê yek bakî

Dinê ev reng û ev terz e
Jinek bêsoz û bê‘erz e
Gelek berdana wê ferz e
Tu bê‘eql î xwe jê nakî

Bê‘ded: Bêjimar.
Bê‘erz: Berxweneketî, bêfedî.
Le‘în: Lanetbûyî, Îblîs, Şeytan.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

اگَرْ بـا كَسْـكـيِ اوْ يـارْ بـاَ نَـه حـيـلـه بـازُو غـدَارْ بـاَ
بـويـراَ وي وَفـادَارْبـاَ گـلـوُ ڤـي فـكْـري تـوُ نـاكـي

بـويـراَ كـوُ نـكـرْ يـاَري نَـخـوازه ژي وَفـاَداري
چـكـوُ مـثْـلـي وي سَـرْداري تَه سَحْ تَـكْـرُو تـوُ سَحْ نـاكـي

نَه حَـيْـفـه هـنْـدَه ژي حَزْكـي سَـبَـبْ رزْكـي وَيـاَ پـزْكـي
ژ عُـقْـبـائي خـوَه بـي حَـظْـكـي اگَـرْ اَزْبـم تـوُ ڤـي نـاكـي

مَـگَـرْ صَـرْفْ كـي وَكـي مـيـراَ نَـهـيـلـي تـوُ ژ خَـلْـقـيـراَ
بـكـي پـي قَـنْـجـي وُخـيـراَ دلـي غَـمْـگـيـراَ پـي شـاكـي

تـوُ هـنْـگـي پـاكْ وخـوَشْ مـيـري لـمَـيْـدانـي وَكـي شـيـري
دِ هَـرْدوُ دُنْـيـاَ تُـو تـيـري لـمِـنْ گـوتَـنْ لـتَـه داكـي

دِكـمْ تَـوبَـه ژ اَوْزاراَ بـهـنْـگـه پـلْـچـمـي دارَا
ژ سَـرْ مِـنْ دَيْـنَـه وانْ بـاراَ خُـداَ وَكْ مَـه مَـراَ نـاكـي

Eger ba keskî ew yar ba
Ne hîlebaz û xeddar ba
Bi wî ra wê wefadar ba
Gelo vê fikrê tu nakî

Bi wî ra ku nekir yarî
Nexwaze jê wefadarî
Çiku mislê wî Serdarî
Te seh nekr û tu seh nakî

Ne heyf e hinde jê hez kî
Sebeb rezkî weya pezkî
Ji ‘uqbaê xwe bêhez kî
Eger ez bim tu vê nakî

Meger serf kî wekî mêra
Nehêlî tu ji xelqê ra
Bikî pê qencî û xêra
Dilê xemgîra pê şa kî

Tu hingê pak û xweşmêr î
Li meydanê wekî şêr î
Di herdu dunya tu têr î
Li min gotin li te dakî

Dikim tewbe ji ewzara
Bi hinge pelçimê dara
Ji ser min deyne wan bara
Xuda wek me me ra nakî

Kurd û Kurdistan

Dakî: Hildî, şîretan qebûl bikî.
Ewzar: Gunehên mezin.
‘Uqba: Axîret.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ئَيـــا رَبّـــي رِجـــاكـــارِمْ لـــدَرگـــاهـــي تَـــه زارْزارِمْ
ژ مـيـــلاكـــي بـريـنـــدارِمْ بـريـنـاَ مِـنْ تـــوُ دَرْمـاَنْـكـي

اگَـــرْ چَـنْـداَ گُـنَـهْـكـاَرِمْ نَـزاَنُ و پُـرْ نَـــه گُـوهْـدارِمْ
ژ رَحْـمـــاَ تَـــه خَـبَـــرْدارِمْ بِـرَحْـمـاَ خوَه مِـه دِلْ شاَكـي

تُـــو غَـــفّـــاري ذُنُـــوبـــاَنـــي تُـــو سَـتّـــاري عُـيُـــوبـــاَنـــي
تُـــو كَـــشّـــافـي كُـــرُبـــاَنـــي كِـيَـه بـــي تُـو عَـفْـو نَـــاكـي

عَـلـي سَـحْكَه تُـو وَعْـظي خوَه نَـبَـه مَـغْـرُورْ بِـلَـفْـظـي خـوَه
نَـكَـه تِـشْـتـي نَـه طَـرْزي خـوَه ژْرِهُ و شـاَشـي فِـهـي نَـاكـي

چِـكُـو گُـوتِـنْ تَـنـي نـاَبـي دِڤـي فِـعْـلاَ تَـه خـوُيـاَبـي
دِكِـمْ نـاَكِـمْ تُـو چِـيـنـاَبـي اَزي بَـسْ كِـمْ تُـو بَـسْ نـاَكـي

Eya Rebbî ıicakar im
Li dergahê te zarzar im
Ji mîlakê birîndar im
Birîna mın tu derman kî

Eger çenda gunehkar im
Nezan û pur ne guhdar im
Ji rehma te xeberdar im
Bi rehma xwe mi dilşa kî

Tu xeffarê zunûban î
Tu settarê ‘uyûban î
Tu keşşafê kurûban î
Kî ye bê tu ‘efu nakî

‘Elî seh ke tu we‘zê xwe
Nebe mexrûr bi lefzê xwe
Neke tiştê ne tarzê xwe
J'rih û şaşê fihê nakî

Çiku gotin tenê nabê
Divê fi‘la te xuyabê
Dikım nakim tu çênabê
Ezê bes kim tu bes nakî

Kurd û Kurdistan

Keşşaf: Çareserker.
Kurûb: Xem, piraniya xeman e.
Mîlak: Kezeb, kezeba sor.
Zunûb: Guneh, piraniya gunehan e.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣)

عَـلـيِ روُنَـه ژِقـيِ قَـلْـقـيِ بِـكَـه صَـبْرِي بِـبِـيـنْ ذَوْقـيِ
نَـنـيِـرَه دَوْلَـتـا خَـلْـقـيِ چِـكـوُ پَـاشِي تـوُ پـيِ نـايَـيِ

قَـنـاعَـتْ كَـه رَحَـتْ روُنَـه نَـه هَـرْ پـاَشَـهِـيـيِ چـوُنَـه
چِـرا مَـقْـصَـدْ تَـه پُـرْ بـوُنَـه بَـلاَيَـه مـاَلـيِ دُنْـيـايـيِ

عَـذَابَـه هَـرْ حَـرَامـيِ وِي حِـسَـابَـه هَـرْ حَـلاَلـيِ وِي
نَـبَـه قَـطْ تـوُ هَـڤـاَلـيِ وِي چِـكـوُ دوُسْـتـاَنـيِ ژِي نـاَيـيِ

نَـيـاَرَه اَوْ ژِبـوُ دوُسْـتـاَنْ دَمـاَ كـوُ بِـچِـنَـه قَـبْـرِسْـتـاَنْ
اَوِي لْـخـوَه بْـدِنْ بِـدوُ دَسْـتـاَنْ كـوُ چـوُ ژْدَسْـتِـي مَه هَـيْ وَايـيِ

تُـونـاَنـيـرِي لِـمـاَلْـدَارَا چِـقـاَ كَـتْـنَـه لِـبِـنْ بـاَرَا
ژِ صُـبْـهـاَ حـتَـى ايـڤـاَرَا دِكِـنْ نـاَكِـنْ تَـبـاَتْ نـاَيـيِ

3.

‘Elî rûne ji vê qelqê
Bike sebrê bibîn zewqê
Nenêre dewleta xelqê
Çiku paşî tu pê nayê

Qena‘et ke rehet rûne
Ne her paşehiyê çûn e
Çira meqsed te pur bûne
Bela ye malê dunyayê

‘Ezab e her haramê wî
Hisab e her helalê wî
Nebê qet tu hevalê wî
Çikû dostanî jê nayê

Neyar e ew ji bo dostan
Dema ku biçne qebristan
Ewê l'xwe bdin bi du destan
Ku çû j'destê me heywayê

Tu nanêrî li maldara
Çiqa ketne li bin bara
Ji subha hetta êvara
Dikin nakin tebat nayê

Qelq: Bêaramî, bêsemaxî.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

اَوی بـاَرْكـنْ ژڤـي مـالـي بـچـنْ قَـبْـرَكْ خـرُوخـالـي
دِبـنْ پـوُشْـمـانْ بِـصَـدْ حالـي هَـچی چُـو ژْدَسْ ايـدی نـايـي

خـوَزی مَـه بْـوی كوُ هـشْـيـارْبـي دِ اَمْـری ديـنْ دا گـوُهْـدارْبـي
نَـه وَكْ مِنْ سِـسْتْ و بـي كارْ بـي هَـمـا بِـرْهـي بـدی چـايـی

عَـلـي دُنْـيـا گـلَـكْ پـيـسَـه كَـچـا مَـلْـعـونـي ابْـلـيـسَـه
يَـقـيـنْ آخـرَتْ دچـي ژْكـيـسَـه كَـسـي ژْ دِلْ بـگْـری دُنْـيـايـي

نَـبَـه عـاشـقْ لـوی پـيـری قَـه گُـهْ نَـدْيـي خـوَه نَـسْـپـيـري
تُـوبَـرْدَه وی بـبَـه ژْبـيـری چـوا كـوُ قَـنْـجـا بَـرْدايـي

نَـنـيـرَه اَهـلـي ڤـي وَقْـتـي كـوُ دِسْـطـيـنْ هَـمـي نَـخْـتـي
دِكِنْ لْـهَـفْ حـيـلُ و بـي بَـخْـتـي قَـه آخـرَتْ بـيـرا وَانْ نـايـي

مُـسُـلْـمـانـي بِـدَفْ نـابـي بِـحِـرْتُ و حِـرْتـي چـيـنـابـي
بِـبـيـژْ اَوْ كَـسْ بِـلاَ شـابـي كـوُ صـافـي بـي ژْ ريـايـي

Ewê bar kin ji vî malî
Biçin qebrek xir û xalî
Dibin poşman bi sed halî
Heçî çû j'des êdî nayê

Xwezî me b'wî ku hişyar bî
Di emrê dîn de guhdar bî
Ne wek min sist û bêkar bî
Hema birhê bidê çayê

'Elî dunya gelek pîs e
Keça Mel'ûnê Îblîs e
Yeqîn axret diçî j'kîse
Kesê j'dil bigrê dunyayê

Nebe aşiq li wê pîrê
Qe guh nedyê xwe nespêrê
Tu berde wê bibe j'bîrê
Çewa ku qenca berdayê

Nenêre ehlê vî weqtî
Ku distînin hemî nextî
Dikin l'hev hîl û bêbextî
Qe axret bîra wan nayê

Musulmanî bi dev nabê
Bi hirt û hirtê çênabê
Bibêj ew kes bila şabê
Ku safî bî ji riyayê

Kurd û Kurdistan

Birhê bidê çayê: Pir çayê vexwe.
Next: Qelen.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

‘Elî dunya gelek baş e
Ji wî re ku nebî şaşe
Li pêş rêkî nedê paşe
Kesê ha bê Xudê dayê

Nexwe tu hingî pur pak î
Helal malî tu peyda kî
Heçî barê ketî rakî
Bidî bayê wekî kayê

Heta kengê tuwê bêjî
‘Elî lakin tu napêjî
Heta dunyayê navêjî
Bizan qencî ji te nayê

Heçî dunyayê hez jê kî
Bila sed bar kitêb çêkî
Şev û rojê da we‘zê kî
Diçit we‘za wî ber bayê

Ne ez şeyx im ku we‘zê kim
Ne maldar im ku xêrê kim
Du-sê beyta ezê çêkim
Ji xeyrê vê ji min nayê

‘Elî ya Reb birîndar e
Li dergahê te zarzar e
Li derdê wî bike çare
Hilavêt beyreqa rayê

عَلي دُنْيا گَلَك باشَه ژ ويرا كُو نَسبي شاشَه
لپيش ريكي نَدي پاشَه كَسي هابي خُدي دايي

نَخوَه تُو هنگي پُر پاكي حَلالْ مالي تُو پَيْداكي
هَچي باري كَتي راكي بِدي بايي وكي كايي

حَتا كَنْگي تُووي بيژي عَلي لَكِنْ تُو ناپيژي
حَتا دُنْيايي نافيژي بِزانْ قَنْجي ژ تَه نايي

هَچي دُنْياي حَزْژيكي بِلا صَدْ بارْ كتيبْ چيكي
شَفْ و روژي دا وَعْظيكي دچتْ وَعْظا وي بَرْ بايي

نَه ازْ شَيْخم كُو وَعْظي كِمْ نَه مالْدارم كُو خيري كِمْ
دُو سي بَيْتا ازي چيكِمْ ژ غَيْري قي ژ مِنْ نايي

عَلي يا رَبْ بريندارَه لَدرگاهي تَه زارْزارَه
لَدَرْدي وي بِكَه چارَه هلاڤيتْ بَيْرقا رايي

Beyreqa rayê: Beyreqa qebûlkirinê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤)

عَـلـيِ پَـالْـدَه وَرَه رَايـيِ بِـشُـو خـوَه ژْ اَهْـلـيِ دُنْـيـايـيِ
گَـلـوُ مـا قَـطْ تَـه بـيـرْ نـايـيِ نَـه ديـتْ تَـه ژْوَانْ ژِغَـيْـرْ صـارِي

اَگَـرْ ظـاهِـرْ دَه اَوْ دوُسْـتِـنْ دِبـاطِـنْـدَه تَـنـيِ پـوُسْـتِـنْ
حَـمِي يَكْ كِـيـشُ و يَكْ بـوُسْـتِـنْ ژْوَانْ دوُرْبَـه بِـهِـشْـيـارِي

خُـوداَ بِـگَـرَه تَـمـامْ بَـرْدَه بِـلاَ لْـبَـرْتَـه نَـبِـنْ پَـرْدَه
نَـبِـيـژْ اَفْ قَـنْـجَـه اَفْ مَـرْدَه هَـيَـه طـاقِـيـكْ ژْ دِژْوارِي

بِـوِي طـاقُـيـيِ نَـچَـه رِيـداَ تـوُ هِـشْـيـارَبَـه ژْفِـرْ پـيـداَ
دَه تـوُ نَـمْـنـيِ دِ حَـرِيـيـداَ تَـه هَـوْدِي ژْنِـشْـكـافَـه بـارِي

Kurd û Kurdistan

4.

‘Elî pal de were rayê
Bişo xwe j'ehlê dunyayê
Gelo ma qet te bîr nayê
Nedît te j'wan ji xeyr sarî

Eger zahir de ew dost in
Di batin te tenê post in
Hemî yek kêş û yek bost in
Ji wan dûr be bi hişyarî

Xuda bigre temam berde
Bila l'ber te nebin perde
Nebêj ev qenc e ev merd e
Heye tavîk ji dijwarî

Bi wê tavyê neçe rê da
Tu hişyar be ji vir pê da
De tu nemnî di heryê da
Te hew dî j'nişka ve barî

Tavî: Teyrok an jî barana ku bi şiddet li ciyekî dibare, lê li ciyê din nabare.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

هـزارْ حَيْـفـه كـوُ دوُسْـتـانـيِ نـه صـافـيِ بـيِ ژْدِلُ و جـانـيِ
بـيـه بـحـيـلـه وْدوُعـزْمـانـيِ مـه جـرْبـانْـديـه صـدْجـارَيِ

مـه جـرْبـانْـدنْ گـلـيِ ژْدوُسْـتـانْ نـه شـا گـرْتـيِ بـلـيِ ژْهـوُسْـتـانْ
بـرَنْـگْ بـوُنْ وَكْ گُلـيِ بـوُسْـتـانْ خـزامْ وَشْـهـانْ بـهـاوارَيِ

دڤـيِ دُوسْـتْ لَڤْ بِكـنْ صَبْـرَيِ شـريكْ بْـكـنْ خـوَشـيِ ژْ قَـحْـرَيِ
حـتـا كـوُ اَوْ بـچـنْ قَـبْـرَيِ اَگـرْ نـه هـيـچـه اَوْ يـارَيِ

بـلـيِ خـاصـيِ خـودِيِ مـانَـه وفـادارِنْ نـه وَكْ ڤـانَـه
بـزانْ سَـيْـدا يَـكـيِ ژْوانَـه تـوُ بـاوَرْنـاكـيِ هـرْدارَيِ

Hezar heyf e ku dostanî
Ne safî bê j'dil û canî
Biye b'hîle û du'ezmanî
Me cerbandiye sed carî

Me cerbandin gelek j'dostan
Ne şagirtî belê j'hostan
Bi reng bûn wek gulê bostan
Xezam weşhan bi hawarî

Divê dost lev bikin sebrê
Şerîk bkin xweşî û qehrê
Heta ku ew biçin qebrê
Eger ne hîç e ew yarî

Belê xasê Xudê mane
Wefadar in ne wek ya ne
Bizan Seyda yekî j'wan e
Tu bawer nakî her darî

Xezam: Pelên darê yên zerbûyî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Belê b'şertê tu çeknas bî
Ji borê kînê derbas bî
J'Xudayê xo ra mêrxas bî
Nedî des nefsê hevsarî

Heçî hefsar bidê nefsê
Muheqqeq ew kesê b'tehsê
Ewê paşî biçê hebsê
Belê hebsa reş û tarî

Nebe teslîm ji nefsê ra
Xwe bişdîne wekî mêra
Bike şerr û qirên pê ra
Şev û rojê heta karî

Heçî mehsûbê Seyda bî
Dikim hêvî ku dilşa bî
Qiyamet ku li me rabî
Xilas bit ew bi yek carî

بَلی بْشَرْطی تُو چَكْ نَاسْبی ژ بُوری كِینی دَرْبَاسْبی
ژ خُدَایی خُو رَا میرْخَاسْبی نَدی دَسْ نَفْسی هَفْسَاری

هَچی هَفْسَارْ بِدی نَفْسی مُحَقَّقْ اَوْ كَسی بْتَحْسی
اَوی پَاشی بِچی حَبْسی بَلی حَبْسَا رَشْ و طَاری

نَه بَه تَسْلِیمْ ژ نَفْسِیرَا خوَه بِشْدِینَه وَكی میرَا
بِكَه شَرُّو قِرِینْ پِیرَا شَفْ و روُژی حَتَا كَاری

هَچی مَحْسُوبی سَیْدَابی دِكِمْ هیڤی كُو دِلْ شَابی
قِیَامَتْ كُو لِمَه رَابی خِلَاصْ بِتْ اَوْ بِیَكْ جَاری

Kurd û Kurdistan

Bor: Di çeman de ciyê ne kûr ku meriv tê de derbasî aliyê din dibe.

Mehsûb: Terefdar, alîgir, heval.
Tehisîn: Şemitîn, ji rêketin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٥)

عَـلـــيِ رازَه ژِڤـيِ تَـعْـبـيِ بَـسَـه ژڤـيِ لَـهْـوُو ڤـيِ لَـعْـبـيِ
بِـكَـه صـافـيِ تُـو هَـرْ قَـلْـبـيِ خُـــدادَارِی چِـــه غَـــمْ دارِی

بَـسَـه ژْبـوُتَـه خُـدايـيِ تَـه بِـشُـونْ بـاڤُ و بـرايـيِ تَـه
دريـــژَه مـــاجَـــرايـــيِ تَـــه خُـــدادَارِی چِـــه غَـــمْـــدارِی

ژْ بُـووِی گَـرْ بـبـيِ صـافـيِ ژْبُـــو تَـــه اَوْ دِبـــتْ كَـــافـــيِ
ژْ غَـــيْـــرِ وِی بِـــزانْ مَـــافـــيِ خُـــدادَارِی چِـــه غَـــمْ دارِی

دڤـيِ وَقْـتـيِ خـوَشـيِ نـيـنَـه حَـمـيِ بـی بَـخْـتـيِ ژْ كـيـنَـه
تُـو ژِی وَاڤْ مِـنْ بِـجَـرْبـيـنَـه خُـــدادَارِی چِـــه غَـــمْ دارِی

مَـه جَرْبـانْـدِنْ ژْ خَـلْـقـيِ پُـرْ حَـتـیْ دُوسْـتْ و بـرا ژْ كُـرْ
حَـجـيِ گُـوتـيِ هَـمـيِ بُـونْ ڤـرْ خُـــدادَارِی چِـــه غَـــمْ دارِی

5.

‘Elî raze ji vê te‘bê
Bes e j'vê lehw û vê le‘bê
Bike safî tu her qelbê
Xudadar î çi xemdar î

Bes e j'bo te Xudayê te
Bi şûn bav û birayê te
Dirêj e macerayê te
Xudadar î çi xemdar î

Ji bo wî ger bibî safî
Ji bo te ew dibit kafî
Ji xeyê wî bizan mafî
Xudadar î çi xemdar î

Di vî weqtî xweşî nîn e
Hemî bêbextî û kîn e
Tu jî wek min bicerbîne
Xudadar î çi xemdar î

Me cerbandin ji xelqê pur
Heta dost û bira û kur
Heçî gotî hemî bûn vir
Xudadar î çi xemdar î

Kurd û Kurdistan

Xudadar î çi xemdar î: Ger tu ji ehlê Xwedê yî, çima tu xemgîn î.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Eger ewwel ji te hez kin
Ewê paşehiyê bes kin
B'vir û bêbextî te kes kin
Xudadar î çi xemdar î

'Elî 'umrê te bû pêncî
L'hîsaba te tu hê gênc î
Ji lewra hê tu bêsênc î
Xudadar î çi xemdar î

Bi lez tu qesda Seyda ke
Bi tewbê sêncekî rake
Di wê da qelbê ava ke
Xudadar î çi xemdar î

Xwezî wî qesda Seyda kê
Dilê xwe j'vê dinê rakê
Ji bo rê zadî peydakê
Xudadar î çi xemdar î

Ji bo rê zadî teqwa ye
Ne nan û şekir û ça ye
Li nik ehlullah peyda ye
Xudadar î çi xemdar î

Kurd û Kurdistan

Ehlulla: Ehlê Xweda, Kesê qenc.
Kes kin: Perîşan kin.
Paşehî: Paşî, dawî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

اگَـــرْ اَوَّلْ ژ تَـــه حَـــزْكَـــنْ اَوِى پـــاَشَـــهـــيـــيِ بَـــسْ كَـــنْ
بْفِـرُو بِى بَـخْـتِى تَه كَسْ كِنْ خُـــدَاَدَارِى چـــه غَـــمْ دَارِى

عَـلِـى عُـمْـرِى تَه بُـو پِـيْـنْـجِى لْـحِـسَـابَاتَه تُو هِى گِـيْـنْـجِى
ژَلَـوْرَا هِى تُـو بِى سِـيْـنْـجِى خُـــدَاَدَارِى چـــه غَـــمْ دَارِى

بِـلَـزْ تُـو قَـصْـدَا سَـيْـدَاكَـه بِـتَـوْبِـى سِـيْـنْـجَـكِـى رَاكَـه
دِوِيـدَا قَـلْـبِـى أَ قَـاكَـه خُـــدَاَدَارِى چـــه غَـــمْ دَارِى

خَـوَزِى وِى قَـصْـدَا سَـيْـدَا كِـى دِلِـى خَـوَه ژْ قَـى دِنِـى رَاكِـى
ژِبُـــو رِى زَادِى پِـــيْـــدَاكِـــى خَـــدَاَدَارِى چـــه غَـــمْ دَارِى

ژِبُـــو رِى زَادِ تَـــقْـــوَا يَـــه نَـــه نَـــاَنُ و شَـــكُـــرُو چَـــايَـــه
لِـــنَـــكْ اَهْـــلُ اللّٰهْ پَـــيْـــدَايَـــه خُـــدَاَدَارِى چـــه غَـــمْ دَارِى

بزانْ بی سیْدا قطْ نابی ژبرْخوه کسْکی چینابی
بلا صدْ جاری خوندابی خُدادَاری چه غمْ داری

گلكْ بی سیْدا چونْ ریدا عجاجُ و برفُ و با لیدا
کتنْ ژری مانْ دچولیدا خُدادَاری چه غمْ داری

ددستْ سیْدا ببه تسْلیمْ ژوی تازه بگرْ تعْلیمْ
ژ کسْ ایدی نکه تخْمیمْ خُدادَاری چه غمْ داری

علی ژبوته بیتْ اقْ درسْ نخاپی بْلفْظُ و شکْلی کسْ
خُدا بگْره تنی تو بسْ خُدادَاری چه غمْ داری

قوی به ژکسْ نکه فکْری ژْخُدا رَه هرْ بکه ذکْری
لغابا تقْ اوی بگْری خُدادَاری چه غمْ داری

Bizan bê Seyda qet nabî
Ji ber xwe keskî çênabî
Bila sed carî xwenda bî
Xudadar î çi xemdar î

Gelek bê Seyda çûn rê da
‘Icac û berf û ba lê da
Ketin j'rê man di çolê da
Xudadar î çi xemdar î

Di dest Seyda bibe teslîm
Ji wî taze bigir te‘lîm
Ji kes êdî neke texmîm
Xudadar î çi xemdar î

‘Elî j'bo te bibit ev ders
Nexapî b'lefz û şeklê kes
Xuda bigre tenê tu bes
Xudadar î çi xemdar î

Qewî be j'kes neke fikrê
J'Xuda ra her bike zikrê
Lixaba tev ewê bigrê
Xudadar î çi xemdar î

‘Icac: Ba û bahoz.
Lîxab: Ciyê ku gem lê dikeve.
Texmîm: Tirs.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٦)

وَفـاَ ؤُ دوُسـتـِى چُـونْ بُـونَـه وِنْـداَ
نـزاَنـنْ اَمْ بِـچـِيـنَـه لْـكـيـدَرِى داَ

اگـرْ بـيـهْـنـكْ ژجَـمْ جـاَمـيـركـِى بـِى
هَـزاَرْ مـاَنـعْ بـهـقْـراَ تـيـنَـه رِيـداَ

خـلاَفُ و تـفْ گـراَفَـه دُوسْـتـيـاَ مَـه
ژ لَـوْراَ اَمْ كَـتِـنْ قُـى اَنْـقَـرِيـداَ

تـمـاَمْ عـيـشِى مَـه بُـويَـه قَـحْـرُو رَحْـتـى
دَرِى ذَوْقـِى لـمَـه خـاَلـقْ گـرِيـداَ

چـه يـاَزوُخَـه كـوُ دوُسْـتِى بْـدَفْ تَـنـِى بـِى
بَـرِى دَفْ بـاَسْكـِى خَـيْـرِى دِلْ بْـشَـرِيـداَ

اَنـاَبـيـژمْ اَ صـاَفـيـمَـه ژ دوُسْـتـاَنْ
بَـكِنْ اَمْ تـفْ دِقـِى لَـيْـسْـتـكُ و بـرِيـداَ

6.

Wefa û dositî çûn bûne winda
Nizanin em biçîne l'kê derê da

Eger bêhnek ji cem camêrekî bê
Hezar mani‘ bi hev ra têne rê da

Xilaf û tev gerav e dostiya me
Ji lewra em ketin vê enqerê da

Temam ‘îşê me bûye qehr û rehtî
Derê zewqê li me Xaliq girêda

Çi yazox e ku dostî b'dev tenê bî
Berê dev baskî xeyrê dil b'şerê da

E'nabêjim e'safî me ji dostan
Yek in em tev di vê leystk û birê da

Kurd û Kurdistan

Baskî: Bi alî.
Enqere: Teşqele, bela.
Xilaf: Dijîtî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

سَبَبْ ڤي قَاسي اَمْ مَانَه بِشْوُنْدَا
اَڤَه قَيْدَا وَكُو پِي مَه گَرِيدَا

هَچِي ڤي قَيْدِي نَشْكِينِي د ايرُو
صِبَا رُورَشْ اَوِي بِي مَحْشَرِيدَا

اگَرْ تَهْ دْڤِي تُو بِنْڤِيسِي خَطِي رَاسْتْ
تُو بِنْڤِيسَه خَطِي خوَه دْ مَسْطَرِيدَا

ژ رَاسْتِيِي سَرَاسْتِي تِيتَه شُونِي
اَڤَه عَادَتْ خُدَايِي مَه ژْ بَرِيدَا

عَلِي ژْتَجْرِيبِي گَلْكِي بُوِيَه زَانَه
چِكُو عُمْرِي وِي بُورِي دْڤِي گَرِيدَا

دِكِمْ هِيڤِي لِدَرْگَاهِي تَه يَا رَبْ
تُو بِنْڤِيسِي عَلِي ژْرَاسْتِينْ دِ رِيدَا

≈≈≈

Sebeb vîqasî em mane bi şûn da
Ev e qeyda wekû pê me girêda

Heçî vê qeydê neşkînî di îro
Siba rûreş ewê bê mehşerê da

Eger te d'vê tu binvîsî xetê rast
Tu binvîse xetê xwe d'mesterê da

Ji rastiyê serastî têtе şûnê
Ev e 'adet Xudayê me j'berê da

'Elî j'tecrîbê gelkî bûye zane
Çikû 'umrê wî bûrî d'vê gerê da

Dikim hêvî li dergahê te ya Reb
Tu binvîsî 'Elî j'rastên di rê da

≈≈≈

Mestere: Rastek, cedwel.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

7.

Ela ya eyyuhel-îxwanu ma lî[1]
Feqed male îleł-hîcranî balî

Ji vîqasî gelek ketme ecêbê
Ku hinde dil ji hubbê maye xalî

Ne razî bûm bi hicrê nîvê saet
Niho radî me ez pê sal bi salî

Demek mexrûr dibûn em şubhê dostan
Wekî destûbira me d'kir hevalî

Heqîqet em nebûn dostê heqîqî
Ji lew sarî dixwehê j'herdu alî

Heçî dostê heqîqî ne, j'dil û can
Dikin qurbana dostan can û malî

(٧)

اَلاَ يـــااَيُّـــهـــاالاِخْـــوانُ مـــالـــيِ
فَـقَـدْ مـالَ الـى الْـهِـجْـرانِ بـالـيِ

ژفـيـقـاسـيِ گـلـكْ كـتْـمـه عـجـيـبـيِ
كُـو هِـنْـدَه دِلْ ژحُـبّـى مـايَـه خـالـيِ

نه راضيِ بوم بـهـجـرى نـيـڤى سـاعـت
نـهـو راضـيِ مـه اَز پـيِ صـالْ بـصـالـيِ

دَمَـكْ مَـغْـرُورْ دبـونْ اَمْ شُـبْـهـيِ دُوسْـتـانْ
وَكـيِ دَسْـتُ و بـرا مـه دكـرْ هَـڤـالـيِ

حَـقـيـقَـتْ اَمْ نَـبُـونْ دُوسْـتـيِ حَـقـيـقـيِ
ژ لَـوْ سَـارى دخـوهـيِ ژهَـرْدُو آلـيِ

حَـچـيِ دُوسْـتـيِ حَـقـيـقـيـنـه ژ دلُ و جَانْ
دكـنْ قُـربـانـا دُوسْـتـانْ جَـانُ و مـالـيِ

1. Gelî birayan çi bûye bi min
Bi hicranê ve meyl bûye dilê min
Hicr: Xerîbî.

Hubb: Evîn.
Mexrûr: Pozbilind.
Xalî: Vala.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

اگـر دُوسـتـك بـاسـيـرى بـي فـرُوتـن
بـوى اَمْ نـادنـه قـرشـك كـمـالـي

دكـن حيـلـه لـهـڤ اَمْ تـيـكـده مـيـكـده
طـنـازا بـهـڤ دكـن اَمْ تـڤ ژبـطـالـي

اگـر فـيـدى بـبـيـنـي دُوسـتـه هـركـس
وگـر نـه اَلـقـي آلـي تُـو لـوى آلـي

گـلـك گـريـام ددُونـيـا لـدوسـتـكـي پـاك
لـعـلـي أخُـذ مـنـه جـمـالـي

فـلـم اظـفـر بـمـقـصـودى الـى الآن
اَقـول قـولـي هـذا مـا بـدا لـي

نـه از دُوسـتـم نـه يـك مـن دى ژدوسـتـان
چـوا كـو گـوتـي امـامـي غـزالـي

ژبـي انـصـافـي مـه دڤـي دُوسـتـي صـافـي
بـخـوه ژدُوسـتـي خـوه را اَمْ لا اُبـالـي

هـزار جـار از دكـم ژڤـي اسـتـغـفـرُاللـه
پـشـيـمـانـم گـلـك الـبـي هـڤـالـي

Eger dostek b'esîrî bê firotin
Bi wî em nadine qirşek kemalî

Dikin hîle li hev em têk de mêk de
T'inaza b'hev dikin em tev j'betalî

Eger feydê bibînî dost e herkes
We ger ne e'l'vî alî tu l'wî alî

Gelek geryam di dunya l'dostekî pak
Le'ellî axuzu mînhu cemalî[1]

Felem ezfer bi meqsûdî îlel-an[2]
Eqûlu qewlî haza ma beda lî

Ne ez dost im ne yek min dî ji dostan
Çewa ku gotî Îmamê Xezalî

Ji bêînsafî me d'vê dostê safî
Bi xwe j'dostê xwe ra em la ubalî

Hezar car ez dikim j'vê stexfirullah
Peşîman im gelek e'l'bêhevalî

Kurd û Kurdistan

1. Da ku faydeyeke manewî ji bistînim.

2. Ta niha jî negiham meqseda xwe Dibêjim ya ji min re ew xuyayî

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

گَلُو كَا اَوْ كُو پِشْتْ پِي بِي گِريدَانْ
اَزِي بِمْرِمْ نَدِي يَكْ مِنْ كُو هَالِي

بِخْوَه چَنْدْ جَارَا كَتْمَه حَالِي طَنْگِي
هَڤَالَا خْوَه ژِبَرْ مِنْ دَانَه آلِي

هَرَا وِيرَا نَبُونْ ظَاهِرْ فِدَابُونْ
دَمَا هَاتْ رَاسْتْ بِرَاسْتِي بُونْ خِيَالِي

حَجِي دُوسْتْ بِتْ حَقَه دُوسْتَكْ دُرُسْتْ بِتْ
وَگَرْ نَه قَه شَقَالِي ؤُ بَقَالِي

فَهَلْ اَنْتُمْ عَلَى مَا نَحْنُ فِيه
گَلُويَانْ اَمْ تَنِي كَتْنَه قِي حَالِي

كُو دُوسْتْ اَفْ بِنْ تُو چِه دْبِيژِي ژْمِرِيدَانْ
اَمِي لْوَانْ ژِي بِدِنْ يَكْ اَرْزُوحَالِي

مِرِيدْلَازِمْ ددَسْتْ شَيْخْ دَاوِصَا بِتْ
چِوَا مَيِّتْ لِبَرْ دَسْتِي غَسَالِي

نَه وَكْ قَانْ صُوفِيِ دُنْيَاپَرَسْتْ بِنْ
لِشَيْخِي خْوَه دِكِنْ نَازُو دَلَالِي

Gelo ka ew ku pişt pê bê girêdan
Ezê bimrim nedî yek min ku halî

Bi xwe çend cara ketme halê tengî
Hevala xwe ji ber min dane alî

Hira-wêra nebûn zahir fida bûn
Dema hat rast bi rastî bûn xeyalî

Heçî dost bit heq e dostek durust bit
Weger ne ve şeqalî û beqalî

Fehel entum ela ma nehnu fîhî[1]
Gelo yan em tenê ketne vî halî

Ku dost ev bin tu çi d'bêjî j'mirîdan
Emê l'wan jî bidin yek erzûhalî

Mirîd lazim d'dest şeyx da wisa bit
Çewa meyyit li ber destê xesalî

Ne wek van sofiyê dunyaperest bin
Li şeyxê xwe dikin naz û delalî

Kurd û Kurdistan

Şeqalî û beqalî: Tabîr e, bila dostaniyê nekin; bila şekalî û beqaliyê bikin.

1. Ma hûn jî ketine tişta em tê de.
Xessal: Mirşo

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دە کا تزبی یکی بیژی کم و شاش
سری من مایە طازی ژبی مجالی

یکی بیژی ا مام طازی دخوزم
تبرکی ولو کڤنە قپالی

یکی بیژی قدرکە مامە پیخاس
تبرکاشیخ ولو کڤنە شکالی

یکی بیژی سجادا من تونینە
بڤی رنگی ددن عجزومالی

حتا شهکی رها خوە ژشیخ دخوازن
دریژە ماجرا وا دڤی مالی

بایژماری صدن بلکی هزارن
بتحقیقی ددو نینن کمالی

دنیری صوفیی شیست حفتی صالی
رها وی سپی کمی نقشی عبالی

وکی من وک دهولی ژدورڤا دمدم
تو میزینی لباطن خرو خالی

De ka tizbî yekê bêjî kim û şaş
Serê min maye tazî j'bêmecalî

Yekê bêjî e'mam tazî dixwazim
Teberrikî welew kevneqepalî

Yekê bêjî qederke mame pêxwas
Teberka şeyx welew kevneşekalî

Yekê bêjî sicada min tunîn e
Bi vî rengî didin 'icz û melalî

Heta şehkî riha xwe j'şeyx dixwazin
Dirêj e macera wa d'vî mealî

Bi êjmarê sed in belkî hezar in
Bi tehqîqê dido nîn in kemalî

Dinêrî sofiyê şêst-heftê salî
Riha wî spî kumî neqşê ebalî

Wekî min wek diholê j'dûr va dimdim
Tu meyzênî li batin xirr û xalî

Kurd û Kurdistan

Kevneqepal: Cila gelekî kevn, çiriyayî.

Melalî: Acizî, zeîfî.
Xirr û xalî: Virt û vala.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

چـکـو نـاکـن مـریـدیـی بـرسـمـی
بـارزانـی دڤـن تـشـتـی بـهـالـی

نـه حـدی مـه ژمـلاَ شـیـخـا خـبـردم
خـُدا وانْ زیـدَه کـی ژبـونـا اَهـالـی

بـلـی لازمْ ژدیـنـراَ بـبـنـه ریـزانَ
نـخـونْ مـالـی مـُسـلـمـانـا بـحـیـالـی

وَظـیـفـا خـوه نـکـی بـراسـتْ و دروسـتـی
بـلاَ کـی بـتْ دبـتْ اَوْ کـسْ جـزالـی

لـمـیـدانـاوفـا مـنْ دیـتـه سـیـدا
خـُدا گـلـکـی بـهـیـلـه وی دلاَلـی

فـقـطْ هـرکـسْ نـزانـتْ صـورتـی حـالْ
کـسـی نـه لـمـالْ نـزانـیـتـنْ حـوالـی

اَوی فـضـلُ و کـمـالْ چـو درْ ژ حـدّی
حـتـا یـی وَلاْ مـه ژی بـونـه بـلاَ لـی

لـکـودی بـیـتـه زانـیـنْ حـالـی سـیـداَ
بـتـعـریـفُ و بـیـانـا وَلاْ مـه لاَلـی

Çikû nakin mirîdiyyê bi resmî
Bi erzanî divin tiştê bihalî

Ne heddê mi j'mela şeyxa xeberdim
Xuda wan zêdekî j'bona ehalî

Belê lazim ji dîn ra bibne rêzan
Nexun malê musulmana b'heyalî

Wezîfa xwe nekî rast û durustî
Bila kî bit dibit ew kes cezalî

Li meydana wefa min dîte Seyda
Xuda gelkî bihêlê wî delalî

Feqet herkes nizanit sûretê hal
Kesê ne l'mal nizanîtin hewalî

Ewî fedl û kemal çû der ji heddê
Heta yê wek mi jî bûne belalî

Li kû dê bête zanîn halê Seyda
Bi te'rîf û beyana wek mi lalî

Kurd û Kurdistan

Bihalî: Bi biha, giran.
Heyalî: Hîleyan, piraniya hîleyê ye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

نه سوبامه دخنقم دقامتك آف
من و آف بحر چه سر هقانه خالي

دقي غواص هبن آما چه غواص
كو دربيخن ژقي بحري لآلي

دزانم آز خوه يكم مير وهيژير
من و تشتي ژ خوه زيده هنده عالي

دترسم آز ژ مرني پيش مرادى
مضى عمري ولم آخذ كمالي

لكودى بگهتن فضل و كمالى
كسي وك من كتي قيدا عيالي

علي جانو نه كر كارك ژ بو خوه
نهو چه بكت دچت ريقا بكپالي

فقط (لاتقنطوا) صبرا مه پي تي
چه مزگينه ژ ربي لا يزالي

علىٰ خير الورىٰ والآل طرّاً
صلاة الله ما كرّ الليالي

Ne soba me dixenqim d'qametek av
Min û ev behr çi serhev va ne xalî

Divê xewwas hebin emma çi xewwas
Ku derbêxin ji vê behrê lealî

Dizanim ez xweyî kim mêw û hêjîr
Min û tiştê j'xwe zêde hinde alî

Ditirsim ez ji mirnê pêş muradî
Meda umrî we lem a'xuz kemalî[1]

Li kûdê bighitin fedl û kemalî
Kesê wek min ketî qeyda ‘eyalî

‘Elî can bû nekir karek ji bo xwe
Nihû çi b'kit diçit rê va b'kupalî

Feqet “la teqnetû”[2] sebra me pê tê
Çi mizgîn e ji Rebbê la yezalî

‘Ela xeyri'l-wera we'l-alî turren[3]
Selatullahî ma kerre'l-leyalî

Kurd û Kurdistan

Xewwas: Sobevanê ku xwe berdide binê behrê.
‘Eyal: Zar û zêç.
La yezalî: Yê ku têk naçe, winda nabe.

1. Umrêm borî û ez nebûm temamî
2. Ayeta ku dibêje: “bêhêvî nebin.”
3. Li ser qencê însan û alê wî tev Selatên Xweda lê bin, ta roja dawî
Qamet: Bejn.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٨)

مَـدَدْ سَـيْـدَايـيِ زَنْـگَـانـيِ بـريـزْ فَـيْـضَـا وَكـيِ كَـانـيِ
لِـڤـيِ قَـلْـبـيِ قَـوِيِ جَـانـيِ دَه بَلْكِي بـيتَـه سَرْ جَـادِي

چـه ريـزَانُ و چـه سَـيْـدَايَـه چـه نـعْـمَـتْـكـيِ خُـدِي دَايَـه
جـزيـرَا مَـه بْـوِي آڤـايَـه طَـريـقَـةْ گـرتُ و بـرنَـادِي

جـزيـرْ مـزگـيـنْ لـتَـه شَـابـي ژَاهْـلُ الـلَّـهْ جُـدَانَـابـي
دحـفْـظـا خَـالـقـيِ دَابـي دَرِي طَـنْـگـيِ لْـتَـه رَبْ دَادِي

بَـقُـرْبَـانَـا تَـه سَـرْدَارِي دَامْـرِي دِيـنْ دَا گُـوهْـدَارِي
لـتَـه پـيـرُوزْ بـيِ صَـدْجَـارِي لـبَـاسُ وخَـمْـلاَ ارْشَـادِي

دَارْشَـادِي تُـو جَـامـيـرِي لـمَـيْـدَانـيِ وَكـيِ شـيـرِي
بِكَسْكِي تُو خوَه نَاسْپِيرِي كِي بـيـژِي چه تُو گـوهْ نَادِي

8.

Meded Seydayê Zenganî*
Birêj feyda wekî kanî
Li vî qelbê qewî canî
De belkî bête ser cadê

Çi rêzan û çi seyda ye
Çi nî'metkî Xudê daye
Cizîra me b'wî ava ye
Terîqet girt û bernadê

Cizîr mizgîn li te şa bî
Ji ehlullah cuda nabî
Di hifza Xaliqî da bî
Derê tengî l'te Reb dadê

Bi qurbana te serdarî
Di emrê dîn da guhdar î
Li te pîroz bî sed carî
Libas û xemla irşadê

Di irşadê tu camêr î
Li meydanê wekî şêr î
Bi keskî tu xwe naspêrî
Kî bêje çi tu guh nadê

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Şêx Seyda re hatiye nivîsîn.
Qewî canî: Gelekî asê, gunehkar.
Zengan: Gundekî Torê ye. Girêdayê bi Kerboıana qezaya Mêrdînê ve ye. Ev gund ciyê jidayikbûna Şêx Seyda ye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ژدلـه يـا تـه نـكـو ژقـسـتـي ژ رب دستور ته وا خـوستـي
ژلـو هـنـده تـو سـربـسـتـي ژدرو كـس تـو گـريـنـادي

تـو خـيـرخـوازى ژبـو هـركـس ژلـو هـركـس ته تـيـتـه دس
ژبـو تـه هـر تـنـي اڤ بـس خـدا رى لـبـر تـه دانـادي

ژفـقـيـرارا تـو سـكـانـي ژمـريـدا را تـو لـقـمـانـي
كـيـه بـي جـم تـه درمـانـي كـو درمـانـي وى تـو نـادى

بـلـي بـراسـت و دروسـتـي بـي فـقـيـرو پـرشـكـسـتـي بـي
نـكـو خـوهـرو بـسـتـي بـي كـسـك ژخـوهـرا را تـو نـادى

فـقـط گـل بـي سـتـرى نـابـي خـزيـنـه بـي طـلـسـم نـابـي
خـوشـي بـي غـم تـو جا نـابـي خـدا يـك بـي يـكـي نـادى

J'dil e ya te neku j'qestî
Ji Reb destûr te wa xwestî
Ji lew hinde tu serbest î
J'derew kes tu girênadê

Tu xêrxwaz î ji bo herkes
Ji lew herkes te tête des
Ji bo te her tenê ev bes
Xuda rê l'ber te danadê

J'feqîra ra tu sekkan î
j'mirîda ra tu Luqman î
Kî ye bê cem te dermanî
Ku dermanê wî tu nadê

Belê b'rast û durustî bî
Feqîr û perşikestî bî
Nekû xwehr û bi sistî bî
Kesek j'xwehra ra tu nadê

Feqet gul bê stirî nabî
Xezîne bê tilism nabî
Xweşî bê xem tu ca nabî
Xuda yek bê yekî nadê

Kurd û Kurdistan

Enqere: Teşqele, bela.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

عَلِي ژڤي نِعْمَتِي دُورَه ژاڤْبَالاَ خُوَه اَوْ كُورَه
چِه بِيژمْ مَاجَرَا كُورَه رَبَنْ چِه بْكِي خُدِي نَادِي

اَمَانْ اَيْ شَاهِي بِيشِيرِي تُو دَرْگَاهِي ژبُو خِيرِي
عَلِي كَتْيَه بِنِي گِيرِي دِخوَازِيتِنْ ژْتَه اِمْدَادِي

دِكِمْ هِيڤِي ژُ صَدْ زَارِي لِدَرْگَاهِي تَه يَا بَارِي
تُو خَوِيْ بَخْتْكِي اَڤِي ژَارِي بِجَاهِي غَوْثِي بَفْدَادِي

مَرَا بِيشِيرْ تُو هَرْ شَابِي تُو هَرْ پَايْتَخْتَا سَيْدَابِي
تُو مَيْدَانَا مِرِيدَابِي خُدَا شَرِي ژْتَه بَادِي

≈≈≈

‘Elî j'vê ni‘metê dûr e
Ji îqbala xwe ew kor e
Çi bêjim macera kûr e
Reben çi b'kî Xudê nadê

Eman ey Şahê Bîşêrê
Tu dergah î ji bo xêrê
‘Elî ketye binê gêrê
Dixwazîtin j'te imdadê

Dikim hêvî û sed zarî
Li dergahê te ya Barî
Tu xweybext kî evî jarî
Bi cahê Xewsê Bexdadê

Me ra Bîşêr tu her şa bî
Tu her paytexta Seyda bî
Tu meydana mirîda bî
Xuda şerrî ji te badê

≈≈≈

Badê: Bizzîvirînê, dûr bikê.
Bîşêr: Gundekî Silopî ye. Ev gund zozangeha Şêx Seyda bû.
Îmdad: Hewar.
Îqbal: Bext, suûd.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٩)

تـوبَـه بِـكِـنْ گـلْـكـيِ بِـرَانْ ژِگُـنَـهُ و ذَنْـبِـيـنْ گِـرَانْ
قَـطْ گُـوهْ نَـدِنْ مُـلْـكُ و پَـرَانْ هَـمْ لَـذَّتُ و مَـالـيِ دِنـيِ

لَـذَّتْ اَوَه حُـبّـاَ خُـدى هَـرْ كى كُـو بگُـرى بَرْنَـدى
اَوْدى بِـگُـهِـيـتَـه مَـقْـصَـدى گـافَـا بِـچِـيـتِـنْ وى دِنـيِ

ڤِي شِيرَتِي لْگُوهِي خوَه كِنْ خوَه ژْ آخْـرَتِي مَحْرُومْ نَـكِنْ
زَادِي رِيـا خـوَه پَـيْـدَه كِـنْ دَا هُـونْ نَـبِـيْ وَيْـلاَ لْـمِـنـيِ

تَـقْـوَايَـه زَادِي رِي بِـزَانْ نَـه بَـقْـلَـوَاتُ وَنَـانُ و مَـانْ
پَـيْـدَايَـه اَوْ نَـكْ مُـرْشِـدَانْ بَـاشْ گُـوهْ بِـدِنْ ڤِي گُـوتِـنِـيِ

فَايْـدَا وَه نَـادِتْ مُـلْـكُ و مَـالْ بِـگُـرِنْ طَـرِيقَـا ذِي الْجَـلاَلْ
تِـيـدَا تَـلَـفْ كِـنْ جَانُ و مَـالْ هِـيـچَـه تَـمَامْ كَـيْـفَـا دِنـيِ

9.

Tewbe bikin gelkî biran
Ji guneh û zenbên giran
Qet guh nedin mulk û peran
Hem lezzet û malê dinê

Lezzet ew e hubba Xudê
Her kî ku bigrê bernedê
Ew dê bighête meqsedê
Gava biçîtin wê dinê

Vê şîretê l'guhê xwe kin
Xwe j'axretê mehrûm nekin
Zadê rêya xwe peyde kin
Da hûn nebên weyla l'minê

Teqwa ye zadê rê bizan
Ne beqlewat û nan û man
Peyda ye ew nik murşidan
Baş guh bidin vê gotinê

Fayda we nadit mulk û mal
Bigrin terîqa Zîlcelal
Tê da telef kin can û mal
Hîç e temam keyfa dinê

Terîq: Rê.
Zenb: Guneh.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

كَيْفَا دنِي بِي فَيْدَه يَه وَكْ خَونَكِي بَيْهوُدَيَه
قَبْرا رَشَه مَالاَمَه يَه چَاوَا دنِي هُونْ گُوهْ دنِي

وِي قَبْرِي رُوهْنِيكِنْ نِهَا غَافِلْ نَبِنْ بْبَرْخُ و مِهَا
رِيكِنْ لِوِي تِشْتَا بِهَا بَرْيَا وِي قَاسِي هُونْ چِنِي

حَيْفَه اَفِي عُمْرِي دلاَلْ هُونْ صَرْفْ دكِنْ لْدُنْيَا بَطَالْ
هَاخْتَا بِچِنْ قَبْرِي هِقَالْ وِي هَيْبَتُ و بِزْدَانْدِنِي

هَرْچَنْدْ بِدِنْ مَالُ و مَعَاشْ عُمرِي كُو چُو نَايِيتَه پَاشْ
دَا هُونْ نَدِنْ ايِدِي بَلاَشْ خَوَه كَارْبِكِنْ ژْ بُو مِرِنِي

بِي شَكْ بِزَانِنْ پَي مَه تِي نَادِتْ ژْبُو مَه مُهْلَتِي
چَنْدَا بِقَاسِي سَاعَتِي بِگْرِنْ خُدَايِي خَوَه بْتَنِي

Keyfa dinê bêfeyde ye
Wek xewnekî beyhûde ye
Qebra reş e mala me ye
Çawa dinê hûn guh dinê

Wê qebrê rohnî kin niha
Xafil nebin b'berx û miha
Rêkin li wê tişta biha
Berya wê qasî hûn çinê

Heyf e evî ‘umrê delal
Hûn serf dikin l'dunya betal
Haxta biçin qebrê heval
Wê heybet û bizdandinê

Herçend bidin mal û me‘aş
‘Umrê ku çû nayête paş
Da hûn nedin êdî belaş
Xwe kar bikin j'bo mirinê

Bêşek bizanin pey me tê
Nadit ji bo me muhletê
Çenda biqasî sa‘etê
Bigrin Xudayê xwe b'tenê

Kurd û Kurdistan

Bizdandin: Tirsa mezin, ziravqetandin.
Haxte: Wext e, hindik maye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Dunyayê bavêjin temam
Zikrê bikin daîm mudam
Da hûn biçin Darus-selam
Ew der ku salih dê çinê

Dunya çiqa l'destê we bê
Qelbê we lê aşiq nebê
Mizgîniya xeyrê l'we bê
Xem nakitin j'vê heyinê

Dunya mudir ew dunye ye
Qelbê bibê baskê xwe ye
Axret bibê j'bîra we ye
j'işqa kur û mal û jinê

Ta kengî tê bêjî 'Elî
Tu d'gotinê wek bilbilî
Fayde çi ye tu ne j'dil î
Te l'gotinê ne l'kirinê

≈≈≈

Darus-Selam: Navekî bihiştê ye; ango ciyê ewlebûnê.
Mudir: Zirardar.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دُنْيَايِي بَاقِيزْنْ تَمَامْ ذِكْرِي بِكُنْ دَائِمْ مُدَامْ
دَا هُونْ بِچِنْ دَارُالسَّلَامْ اَوْ دَرْ كُو صَالِحْ دِي چِنِي

دُنْيَا چِقَا لْدَسْتِي وَه بِي قَلْبِي وَه لِي عَاشِقْ نَبِي
مِزگِينِيَا خَيْرِي لْوَه بِي غَمْ نَاكِتِنْ ژْفِي هَيِنِي

دُنْيَا مُضِرْ اَوْ دُنْيَه يَه قَلْبِي بِبِيِي بَاسْكِي خوَه يَه
آخِرَتْ بِبِي ژْبِيرَا وَه يَه ژْ عِشْقَا كُرُو مَالُ و ژِنِي

تَا كَنْگِي تِي بِيژِي عَلِي تُو دگُوتِنِي وَكْ بِلْبِلِي
فَايْدَه چِه يَه تُو نَه ژْدِلِي تَه لْگُوتِنِي نَه لْكِرِنِي

≈≈≈

10.

Meded Seyda meded Seyda*
Mi etrafê dinê têk da
Yekî wek te nebû peyda
Meded Seyda meded Seyda

Meded Seyda ezê dîn im
Ji hicra te cegerxwîn im
Ji min dûr î te nabînim
Meded Seyda meded Seyda

Ji hicra bejn û balayê
Wekî Mecnûnê Leylayê
Dikim nakim tu nay rayê
Meded Seyda meded Seyda

Ez im Mecnûnê bê Leyla
Ketim ber pêl û ber seyla
Dikim hawar û waweyla
Meded Seyda meded Seyda

Fîraqa te ezê kiştim
We bêruh ez li cih hiştim
Ji zewq û lezzetê şiştim
Meded Seyda meded Seyda

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Şêx Seyda re hatiye nivîsîn.

Seyl: Lehî.
Hicr: Xerîbî, dûrbûna ji yarê.

(١٠)

مَـدَدْ سَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا مِـه اَطْـرافِـي دِنـي تـيـكْـدا
يَـكـي وَكْ تَـه نَـبُـو پَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا

مَـدَدْ سَـيْـدا اَزى دِيـنـم ژهـجْـرا تَـه جَـگـرخـويـنـم
ژ مِـن دورى تَـه نـابـيـنـم مَـدَدْ سَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا

ژ هـجْـرا بَـژْنْ و بَـالايـي وكـي مَـجْـنُـونـي لَـيْـلايـي
دِكِـمْ نَـاكِـمْ تُـو نَـايْ رَايـي مَـدَدْ سَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا

اَزِمْ مَـجْـنُـونـي بـي لَـيْـلىٰ كَـتِـمْ بَـرْ پـيـلْ و بَـرْ سَـيْـلا
دِكِـمْ هَـاوارْو واوَيْـلا مَـدَدْ سَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا

فـرَاقَـا تَـه اَزى كِـشْـتِـم وَه بـي رُوحْ اَزْ لِـجـهْ هِـشْـتِـم
ژ ذَوْقْ و لَـذَّتـي شِـشْـتِـم مَـدَدْ سَـيْـدا مَـدَدْ سَـيْـدا

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

عَذَابِي نَارِي هِجْرَانِي اگَرْ بِيتَه وَصِفْ دَانِي
كَسِي دِيتِي تَنِي زَانِي مَدَدْ سَيْدَا مَدَدْ سَيْدَا

حَتَا كَنْگِي اَزِي هَابِمْ ژِفِي پَرْدِي جِدَا نَابِمْ
بِدِيدَارَا تَه شَانَابِمْ مَدَدْ سَيْدَا مَدَدْ سَيْدَا

بِقُرْبَانْ پَرْدَئِي رَاكَه ژِ هِجْرَانِي مَه آزَا كَه
بِدِيدَارِي مَه دِلْشَاكَه مَدَدْ سَيْدَا مَدَدْ سَيْدَا

تُو لُقْمَانِي اَقْلِي وَقْتِي تُوسُلْطَانِي لِسَرْ تَخْتِي
بِدوستانرا تو خوي بختي مَدَدْ سَيْدَا مَدَدْ سَيْدَا

خوزِي مَه بْوِي تُو دُوسْتِي وِي بِكِي دَسْتِي خوَه دَسْتِي وِي
بِهِيژْمِيرِي دُرُسْتِي وِي مَدَدْ سَيْدَا مَدَدْ سَيْدَا

تُوِي فِنْدَا شَقَا طَارِي جِزِيرِيدَا قُمَانْدَارِي
خَلِيفِي شَاهِي زِيبَارِي مَدَدْ سَيْدَا مَدَدْ سَيْدَا

Ezabê narê hicranê
Eger bête wesifdanê
Kesê dîtî tenê zanê
Meded Seyda meded Seyda

Heta kengî ezê ha bim
Ji vê perdê cida nabim
Bi dîdara te şanabim
Meded Seyda meded Seyda

Bi qurban perdeê rake
Ji hicranê me aza ke
Bi dîdarê me dilşa ke
Meded Seyda meded Seyda

Tu Luqmanê evî weqtî
Tu sultanê li ser text î
Bi dostan re tu xweybext î
Meded Seyda meded Seyda

Xwezî me b'wî tu dostê wî
Bikî destê xwe destê wî
Bihêjmêrî durustê wî
Meded Seyda meded Seyda

Tu wî finda şeva tarî
Cizîrê da qumandar î
Xelîfê Şahê Zîbarî
Meded Seyda meded Seyda

Kurd û Kurdistan

Find: Mûm, çira.
Şahê Zîbarî: Leqeba Mewlana Xalid e.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

جزیر هر تو بشاهي بي لدرحفظا الهي بي
ژهر نوعي فراهي بي مدد سيدا مدد سيدا

يكي پايتختي ارشادي كو ايرو مايي سر جادي
وكي ته كس نيشان نادي مدد سيدا مدد سيدا

چه شيرين و شكرخوندي وكي شاهي سمرقندي
وكي عهدي نقشبندي مدد سيدا مدد سيدا

دبابي فيض و احساني علمداري لميداني
كسي زاني تني زاني مدد سيدا مدد سيدا

گلك تيهنم دڤي ريدا تني مامه دچولي دا
مه بير بينه ژڤر پيدا مدد سيدا مدد سيدا

بريژ فيضي بشهكاسي لڤي قلبي قوى آسي
ده بلكي بيته دربّاسي مدد سيدا مدد سيدا

Cizîr her tu bi şahî bî
Li der hifza îlahî bî
Ji her new'î firahî bî
Meded Seyda meded Seyda

Yekî paytextê îrşadê
Ku îro mayî ser cadê
Wekî te kes nîşan nadê
Meded Seyda meded Seyda

Çi şîrîn û şekerxwend î
Wekî Şahê Semerqend î
Wekî 'ehdê Neqişbendî
Meded Seyda meded Seyda

Di babê feyd û îhsanê
'Elemdar î li meydanê
Kesê zanê tenê zanê
Meded Seyda meded Seyda

Gelek têhn im di vê rê da
Tenê mame di çolê da
Me bîr bîne ji vir pê da
Meded Seyda meded Seyda

Birêj feydê bi şehkasê
Li vî qelbê qewî asê
De belkî bête derbasê
Meded Seyda meded Seyda

Kurd û Kurdistan

Şekerxwend: Devbiken.
Şehkas: Tasa şahan, tasa bi qîmet.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

هَچی سَیْدا نَظَرْ لیکی دکِمْ هیڤی خُداچیکی
دگَلْ ایمانی وی، ریکی مَدَدْ سَیْدا مَدَدْ سَیْدا

کَسی بْخوزی نَه وِنْدابی دلی وی، هَرْ دَمی شَابی
بلاتَسْلیمی سَیْدابی مَدَدْ سَیْدا مَدَدْ سَیْدا

بهیلَه ناچِتْن سیری کَسی تازَه خوَه نَسْپیری
یَقینْ ناچیتَه بَرْدیری مَدَدْ سَیْدا مَدَدْ سَیْدا

عَلی بَسْکَه ژ ڤی شینی وَکی فَرْهادی شیرینی
صَبرْکَه وَكْ مَمی زینی مَدَدْ سَیْدا مَدَدْ سَیْدا

بَلی لازِمْ تُو هَرْ هَابی چِقا رُونی چِقا رابی
بِبیژی هَرْ تُو سَیْدابی مَدَدْ سَیْدا مَدَدْ سَیْدا

Heçî Seyda nezer lê kî
Dikim hêvî Xuda çêkî
Digel îmanê wî rê kî
Meded Seyda meded Seyda

Kesê bxwazê ne winda bî
Dilê wî her demê şabî
Bila teslîmê Seyda bî
Meded Seyda meded Seyda

Bi hîle naçitin sêrî
Kesê taze xwe nespêrî
Yeqîn naçîte ber dêrî
Meded Seyda meded Seyda

'Elî bes ke ji vê şînê
Wekî Ferhadê Şîrînê
Sebir ke wek Memê Zînê
Meded Seyda meded Seyda

Belê lazim tu her ha bê
Çiqa rûnê çiqa rabê
Bibêjî her tu seyda bê
Meded Seyda meded Seyda

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١١)

اَلاَمَانْ صَدْ اَلاَمَانْ اَيْ مُرْشِدى صَاحِبْ كَمَالْ
هِيڤِيدارِمْ تُو بِكِى جَارَكْ لِمِنْ پُرْسْ و سُؤَالْ

نَفْسُ و شَيْطَانْ وِى لِمِنْ زِيدَه دِكِنْ جَوْرُ و جَفَا
هَاتِمَه دَرْگَاهِى تَه سَرْوَانْ دِدِمْ اَزْ اَرْزُوحَالْ

اَرْزُوحَالاَ مِنْ قَبُولْكِى تُو اَگَرْ اَيْ دَسْتَگِيرْ
اَزْ نَمَا پَاكِى دِكِمْ اِيدِى ژْ صَدَع جَمْشِيدُو زَالْ

وَرْ تُو نَگْرِى دَستِى مِنْ دِى اَزْ لِبَرْ پِيلاَ كَڤْمْ
نَاگِرِمْ قَفْ و قِرَارِى تَا بِچِمْ گِيرَاَ ضَلاَلْ

اَزْرِجَاكَارِمْ بِكِى هَاڤَالِى مِنْ يَكْ هِمَّتِى
لِى نَه نَاسُ و پُرْ غَرِيبِمْ كَتْمَه ڤِى رِى بِى هَڤَالْ

هَرْكَسِى هَاڤَالِى وِى بِتْ هِمَّتَا وَه مُرْشِدَانْ
دِى بِچِتْ اَوْ كَسْ بِقُوناغَا خُوه زُو پَاكْ وَدَلاَلْ

11.

El-eman sed el-eman ey murşidê sahibkemal
Hêvîdar im tu bikî carek li min purs û sual

Nefs û şeytan wê li min zêde dikin cewr û cefa
Hatime dergahê te ser wan didim ez erzûhal

Erzuhala min qebûl kî tu eger ey destegîr
Ez nema pakî bikim êdî ji sed Cemşîd û Zal

Wer tu negrî destê min dê ez li ber pêla kevim
Nagirim qeff û qirarê ta biçim gêra dalal

Ez ricakar im bikî havalê min yek himmetê
Lê nenas û purxerîb im ketme vê rê bêheval

Herkesê havalê wî bit himmeta we murşidan
Dê biçit ew kes bi qonaxa xwe zû pak û delal

Kurd û Kurdistan

Dalal: Jirêketî, rêwindabûyî.
Destegîr: Alîkar, yê ku bi destan digire.
Sahibkemal: Bêkêmasî, bêqusûr.
Qef: Derketina ji avê bi keviyan ve, gihaştina qeraxê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Ew kesê negrit hevalê j'himmeta xweyhimmetan
Nagihêtin meqsedê ger çi biçit ew çendî sal

Herkesê hûn lê ‘înayet kin bila mizgîn li wî
Pur xenî û malîdar e ger nebit tu mulk û mal

Mulketa dunya denî hemmî temamî serteser
Nahêjê zerrek înayet lê li nik ehlê kemal

Seyd ‘Elî nebje dizanim çendî lefzê xwendinê
Şubhê emsalan ku meşxûl in bi ilmê qîl û qal

Faîda ‘ilmê ‘emel kirne eger ne çend pere
Dara bêfêkî û sih fayda wê hîç e ey delal

Ger tu vê faydê dixwazî lêbelê safî zelal
Nakevit destê te da ew qet ji xeyrî ehlê hal

اَوْ كَسي نگْرتْ هڤالي ژْهمَّتا خوَيْ همَّتانْ
نَاگهيتن مقْصدي گرْ چه بچتْ اَوْ چندي سالْ

هرْ كَسي هُونْ لي عنايتْ كنْ بلامزگينْ لوى
پُرْ غني وُ مالدارَه گرْ نبتْ تُو مُلْكُ و مالْ

مُلْكتا دُنْيا دني حمي تمامي سرْتسرْ
ناهيژي ذرَكْ عنايتْ لي لنكْ اَهْلي كَمالْ

سيْدْ علي نبژه دزانم چندي لَفْظي خونْدني
شُبْهي اَمْثالاَنْ كُومشْغُولنْ بعلْمي قيلُ وقَالْ

فَائدَا علْمي عَملْ كرْنه اگرْنه چندْ پره
دارَا بي فيكي ژُ سهْ فَايْدا وي هيچه اَيْ دلالْ

گرْ تُو ڤي فَايْدي دخوازي لي بلي صَافي زلالْ
ناكفتْ دستي ته دا اَوْقطْ ژ غَيرِ اَهْلي حالْ

Denî: Pîs, beradayî.
Xenî: Maldar, dewlemend.
Qîl û qal: Gotgotin, tiştên beradayî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

شيرتا من هر أڤه گر تو بمن شيورى دكى
شيرتك ديوبافيه گوهكه نبه تو كرو لال

دستى خوه بافژه داوا مرشدك كامل بلز
تو بزانه حق أڤه هر چه ديه پوچ و بطال

اى كو بيژى از بخوه بگهم خدى بي مرشدى
أف خيالا وى محاله پر محاله پرمحال

تجربه بويه ژميژڤه ثابته چاوامه گوت
تو بكه باور ببه تسليم نبه ژ أهلي جدال

اي علي تو خوش ديژى لي بلي ناپيژى تو
گوتنا خالي ژكرني هيچه وك خون وخيال

Şîreta min her ev e ger tu bi min şêwrê dikî
Şîretek dêwbavî ye guh ke, nebe tu kerr û lal

Destê xwe bavêje dawa murşidek kamil bi lez
Tu bizane heq ev e her çi diye pûç û betal

Ê ku bêjî ez bi xwe bighim Xudê bê murşidî
Ev xiyala wî mehal e pur mehal e pur mehal

Tecrube bûye ji mêj ve sabit e çawa me got
Tu bike bawer bibe teslîm nebe j'ehlê cîdal

Ey 'Elî tu xweş dibêjî lêbelê napêjî tu
Gotina xalî ji kirnê hîç e wek xewn û xeyal

Cîdal: Gengeşî, mucadela bêdelîl û pûç
Xalî: Vala.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٢)

گـلـي دُوسْـتُ و هَـڤَـالي مِـنْ بِـكِـنْ پُـرْسُ و سُـؤَالَـي مِـنْ
دَه هُونْ بِـگْـرِينْ لِـحَالـي مِنْ تَـنـي مَـامَـه دِهِـجْـرَانـي

حَـبِـيـبُ و نَـازدَارَا مِـنْ طَـبِـيـبُ و گُـلْـعُـذَارَا مِـنْ
چَـوَابِـيـتِـنْ هَـدَارَامِـنْ نَـبِـي حَـاضِـرْ لِـمَـيْـدَانـي

ژْدُوْرْبُـونَـا تَـه زِيـبَـايـي دِنَـالِـمْ اَزْوَكِـي نَـايـنِـي
وَكِـي مَـجْـنُـونِـي لَـيْـلَـىْ يِـي دِكِـمْ گَـازِنْـدْ ژْدُوْرَانـي

رَقِـيـبْ اَيْـوَاهْ نَـه اَزْ كِـشْـتِـمْ ژْمَـحْـبُـوبِـي تَـه اَزْ هِـشْـتِـمْ
ژْبَـلْـگِـي رُوْنَـقِـي شِـشْـتِـمْ وَكِـي دَارَا زِڤِـسْـتَـانـي

دَكَـا بَـسْـكَـه ژْڤِـي ظُـلْـمِـي بِـكَـه جَـارَكْ لِـمِـنْ حِـلْـمِـي
تَـه اَزْ كُـشْـتِـمْ بِـڤِـي كُـلْـمِـي نَـهِـشْـتِـي بِـيـمَـه اَيْـوَانـي

12.

Gelî dost û hevalê min
Bikin purs û sualê min
De hûn bigrîn li halê min
Tenê mame di hicranê

Hebîb û nazîdara min
Tebîb û gul'uzara min
Çewa bêtin hedara min
Nebê hadir li meydanê

Ji dûrbûna te zîbayê
Dinalim ez wekî nayê
Wekî Mecnûnê Leylayê
Dikim gazind ji dewranê

Reqîb eywah te ez kiştim
Ji mehbûbê te ez hiştim
Ji belgê rewneqî şiştim
Wekî dara zivistanê

De ka bes ke ji vê zulmê
Bike carek li min hilmê
Te ez kuştim bi vê kulmê
Nehiştî bême eywanê

Kurd û Kurdistan

Zîba: Pir xweşik.
Hedar: Sekin, aram, semax.
Rewneq: Ronî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Heta kengî bikî kînê
Ji dil rakî cuwê xwînê
Eger dilber me bîr bînê
Te minnet der beyabanê

‘Eceb derdê mezin firqet
Li dil da agir û hirqet
Eger ku lê bikit diqqet
Kesê dîtî tenê zanê

Nedî kes min di vê dewrê
Wekî xwe qet bi vê tewrê
Reqîb ser wî bikit cewrê
Bibit carek bi talanê

Reqîb guhdarê min her dem
Li min zêde dikit sed xem
Nehişt cerha bikim merhem
Me ev hal e Xudê zanê

Nesîbsiz şubhê min nîn e
Ji hicrê min ceger xwîn e
Bi lutfa xwe tu bîr bîne
Evî ‘ebdê derîzanê

Di vê dewrê çi totak im
Di şêva da xewê nakim
Te nazdarê jibîr nakim
Dixum sûndê bi Qur'anê

حتا كنگي بكي كيني ژدلْ را كي جُوى، خويني
اگر دلبر مه بيربيني ته منّت دربَياباني

عجب دردى مزن فرقت، لدلدا آگرو حرقت
اگر كو لي بكت دقّت، كسي ديتي تني زاني

ندى كس من دڤي دوْرى، وكي خوه قطْ بڤي طوْرى
رقيبْ سروْى بكت جوْرى ببت جارك بتالاني

رقيبْ گوهْدارى من هردم لمن زيده دكت، صدْغم
نهشتْ جرحا بكم مرهم مه اڤ حالَه خُدى زاني

نصيبْ سزْ شُبهي من نينه ژ هجْرى من چگرْ خوينه
بلُطْفا خوه تو بيربينه اڤي عبْدى دريزاني

دڤي دوْرى چه طُوطاكمْ دشيڤاداَ خوى ناكمْ
ته نازدارى ژبيرْ ناكمْ دخُوم صُوندى بقُرْآني

Kurd û Kurdistan

Beyaban: Çol.
Cerh: Birîn.
Derîzan: Şêmik. Li ber derî.
Totak: Navê teyrekî ye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Heçî hubba te dil mête
Li dil hicra te bû pête
Kî ye ew kes bila bête
Nekit feryad û fîxanê

Nizanim dê çi bêjim ez
Li vî halî ji mêj im ez
Ji dil hêstir dirêjim ez
Wekî tavê di baranê

Xema işqê gelek zûr e
Dibêjim behrekî kûr e
Fîraq û wesletê dûr e
Me ev reng dî ji dewranê

'Elî bes ke ji nalînê
Tu nawestî ji kalînê
Sebir ke wek Memê Zînê
Ew e derman ji tibxanê

~~~

هچي حُبّاته دلْ ميته لدلْ هجْراته بُو پيته
كيه اوْ كس بلا بينه نكتْ فريادُو فيغاني

نزانم دي چه بيژمْ ازْ لقي حالي ژميژمْ ازْ
ژ دلْ هيستر دريژمْ ازْ وكي طاڤي دباراني

غماَ عشقي گلكْ زُوره دبيژمْ بحْركي كُوره
فراقُ و وصْلتي دُوره مه اڤْ رنْگْ دي ژ دوْراني

عَلي بسْكه ژناليني تُو نا وسْطي ژكاليني
صبرْ كه وكْ مَمي زيني اوه درْمانْ ژطبْخانى

~~~

Hubb: Eşq, evîn.
Tibxane: Dermanxane, eczane.
Zûr: Zor.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٣)

هِـيَ الـدُّنْـيَـا تَـقُـولُ لِـطَـالِـبِـيهَـا
اِلَـى اَيْـنَ تَـنَـحُّـوا عَـنْ شِـرَارِي

فَـلَـيْـسَ لِـي وَفَـاءٌ لِـصَـدِيـقٍ
أُنَـادِيـكُـمْ بِـهـذَا فِـي الْـجِـهَـارِ

اَمَـاشُـفْـتُـمْ مُـعَـادَاتِـي لِـاَهْـلِـي
فَـلاَ تُـلْـقُـوا الـنُّـفُـوسَ فِـي الـدِّمَـارِ

فَـمَـنْ يَـغْـتَـمَّ لِـي اَوْ يَـغْـتَـرِرْ بِـي
فَـعَـبْـدٌ اَحْـمَـقُ شِـبْـهُ الْـحِـمَـارِ

خُـذُوا الْـحِـذْرَ اَيَـا قَـوْمُ خُـذُوهُ
عَـسَـى اَنْ تَـنْـجُـوا مِـنْ ذِلِّ الْـعِـثَـارِ

فَـيَـا رَبُّ بِـجَـاهِ مُـصْـطَـفَـاكَـا
قِـنَـا عَـنْـهَـا هِـيَ ذَاتُ الـضَّـرَارِ

13.

Ew e dunya dibêje talibên xwe*
Reva we ji şerê min bi kûder e

Tu wefa min tunîn e j'dostekî re
Ez bi vê gazî we dikim eşkere

Ma nabînin dijmintiyam bi ehlêm
Hûn canê xwe neavêjin dîmare

Kî xemgîn be, yan pozbilind be bi min
Ew evdekî ehmeq e mîna ker e

Xwe biparêz ey gelo xwe biparêz
De ku azad bibin j'şemta qilêr e

Bi cahê Mustefayê xwe Rebê min
Biparêze tu me j'ya xweyzirar e

*Eslê vê helbestê erebî ye, me wergerande kurdî.
Dîmar: Wêranbûyî, helak.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٤)

دَرِينْ دُنْيَا كَسِي بِي غَمْ نَبَاشَدْ
اَگَرْ بَاشَدْ بَنِي آدَمْ نَبَاشَدْ

غَمَم اَنِيسْتْ كِه اَزْ يَارَانْ شُدَمْ دُورْ
غَمِي زِينْ دَرْ جِهَانْ مَهْتَرْ نَبَاشَدْ

خُدَا دَانَدْ كِه مَنْ دَرْ دِلْ چِه دَارَمْ
وَلِي چِيزِي بِدَسْتِ مَنْ نَبَاشَدْ

اَزِينْ دُنْيَا چُنَانْ دِلْتَنْگِيمْ هَسْتْ
كِه جَايِ مَنْ دَرِينْ وِيرَانْ نَبَاشَدْ

مَرَا زِينْ وَرْطَه يَا رَبْ زُودْ خَلَاصْ كُنْ
بِجُزْ تُو دَسْتَگِيرْ دَانَمْ نَبَاشَدْ

اَگَرْ دَسْتَمْ نَگِيرِي اَيْ خُدَاوَنْدْ
نَجَاةِ مَنْ بِدِيگَرْ رَاهْ نَبَاشَدْ

14.

Di vê dunyaya han kes bêxem nîn e*
Eger bêxem be Benî Adem nîn e

Xema min ew e ku ji yaran dûr bim
Di cîhan de xemek j'vê mestir nîn e

Xuda zane ku derdê dilêm çi ye
Belê tiştek di destê min de nîn e

Di vê dunya han de wisa dilteng im
Ku ciyê min di vê wêranê nîn e

Xudayo tu ji vê girdavê min zû
Xelas ke ji bil te destegîr nîn e

Eger tu destê min negrî Xudayo
Rizgariya min bi rêyek din nîn e

Kurd û Kurdistan

*Eslê vê helbestê farisî ye, me wergerande kurdî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

مـــرا دەْ اَرْمَـغـــانْ نَـقـــشِ نِـــگـــاری
کـه جُـزْ عـشْـقَـشْ مَـرا کـاری نَـبـاشَـدْ

حَـــقـــیـــقَـــتْ داَرُوی دَرْد دل ریـــشْ
بِـــجُـزْ عِـشْـقِ پَـری رُویَـانْ نَـبـاشَـدْ

هَـرْ آنْ کـه جُـرْعَـه زِیـنْ داَرُوچَـشـیـدَسْتْ
اَگَـرْ مُـنْـصِـفْ بُـوَدْ مُـنْـکِـرْ نَـبـاشَـدْ

کَـسِـی رَا جُـرْعَـه زِیـنْ تُـرِیَاق بَـخْـشَـنَـدْ
کـه خُـودْبِـیـنْ و بَـدَنْ پَـرْوَرْ نَـبـاشَـدْ

عَـلـی تَـا کَـیْ کُـنـی اَز هَـجْـرِ شَـکْـوَی
عِـلاَجِ هَـجْـرِ جُـزْ صَـبْـرِ نَـبـاشَـدْ

اَگَـرْ صَـبْـرِ کُـنـی یَـابِی خَـلاَصِـی
وَگَـرْ نَـه بِـجُـزْ پَـشِـیـمَـانِی نَـبـاشَـدْ

≈≈≈

Tu bi min b'bexşîne neqşenîgarî
Ku j'bil ‘işqa te j'me ra kar nîn e

Rastî dermanê derdê dilê nexweş
Ev ji bil işqa perîrûyan nîn e

Her yê ku qurtek ji ev derman tam ke
Eger ehlê însaf be munkir nîn e

Kesê qurtek ji ev tiryak dibexşin
Ku ew xwedperest û tenperwer nîn e

‘Elî ta kengî tê j'hicran gilî kî
Dermanê hîcran ji bil sebrê nîn e

Eger tu sebir bikî rizgar dibî
Û ger nekî, ji bil poşmanî nîn e

≈≈≈

Kurd û Kurdistan

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٥)

سَلاَمْ سَرْ تَه جَمِيلْ تُو هَرْجَمِيلْ بِي
گَلُو ڤِي وَقْتِي حَالِي تَه چَوَانَه

نَبِيژْ اَزْحَافِظْمْ بِي دَسْتْ، و پِيمَه
جَمَالاَ هَرْكَسِي بْقَلْبُ و لِسَانَه

تَه هَرْدُو تَازَه نَه رَبْ تَازَه تَرْكَتْ
هَچِي دِيتَرْ اَوَانْ قِيمَتْ بِقَانَه

اَزِي، چِيرُوكِي بِيژْمْ گُوهْ بِدِيرَه
ژ سَرْهَاتِيِ مَنَه اَوْ بِي گُمَانَه

اَمِي لْمَالِنْ تَه دِي يَكْ هَاتْ ژْدَرْدَا
نَه وَقْتِي هَاتِنِي چَه بْكِمْ نَزَانَه

اَوِي، بِيژِي تُوزَانِي بُو چَه هَاتَمْ
ژْدُوهْ ڤَا چِيلَكَا مِنْ زَا نَبَانَه

15.

Selam ser te Cemîl tu her cemîl bî*
Gelo vî weqtî halê te çewa ne

Nebêj ez hafiz im bêdest û pê me
Cemala herkesî b'qelb û lîsan e

Te herdu taze ne Reb tazetir kit
Heçî dîtir ewan qîmet bi va ne

Ezê çîrokî bêjim guh bidêre
Ji serhatyê min e ew bêguman e

Emê l'mal in te dî yek hat ji der da
Ne weqtê hatinê çi bkim nezan e

Ewê bêjî tu zanî bo çi hatim
Ji doh va çêleka min za neban e

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Cemîl re hatiye nivîsîn. Cemîl, muezzin û qesîdebêjê Şêx Seyda ye.

Cemîl: Xweşik.
Neban: Ya ku nahêle têjika wê şîrê wê bimije.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

تُـو مَـيْـزِيـنَـه لْـكـتـيـبـي چـيـكَـه ژيـرا
نـقـشْـتْـكـي اَمْ دبـيـژنْ اَوْژْچـقـانَـه

دنـاڤـا ريـخ و پـيـخـيـداَ شـقُ وروژْ
نـقـشْـتُ وچـيـلَـكـي چـه بْـسَـرْ هـڤـانَـه

دُعَـا اَمْ دي بـكـنْ تُـو ژي دُعَـا كَـه
دُعَـا بـاشـنْ ژ درْمَـانـي خُـدَا نَـه

نـقـشْـتْ بـاشـنْ نَـه رَمْلُ و فَـالُ و تَـازيـمْ
دكـنْ بـاوَرْ نَـكُـو اَمْ ژْمُـنْـكـرانَـه

فَـقَـطْ چـيـبـنْ بـتَـعْـظـيـمُ وبـشَـرْعـي
نَـه زَنْـگـلْ بـنْ ژبُـو هَـرْ گـا وْ كـرانَـه

يَـكـي ديـتـرْ تَـه دي هَـاتْ گُـو نـقـشْـتْـكـي
چـكُـو اَفْ هَـيْـڤـا هَـه زَانَـا مـهـانَـه

تَـدي يَـكْ هَـاتْ دُوسـي هـيـكـي ددَسْـدَا
گَـلَـكْ پـي بْـطـرْ چـكُـو لْـجَـمْ وي بـهـانَـه

نـقـشْـتـيـكـي دخـوازمْ اَزْ ژْسَـويـلْـرَا
هـنَـكْ پـزْ هـنْـكـي چـيـلَـكْ هـنْـكـي گـانَـه

Tu meyzêne l'kitêbê çêke jê ra
Niviştkî em dibêjin ew j'çeva ne

Di nava rîx û pîxê da şev û roj
Nivişt û çêlekê çi b'ser heva ne

Du'a em dê bikin tu jî dua' ke
Du'a baş in ji dermanê Xuda ne

Nivişt baş in ne reml û fal û tazîm
Dikin bawer neku em j'munkira ne

Feqet çê bin bi te'zîm û bi şer'ê
Ne zengil bin ji bo her ga û kera ne

Yekî dîtir te dî hat go niviştkî
Çiku ev heyva ha zana mihan e

Te dî yek hat du-sê hêkê di dest da
Gelek pê ptir çikû l'cem wî biha ne

Niviştêkî dixwazim ez j'sewêl ra
Hinek pez hinkî çêlek hinkî ga ne

Kurd û Kurdistan

Btir: Bi tir, gelekî pozbilind.
Reml: Cureyekî falan e.
Sewal: Heywan, heywanên malê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ژ مهینیرا دخوازم یەکی باشقه
دلی من گلکی پیقایه جوانه

مشارك دو خیاری من حلینه
نقشتکی چیکه ژیرا برزیانه

یکا بیت و ببی لبختی ڤی خانی
دکینم ماستی خوه رون نه خیانه

هنك دی بیژن ام هاتنه شریعت
تمام دوقك كوپال وی لدستی وانه

ته نیری عیشی وان عیشك كمالسز
نه هیژایه كو هنده لی جڤانه

حتا جارك یكی هات و لمه پرسی
ژگندی ژ جیران و اقربانه

دما هات و مه ژی پرسی اوی گوت
هیه من كافرك وك بی هشانه

بهڤالا را دچت خوش ناڤا چیری
فقط ناچیرتن وك گیژبیانه

J'mehînê ra dixwazim yêkî başqe
Dilê min gelkî pêva ye cuwan e

Mişarek-du xiyarê min helî ne
Niviştkî çêke jê ra berziyan e

Yeka bêt û bibê l'bextê vî xanî
Dikeynim mastê xwe rûn nexuya ne

Hinek dê bêjin em hatne şerîet
Temam doqik kopal wî l'destê wan e

Te nêrî îşê wan îşek kemalsiz
Nehêja ye ku hinde lê civane

Heta carek yekê hat û l'mi pirsî
Ji gundî û cîran û eqrîban e

Dema hat û mi jê pirsî ewê got
Heye min kavirek wek bêhişan e

B'hevala ra diçit xweş nava çêrê
Feqet naçêritin wek gêjbiyan e

Kurd û Kurdistan

Doqik: Darê lê danê yê kin ku serê wî girover e.

Helî: Ya ku zû çêdibe, berî wexta xwe digihe.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

مَه گُو بَلْکی نِقِشْتکی چیکی ژیرا
چقا نَستیلَه هَه سانکی بَرانَه

تَه دی یَلَهْ هاتْ ژدَرْدا گُو مه قُربانْ
تُو مَیْزینَه لْکتیبی تازه دانَه

ژدُوهْ پیرقَا کُری مِنْ تیشی بی حالْ
تُو دَرْدی وی ژ بُو مَه بْکَه بیانَه

یکی بیژی دزا تُو لْمَه نَهیلاَ
ببیژْ کیَه نهُواوَلْکُو مَکانَه

کتابا مَه دبینْ لَوحی مَحْفوظْ
هَچی تِشْتا کُو قَومی تی عَیانَه

چکُو وانْ دیتنَه اَفْ رَنْگ ژ گَلْکانْ
بْرِهُو شاشکْ وکی شَیْخ و مَلانَه

بْبِنْ قُربانْ ژبُو شَیْخ و مَلا اَوْ
درا شَیْخ و مَلا تی اَوْ گَدانَه

دبیژْ وانْ فلانْ شَفْ نیفی شَقْداَ
کُو جنَا ضَربکی لْکُرکی تَه دانَه

Me go belkî niviştkî çêkî jê ra
Çiqa nestêleh e sankî beran e

Te dî yek hat ji der da go mi qurban
Tu meyzêne l'kitêbê taze dane

Ji doh-pêr va kurê min têşê bêhal
Tu derdê wî ji bo me bke beyane

Yekê bêjî diza tu l'me nehêla
Bibêj kî ye niho ew l' kû mekan e

Kitaba me dibînin Lewhê Mehfûz
Heçî tişta ku qewmî tê ‘eyan e

Çiku wan dîtine ev reng ji gelkan
B'rih û şaşik wekî şeyx û mela ne

Bibin qurban ji bo şeyx û mela ew
Dera şeyx û mela tê ew geda ne

Dibêjin wan filan şev nîvê şev da
Ku cinna derbekî l'kurkê te dane

Kurd û Kurdistan

Geda: Xulam.
Nestêleh: Heyf, hêja.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ئازى بـگـرم ئاوى جـنـى بـتـازيـم
بـخـنـقـيـنـم فـقـط عـيـش سـر پـرانـه

ژوان بـاور دكـن جـاهـل ژ دل وحـل
هـچـي وك وان نـكـي دبـژن نـزانـه

هچـي بـنـدكـي بـكـي هن دى هقـال بـن
بـنـيـر شـيـطـيـن بـنـيـر ايـزيـديـانـه

بـقـربـانـا مـلا وشـيـخـا مـه صـد جـار
ئاوى شـرعـا شـريـف ژوا را نـشـانـه

نـه ئاو شـيـخ و مـلا كـو حـيـلـه بـازن
هـنـك ظرشـيـخ و هـنـكـي ظر مـلانـه

كـو گـافـا خـوه ژخـوه ئاوزيـده تـافـيـن
ددن نـيـشـان كـو وان جـه آسـمـانـه

چـكـو هـر تـشـتـكـي ظـركـي ددى
حـتـا دارو گـيـا ئاو ژى وصـانـه

ظـرى گـوزى هـيـه ئاف ظـر هـنـاره
ئاف ظـرپـونـگ عـلـي ژ ظـرشـاعـرانـه

Ezê bigrim ewî cinnî bi tazîm
Bixenqînim feqet îş ser peran e

Ji wan bawer dikin cahil j'dil û hil
Heçî wek wan nekî dibjin nezan e

Heçî bendkî bikî hin dê heval bin
Binêr şeytên binêr êzîdiyane

Bi qurbana mela w şeyxa me sed car
Ewê şer'a şerîf j'wa ra nîşan e

Ne ew şeyx û mela ku hîlebaz in
Hinek zirşeyx û hinkî zirmela ne

Ku gava xwe ji xwe ew zêde tavên
Didin nîşan ku wan cih asîman e

Çikû her tiştekî zirkî didêrî
Heta dar û giya ew jî wisa ne

Zirê gozê heye ev zir hinar e
Ev e zirpûng 'Elî j'zirşa'iran e

Zir: Sexte, nîv, ne timam.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

نـكـارم از بـيـان كـم يـا مـه ديـتـي
هـچـي مـايـي بـزان اوژي وهـانـه

هـنـك دي بـلـكـي مـسـتـر مـان لـهـبـاني
بـلا بـمـنـن حـقـي وان تـقـنـدانـه

امـي چـاوا بـكـن ژدسـتـي افـانـان
شـف و روژي بـوافـا مـبـتـلانـه

هـبـوم ازچـاپـلـيـك ژدسـتـي كـمـالـي
كـرم وك چـيـتـكـا لـدس زاروا نـه

ژدنـيـا را گـلـك گـوهـدارو ژيـرن
دامـري آخـرتـي تـف خـودا مـانـه

خوزي ژدينـي خوه را ژي بـونـا گـوهـدار
چـوا ژدنـيـارا بـون گـوهـدارو زانـه

نـدي يك مـن كـو هات پـرسـا ديـانـت
چـوا مـيـژكـم گـلـو روژي چـوانـه

دكـا فـاتـح و تـحـيـاتـي مـه راسـتـكـه
افـه عـمـري مـه بـوري ژپـيـنـجـيـانـه

Nikarim ez beyan kim ya mi dîtî
Heçî mayî bizan ew jî wiha ne

Hinek dî belkî mestir man l'hebanê
Bila bimnin heqê wan tevnedan e

Emê çawa bikin j'destê evanan
Şev û rojê bi wa va mubtela ne

Hebûm ez çapliyek j'destê kemalî
Kirim wek çîêtika l'des zaruwane

Ji dunya ra gelek guhdar û jîr in
Di emrê axretê tev xew da mane

Xwezî j'dînê xwe ra jî bûna guhdar
Çewa j'dunya ra bûn guhdar û zane

Nedî yek min ku hat pirsa diyanet
Çewa mêj kim gelo rojî çewa ne

De ka "Fath" û "Tehiyyatê" mi rast ke
Eve 'umrê mi bûrî j'pênciyane

Kurd û Kurdistan

Çaplî: Cureyekî tivingan e.
Heban: Eyarê û postê ku tê bikaranîn.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Eger pezkî zekat yêkî hebîtin
Feqîr l'kû ne çikû ew ya şivan e

Eger ‘elbek zekat yêkî hebîtin
Feqîr heydê çikû ya gêrevan e

Didin pale w melûkêşan b'dilê xweş
Didin behra mela emma b'mehane

Wiha ne exlebê ehlê zemanî
E'nabêjim ku yekcar qenc nemane

Dibê peyda bibin emma ku kêm in
Tu nabînî yekî taze j'sedane

‘Elî tu l'kû eva tu l'pey ketî l'kû
Çiku ev qernê he yê çardehan e

Me çîro l'deştê dêwbav çûn bihiştê
Hezar rehmet li dêwbav hazirane

~~~

اَگـر پـزكـى زَكـاتْ يـيـكـى هَـبـيـتـنْ
فُـقـيـرْ لْـكُـو نـه چـكُـو اَوْيـا شـقـانـه

اَگـرْ عَـلْـبَـكْ زَكـاةْ يـيـكـى هـبـيـتـنْ
فَـقـيـرْ هَـيْـدى چـكُـو يـا گـيـرفَـانـه

ددنْ پـالَ وْ مـلُـوكـيـشـانْ بْـدلـى خـوشْ
ددنْ بـهْـرا مـلاَ اَمّـا بْـمـهـانـه

وهـانـه اَغْـلَـبـى اَهْـلـى زَمـانـى
اَ نـابـيـژمْ كُـو يَـكْـبَـارْ قَـنْـجْ نَـمـانـه

دبـى پـيـدا بـبـنْ اَمّـا كُـو كـيـمـنْ
تُـو نـابـيـنـى يَـكـى تـازَه ژْصَـدانـه

عَـلـى تُـو لْكُـو اَفـا تُولْـپـيْ كَـتـى لْكُـو
چـكُـو اَفْ قَـرْنـى هَـه يـى چـارْدَهـانـه

مَه چيرُو لْدَشْتى ديوْ بَافْ چُونْ بهِشْتى
هَـزارْ رَحْـمَـتْ لْـديـوْبَـافْ حـازِرانـه

~~~

Kurd û Kurdistan

Melû: Komikên paleyan ku ji çend qeftan çêdibin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٦)

اَيْ غُـرْبَـتـيِ اَيْ غُـرْبَـتـيِ اَيْ غُـرْبَـتـيِ اَيْ غُـرْبَـتـيِ
اَيْ غُـرْبَـتـيِ اَيْ غُـرْبَـتـيِ اَيْـوَاهْ ژِ دَرْدِى غُـرْبَـتـيِ

ڤـيِ غُـرْبَـتـيِ اَمْ دَاغْ كِـرِنْ ژْ قَـلْبُ وجَـگَـرْ نَـسَاغْ كِـرِنْ
بـيِ پَـرْدَه وُ بـيِ جَـاغْ كِـرِنْ اَيْـوَاهْ ژِ دَرْدِى غُـرْبَـتـيِ

اَمْ دَاغْ كِـرِنْ بُـدَاغَـا پَـرَا اَمْ كَـزِخَـانْـدِنْ وَكْ رَزَا
قِـبْـحَـتْ چِه بُـو اَفْ بُـو جَـزَا اَيْـوَاهْ ژِ دَرْدِى غُـرْبَـتـيِ

ڤـيِ غُـرْبَـتـيِ اَمْ پِـيـرْ كِـرِنْ بـيِ رَأْيُ و بـيِ تَـدْبِـيـرْ كِـرِنْ
بَـاڤُ و بِـرَا اَمْ ژْبِـيـرْ كِـرِنْ اَيْـوَاهْ ژِ دَرْدِى غُـرْبَـتـيِ

ڤـيِ غُـرْبَـتـيِ اَمْ ژَارْ كِـرِنْ بـيِ اِعْـتِـبَـارُو صَـارْ كِـرِنْ
ژْهَـرْ كَـسْ رَا اَمْ بِـنْ بَـارْكِـرِنْ اَيْـوَاهْ ژِ دَرْدِى غُـرْبَـتـيِ

16.

Ey xurbetê ey xurbetê
Ey xurbetê ey xurbetê
Ey xurbetê ey xurbetê
Eywah ji derdê xurbetê

Vê xurbetê em dax kirin
J'qelb û ceger nesax kirin
Bêperde û bêcax kirin
Eywah ji derdê xurbetê

Em dax kirin b'daxa peza
Em kezixandin wek reza
Qibhet çi bû ev bû ceza
Eywah ji derdê xurbetê

Vê xurbetê em pîr kirin
Bêre'y û bêtedbîr kirin
Bav û bira em j'bîr kirin
Eywah ji derdê xurbetê

Vê xurbetê em jar kirin
Bêî'tîbar û sar kirin
J'herkes ra em binbar kirin
Eywah ji derdê xurbetê

Kurd û Kurdistan

Cax: Dirabe. Hesinê ku ji bo parastinê li ber derî û penceran didin.
Kezixandin: Kesixandin. Birîn, qutkirin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

انـــصـــافْ ســـزا اَمْ راكـــرِنْ لْـبـيـلانُ و دشْـتـا كـارْ كـرِنْ
مَـــه چـنْـــدْ دلالْ وِنْـدا كـرِنْ اَيْـــوَاهْ ژ دَرْدِى غُـــرْبَـــتـــيِ

حَـتَّـىٰ بـبِـــنْ اَمْ كَـالُ و پـيـرْ دَرْدِى اَوَانْ نَـــاكِـــنْ ژ بـــيـــرْ
ژ قَـحْـرِى اَوَانْ بُـونَـه اَسـيـرْ اَيْـــوَاهْ ژ دَرْدِى غُـــرْبَـــتـــيِ

اَمْ بُـونَـه گُـويـنـيِ شَـقـيِ حَـتَّـىٰ صـبـيِ اَوْ نَـانـقـيِ
صَـبْـرُو تَـبَـاتْ مَـه ژَرَبْ دِقِـيِ اَيْـــوَاهْ ژ دَرْدِى غُـــرْبَـــتـــيِ

هَـرْ كَـسْ نـزَانـتْ حَـالْ چـيَـه يِي تـيـرْ چـه هَا ژْ يِي بـرْچـيَـه
پـرْسـيِ بِـكِـنْ ژْ يِي دِيـتِـيَـه اَيْـــوَاهْ ژ دَرْدِى غُـــرْبَـــتـــيِ

گـرِيـيِ اَوِى لْـحَـالـيِ مَـه تـيِ يِي دِيـتِـيِ حَـالـيِ غُـرْبَـتِـيِ
وَكْ مِـنْ كَـتِـيِ قُـيِ اَزِيَـتِـيِ اَيْـــوَاهْ ژ دَرْدِى غُـــرْبَـــتـــيِ

نَـايِـيِ بَـيَـانِـيِ يَـا مَـه دِي اَمْ بُـونَـه تَـسْـلِـيـمُ و گَـدِي
ژ وَانْ رَا كُـو قَـطْ نَـاكِـنْ فَـدِي اَيْـــوَاهْ ژ دَرْدِى غُـــرْبَـــتـــيِ

Însafsiza em rakirin
L'bêlan û deşta kar kirin
Me çend delal winda kirin
Eywah ji derdê xurbetê

Hetta bibin em kal û pîr
Derdê ewan nakin jibîr
J'qehrê ewan bûne esîr
Eywah ji derdê xurbetê

Em bûne goyînê şevê
Hetta sibê ew nanivê
Sebr û tebat me j'Reb divê
Eywah ji derdê xurbetê

Herkes nizanit hal çi ye
Yê têr çi ha j'yê birçî ye
Pirsê bikin j'yê dîtiye
Eywah ji derdê xurbetê

Giryê ewî l'halê me tê
Ê dîtî halê xurbetê
Wek min ketî vê ezyetê
Eywah ji derdê xurbetê

Nayê beyanê ya me dî
Em bûne teslîm û kedî
J'wan ra ku qet nakin fedî
Eywah ji derdê xurbetê

Kurd û Kurdistan

Bêl: Ciyê rast. Deşt.
Kedî: Heywana ku hînî însanan bûye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

اَهْـلـيِ زَمَـانـيِ مَـه بْـطِـرِنْ وَكْ دِرَهَـــا ديـــمْ اَوْ دِرِنْ
قَـدْرِي غَـرِيـبَـا نَـاگِـرِنْ اَيْـوَاهْ ژ دَرْدِي غُـرْبَـتِـي

سَـرْوَرْ تُـونِـيـنْ ڤـيِ دَمِـي لْـدَرْدَا بِـكِـنْ اَوْ مَـرْهَـمِـي
هَـاوَارْ ژ دَسْـتِـي ڤِـي غَـمِـي اَيْـوَاهْ ژ دَرْدِي غُـرْبَـتِـي

سَـيْـدَا مِـه دِي ژ اَهْـلـيِ زَمَـانْ قَـدْرِي غَـرِيـبَـا تَـازَه زَانْ
جِـهْ وِي بِـبِـتْ رَوْضَـا جِـنَـانْ اَيْـوَاهْ ژ دَرْدِي غُـرْبَـتِـي

يَـا رَبْ بِـلِـنْـدْ كَـه قَـدْرِي وِي هَـمْ دُنْـيَـوِي هَـمْ اُخْـرَوِي
مَـحْـرُومْ نَـكَـه مَـه ژ فَـيْـضَـا وِي اَيْـوَاهْ ژ دَرْدِي غُـرْبَـتِـي

كُـرْتَـكَـه عَـلِـي ژڤِـي قِـصَّـتِـي صَـبْـرِي بِـكَـه سَـرْ غُـرْبَـتِـي
حَـيْـفَـا تَـه مَـايَـه لآخْـرَتِـي اَيْـوَاهْ ژ دَرْدِي غُـرْبَـتِـي

Ehlê zemanê me b'tirr in
Wek dirreha dêm ew dir in
Qedrê xerîba nagirin
Eywah ji derdê xurbetê

Serwer tunîn in vê demê
L'derda bikin ew merhemê
Hawar ji destê vê xemê
Eywah ji derdê xurbetê

Seyda mi dî j'ehlê zeman
Qedrê xerîba taze zan
Cih wî bibit rewda cînan
Eywah ji derdê xurbetê

Ya Reb bilind ke qedrê wî
Hem dunyewî hem uxrewî
Mehrûm neke me j'feyda wî
Eywah ji derdê xurbetê

Kurt ke 'Elî j'vê qissetê
Sebrê bike ser xurbetê
Heyfa te maye l'axretê
Eywah ji derdê xurbetê

Kurd û Kurdistan

Rewda cînan: Bexçeyê bihiştê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

17.

Ey ‘Elî rabe j'xewê çava bişo taze fekir
‘Umrê te çû bi nihayet te j'xwe ra karek nekir

Mi çiqa nêrî mi dî hubba dinê bûye bela
Qet kesek negha Xudê hetta ji dil ew ranekir

Tu ji dil bavêje wê tehl e di batin de bizan
Ger çi zahir de şîrîn e ew wekî şîr û şekir

Min çiqa pursî û seh kir min dinêrî û didît
Di dinê da qet‘iyen keyfa zelal keskî nekir

Her çi tişta dergihê keyfê li ber yêkî vekî
‘Eynî wî tiştî te dî paşî derê qehrê vekir

Her kesê bimrê biçê heşr û hîsabê cem Xudê
Ne b'xwezî wî çû ji dunya û ji dil tewbe nekir

(۱۷)

اَیْ عَلی رابه ژْ خوی چاڤا بشُو تازه فکرْ
عُمْری ته چُو بنهایتْ ته ژْ خوه را کارك نکرْ

مه چقا نیری مه دی حُبًّا دنی بُویه بَلاَ
قطْ کسك نگْها خُدی حتیٰ ژدلْ اَوْ رانکرْ

تُو ژدلْ باڤیژه وی تحلْه دباطنده بزانْ
گرْ چه ظاهرْ ده شیرینه اَوْ وکی شیرُو شکرْ

مِنْ چقا پُرسی وُ سحْ کرْ مِنْ دنیری وُ ددیتْ
ددنیدا قطْعیاً کیفا زلالْ کسکی نکرْ

هرْ چه تشْتا درگهی کیفی لبرْ بیکی فکی
عَیْن وی تشْتی ته دی پاشی دری قصْری فکرْ

هرْ کسی بمْری بچی حشْرُو حسابی جمْ خُدی
نبخوزی وی چُو ژ دُنیا وُ ژ دلْ توبه نکرْ

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

قَطْ دمرنيدا تُونينه فرقيا شاهُ و گدا
كُو خلاصْ بن هنْ بمالُ و يانْ بجاهْ كسْ سحْ نكرْ

فوزى پاشا شيخي خزنه مصومي ته اي فقيرْ
رُوحي هرسي حفتيكْ ستاندْ عزرئيلْ فرقي نكرْ

سي صدُو شيستُ ونهي پشتي هزارى بُو خُدا
درگهي باغي بهشتا خوه لبرْ هرسي فكرْ

صبره درمانى مُصيباتا لنكْ اهْلي عقلْ
رَشْ گريدانْ شينْ كرنْ گلْكا ژُ قطْ فايده نكرْ

صدهزارْ حمدْ ژخُدى را از دزانم بيقينْ
كُو حكيمه ذرّيكْ بي سرُّو حكْمتْ وى نكرْ

Qet di mirnê da tunîn e ferqiya şah û geda
Ku xilas bin hin bi mal û yan bi cah kes seh nekir

Fewzî Paşa, Şeyxê Xizne, Me'sûmê* te ey feqîr
Rûhê hersê heftiyek stand Ezreîl ferqê nekir

Sêsed û şêst û nehê piştî hezarî bû Xuda
Dergehê baxê bihişta xwe li ber hersê vekir

Sebr e dermanê musîbata li nik ehlê ‘eqil
Reş girêdan şîn kirin gelka û qet fayde nekir

Sedhezar hemd ji Xudê ra ez dizanim bi yeqîn
Ku hekîm e zerreyek bê sirr û hikmet wî nekir

Kurd û Kurdistan

Cah: Xatir, qîmet,
***Me‘sûm:** Kurê Seyid Elî yê navîn e.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٨)

گـلي دُوسْـتُ و بـرا كـا بـبْـنـه هـشْـيـارْ
چـه قَـوْمِـيـه دڤـي وَقْـتُ و زَمَـانـي

گَـلَـكْ دُنْـيـا بُـويـه مَـعْـشُـوقُ و شـيـريـنْ
دنـيـري هَـرْكـسـي دَسْ لـي وَرانـي

لـبـنْ خَـطّـي تـركْـتُـورُو تـلـيـسْـنْ
لـسَـرْ خَـطّـي مـهْ ژُبَـرخُ و شـڤـانـي

ژبَـرْ حُـكْـمـي تـركْـتُـورا رڤـيـنْ خَـلْـقْ
تُـو نَـابـيـنـي د گُـنْـدا دا دُوخـانـي

لـسَـرْ كُـوزا پـزي شـرُّو قـريـنـه
ژڤـرْ حَـتّـي بـچـي زُوزانـي بـانـي

هـنـي بـيـژنْ لـڤـرْ هـنْ نـا وَاللهْ لـڤـرْ
امـي كـيـلْـكـا دمـابـيـنـا خـوه دانـي

18.

Gelî dost û bira ka bibne hişyar
Çi qewmiye di vî weqt û zemanî

Gelek dunya bûye me'şûq û şîrîn
Dinêrî herkesî des lê weranî

Li Binxettê terektor û telîs in
Li Serxettê mih û berx û şivanî

Ji ber hukmê terektora revîn xelq
Tu nabînî di gunda da duxanî

Li ser koza pezî şerr û qirên e
Ji vir hetta biçî zozanê banî

Hinê bêjin li vir hin na wellah l'vir
Emê kêlka di mabeyna xwe danî

Kurd û Kurdistan

Duxanî: Duxanê
Telîs: Kîs.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دِخُونْ صُونْدِي ژ هَقْرا اَوْ بْطَلاقَا
اَمِي مَالُ و رِحِي خوَه لْسَرْ ڤِي دَانِي

ددنْ بَرْطِيلْ خورَا مَالِي بَزَحْفِي
بِدَسْ هَڤْ ڤا قَه نَاچِنْ نِيڤِي نَانِي

ژ عِشْقَا بَرْخَكَا بَافْ بَلْكِي بَاپِيرْ
دِكِي ژْ بَرْ زَارُوكَا ڤَا بَرْخَڤَانِي

مَلاكِي وَصْفِي جَنَّتْ دَا د وَعْظِي
كُو دَارِنْ چِيمَنْ رُوبَارُو كَانِي

يَكِي كُوچَرْ دگُو ژْخِيرَا خُدِيرَا
بِبَا كُوزَا پَزِي مِنْ اَوْ ڤِي دَانِي

قَه تِيرْ نَابِنْ ژ دُنْيَا اَهْلِي دُنْيَا
اَگَرْ ژْوَانْرَا بِهَرْكِي شُبْهِي كَانِي

Dixun sûndê ji hev ra ew b'telaqa
Emê mal û rihê xwe l'ser vê danî

Didin bertîlxwera malî bi zehfî
Bi des hev va qe naçin nîvê nanî

Ji 'işqa berxika bav belkî bapîr
Dikî j'ber zarûka va berxivanî

Melakî wesfê cennet da di we'zê
Ku dar in çîmen in rûbar û kanî

Yekî koçer digo j'xêra Xudê ra
Biba koza pezê min ew vî danî

Qe têr nabin ji dunya ehlê dunya
Eger j'wan ra biherkî şubhê kanî

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

هَـیـنْ پُـوشـه ظـلـمـاهـیِ شُـبـهـیِ آگـرْ
تُـو عـیـشـیِ پُـوشُ و آگـرْ تـازه زانـیِ

چـقـا پُـوشْ زَحـفْ بِـبـتْ اَوْ رنـگـیِ آگـرْ
دِبـتْ گُـورخـوشْ دنـیـقْـدا دمـدمـانـیِ

دزانـنْ اَمْ کُـو بـیِ دُنْـیـایـیِ نـابـیِ
بَـلـیِ بـرسْـمَـا زْمَـرا کُـو شَـرْعـیِ دانـیِ

نـه اَفْ رنـگـیِ کُـو اَوْ پـیِ مُـبْـتَـلانـه
چـکُـو دُورهَ زْ رسْـمَـا مُـسْـلُـمـانـیِ

نـه خـاطـرْ مـایـه جـمْ وا قـطْ نـه مـهـدَرْ
بِـلا مَـهـدَرْچـیِ بـیِ وَیْـسُ الْـقـرانـیِ

لـنـکْ شَـیْـخـا پـچـیِ صُـلْـحـا دکـنْ اَوْ
فَـقَـطْ خوَیْ سُـوزُو بَـخـتْ نـافْ وَانْدا کـانـیِ

Heyin pûş e temahî şubhê agir
Tu îşê pûş û agir taze zanî

Çiqa pûş zehf bibit ew rengê agir
Dibit gurxweş di nêv da dimdimanî

Dizanin em ku bê dunyayê nabê
Belê b'resma j'me ra ku şer'ê danî

Ne ev rengê ku ew pê mubtela ne
Çikû dûr e ji resma muslumanî

Ne xatir maye cem wa qet ne mehder
Bila mehderçî bî Weysulqeranî

Li nik şeyxa piçê sulha dikin ew
Feqet xweysoz û bext nav wan da kanî

Kurd û Kurdistan

Mehder: Şefa'et.
Piçê: Piçek,

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Ji destê wan me gelkî dîte rehtî
Bila heq bê sebeb Rebbî tu zanî

Ji kes ra dunya nabê mulkê baqî
Hûn nabêjin gelo bavê me kanî

Sed û bîst çar hezar tê da nebî çûn
'Elo bello dixwazin jê emanî

Ne heyf e j'des we çû axret bi carek
Ji ber hubba evê dunya a fanî

'Elî tu b'xwe ji dil j'benda Xuda be
Guhê xwe qet nede ehlê zemanî

ژ دَستي وانْ مه گلکي دیته رَحْتي
بلاَ حَقْ بي سَبَبْ ربَي تُو زاني

ژ کَسْرا دُنْیا نابي مُلْکي باقي
هُونْ نابیژنْ گلُو باقي مه کاني

صَدُو بیستْ چارْ هَزارْ تیدا نَبي چونْ
عَلُو بلُو دخوازنْ ژی اَمانيِ

نه حَیْفه ژدَسْ وه چُو آخرتْ بجارکْ
ژبرْ حُبَّا اَفي دُنْیا أَفانيِ

عَلي تُو بْخوه ژدلْ ژبَنْدا خُدا به
گُوهيِ خوه قَطْ نَدَه اَهْلي زَمانيِ

Kurd û Kurdistan

'Elo Bello: Filankes û bêvankes.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(١٩)

مِنْ چه ديتُ وچه نه ديتُ ودِ في عُمْرِي خوه يي كِنْ
عَسكَرِي قَهْرُو غَمَا هَرْ دَمْ هُجُومَاتَه لِمِنْ

گَرْ بَلاكْ وِنْدَا بِيتْ نِيفْ عَالَمِي لِي بِگَرِنْ
بِلاَ بِينْ جَمْ فِي فَقِيرِي رَاسْتُ وري سَرْفَا دِبِنْ

چِكُو اَزْ كَلْهَا بَلاَمَه صَدْ هَزَارْ حَمْدُو ثَنَا
ژ خُدِي رَا كُو قُوتْ دَايَه لَكْ مِنْ جِهْ دِبِنْ

اَمْ كَتِينَه وَقْتَكِي خِيرُو خوَشِي بُويَه غَلاَ
لَوْ خِلاَصِي بِسَلاَمَتْ تِيدَه زُورَه پُرْ چَتِنْ

دَرْحَقَا اَهْلِي زَمِينْ گُوتِيَه شَيْخِي جَزَرِي
غَالِبِي اَهْلِي زَمَانِي مَا مَلاَ آدَمِينْ

اَمنِيَتْ نِينَه لَسَرْ دُوسْتِيَا اَهْلِي زَمِينْ
پُرْ عَجِيبْ و پُرْ غَرِيبَه رِيزُو رَسْمَا اَوْ دِكِنْ

19.

Min çi dît û çi nedît û di vî ‘umrê xwe yê kin
‘Eskerê qehr û xema herdem hucûmat e li min

Ger belak winda bibit nêv ‘alemê lê bigerin
Bila bên cem vî feqîrî rastûrê ser va dibin

Çikû ez kelha bela me sedhezar hemd û sena
Ji Xudê ra ku quwet daye li nik min cih dibin

Em ketine weqtekî xêr û xweşî bûye xela
Lew xilasî bi selamet tê de zor e pur çetin

Derheqa ehlê zemîn gotiye Şeyxê Cezerî:
“Xalibê ehlê zemanî ma Mela ademî yin”

Emniyet nîn e li ser dositiya ehlê zemîn
Pur ‘ecîb û pur xerîb e rêz û resma ew dikin

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ايرُو دُوستن اَوْ ژهڤرا تُو دبيژى جانْ فدا
رُوژا پاشى تُو دنيرى ارزُوحالا لڤْ ددنْ

تُو دنيرى اَوْ كسى مُعتبرُو ناڤُ و بدنگْ
خاطرى قڤدكْ ژ پُوشى بى كمالْ هڤْ دكُوژنْ

تينه نكْ شيخُ و ملا گُويا كُو اَوْ صُلحى بكنْ
حالْبُوكى كنگى بيا شيخُ و ملايى خوه دكنْ

تجربه گلكى مه كريه هرْ مه ديتيه وها
لى بلى پاشهييرا گلكى اَوْ پُوشمانْ دبنْ

اَمْ مُسلمانْ تڤْ برا نه هرْ وكى گُوتى خُودا
حيفُ و يازُوخه ژمه را كُو اَمْ لهڤْ رحمى نكنْ

اڤْ دُوبندى ژ گرُوتيا كُو اَمْ لى عاشقنْ
حق اَوه ڤى بندُ و كينى اَمْ بشيطينْ رابكنْ

منْ بخوه ژدستى اَوانْ ديتيه پُر جورُو جفا
محكما كُبرى هيه اَمْ دى لوى محكمه بنْ

Îro dost in ew ji hev ra tu dibêjî canfida
Roja paşî tu dinêrî erzûhala lev didin

Tu dinêrî ew kesê mu'teber û nav û bi deng
Xatirê qevdek ji pûşê bêkemal hev dikujin

Têne nik şeyx û mela goya ku ew sulhê bikin
Halbukî kengî bi ya şeyx û melayê xwe dikin?

Tecribe gelkî me kirye her me dîtiye wiha
Lêbelê paşehiyê ra gelkî ew poşman dibin

Em mussulman tev bira ne her wekî gotî Xuda
Heyf û yazox e j'me ra ku em li hev rehmê nekin

Ev du bendî û girotiya ku em lê 'aşiq in
Heq ew e vê bend û kînê em bi şeytên ra bikin

Min bi xwe j'destê ewan dîtiye pur cewr û cefa
Mehkema kubra heye em dê li wê mehkeme bin

Kurd û Kurdistan

Yazûx: Heyf.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

يامه دى نايى بيانْ گرأوْ بصدْ جلْدى كتابْ
هرْ خُدا زانيِ چه قومىِ امْ ژى هردمْ خفْ دكنْ

دستگيرى منْ نه فضلُ و رحمتا خالقْ بوا
بى شكُ و بى شُبهه دى محوُو فنا بُومْ ازْ ژبنْ

اىْ علمى صبرى بكه تذكره نيزيكه مرفْ
صدْ امانتْ منْ لته بهوستايىِ خوه ژخلقى بچنْ

Ya mi dî nayê beyan ger ew bi sed cildê kitab
Her Xuda zanê çi qewmî em jî herdem xef dikin

Destegîrê min ne fedl û rehmeta Xaliq buwa
Bêşek û bêşubhe dê mehw û fena bûm ez ji bin

Ey 'Elî sebrê bike tezkere nêzîk e merev
Sed emanet min li te b'hostayî xwe j'xelqê biçin

Xwe j'xelqê biçin: Xwe ji wan dûr bike.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

20.

Gelek geryam di dunya ez li feydê
Bi herkes ra e'çûm nêçîr û seydê

Mi bazar kir ji her sûk û dikana
Me destûbratî da pîr û ciwana

Ji tecrîbat û pîvan û kişanî
Zelalîk min nedî hate 'eyanî

Mi dih da kes bi kes ra nabê sêrî
Dizî va l'îşê xwe herkes dinêrî

Nema l'hevdû bibûrin dostê weqtî
Çevê l'wa wi yekî ka kî bişemtê

Bipertînin ewî b'sebb û îtabê
Bixun goştê wî wek pişkê kebabê

(٢٠)

گـلـك گـريـام د دُنـيـا ازْ لـفـيـدى
بـهـرْ كـسـرا اچُـومْ نـيـچـيـرُوصـيـدى

مـه بـازارْ كـرْ ژ هـرْ سُـوكُ و دكـانـا
مـه دسـتـوبـراتـى دايـرُو جـرانـا

ژ تـجـريـبـاتُ و پـيـڤـانُ وكـشـانـى
زلالـيـكْ مـن نـدى هـاتـه عـيـانـى

مـه ده داْ كـسْ بـكـسْ رانـابـى سـيـرى
دزى فـا لـعـيـشـى خـوه هـركـسْ دنـيـرى

نـمـا لـهـڤـدُو بـبـورنْ دُوسـتـى وقـتـى
چـڤـى لـوا وى يـكـى كـاكـى بـشـمـتـى

بـپـرسْ طـيـنـنْ اوى بـبْ ژُ عـتـابـى
بـخـونْ گـوشـتـى رى ولْ پـشـكـى كـبـابـى

Kurd û Kurdistan

Mi dih da: Kurtiya "min dihna xwe dayê" ango; min bala xwe dayê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

كُو دُوسْتْ بوُنْ دُوسْت گلَكْ فَرقِي نَمينِي
تُو چه دْبيژِي ژ عَكْسُ و بُغْضُ و كينِي

مَقامَكْ عالَي يَه دَعْوَاى دُوسْتِي
قَبُولْ نَاكِتْ ژ غَيْرْ رَاسْتُ و دُرُسْتِي

بَرِي پَيْدَا دبُونْ بِي تَعْبُ و رَحْتِي
نِهُو تُو لْوَانْ دِپرْسِي بُونَه قَحْتِي

كَسِي بْخوَازِي قِي وَقْتِي دُوسْتِي صَافِي
ژْخُدَا پِيقَا بِلاَ بَاوَرْكِي مَافِي

نَه عَمْرَه اَوْ نَه بَكْرَه اَوْ نَه زَيْدَه
نَه خَالِدْ اَوْ نَه بُشْرَه نَه عُبَيْدَه

تُو نَابِينِي ژ غَيْرِي دُوسْتِي فَيْدِي
اَگَرْ فَيْدِي نَبِينِي وِي بِغَيْدِي

دِقِي بَازَارِيدَا عُمْرِي مَه بُورِي
نَهَاتْ خوَارِنْ ژْكَلِيتِي هِنْ ژ شُورِي

خُدَا حَمْيِي دِزَانِي اَز چه بِيژِمْ
نَه لاَزِمْ هَرْ چه زَانِمْ تَفْ بِرِيژِمْ

Ku dost bûn dost gelek ferqî nemînê
Tu çi dbêjî ji ‘eks û buxd û kînê

Meqamek alî ye de‘wayê dostî
Qebûl nakit ji xeyr rast û durustî

Berê peyda dibûn bête‘b û rehtî
Nihû tu l'wan dipirsî bûne qehtî

Kesê bxwazê vî weqtî dostê safî
J'Xuda pê va bila bawerkê mafî

Ne Emr e ew ne Bekr e ew ne Zeyd e
Ne Xalid ew ne Buşrs e ne ‘Ubeyd e

Tu nabînî ji xeyrî dostê feydê
Eger feydê nebînî wê bixeydê

Di vê bazarê da ‘umrê mi borî
Nehat xwarin j'kelîtî hin ji şorî

Xuda hemyê dizanî ez çi bêjim
Ne lazim her çi zanim tev birêjim

Kurd û Kurdistan

Buxd: Buxz, kîn, qehr.
‘Eks: Dijîtî, înad, hesûdî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ژکسرا ازنبوم دوستي وفادار
نه کس من دي ژ من را بو امکدار

قدا لسر مه بکفي اهلي زماني
مه بر هتك و هلاکا دوستاني

علي وقتا کو دي عيشي هفالان
وکه کيسو سري خوه کشانده کالان

دگل وي تعب و وي ايشان و کربي
دبو راضي همما کو سر بسر بي

نه مالي او دخوازي نه کمالي
دخوازي کو سلامت بيته مالي

همابو پاله او لکسکي نيري
لقنجا خانکي خوه خوه قشيري

Ji kes ra ez nebûm dostê wefadar
Ne kes min dî ji min ra bû emekdar

Qeda l'ser me bkevê ehlê zemanî
Me bir hetk û helaka dositanî

'Elî weqta ku dî îşê hevalan
Weke kîso serê xwe kşande kalan

Digel wê te'b û wê êşan û kerbê
Dibû radî hema ku ser bi ser bê

Ne malî ew dixwazî ne kemalê
Dixwazî ku selamet bête malê

Hema bû pale ew l'keskî nenêrî
Li qunca xanîkê xwe xwe veşêrî

Kurd û Kurdistan

Bû pale: Karê wî bû ew.
Kîso: Kosî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

شَفُ و رُوژی بیهیژمیری ژ عُمْری
حَتا شَفْکی بِبِتْ مِهْفَانیِ قَبْری

سپاری رَحْمَتا ربی رَحیمْ بی
رِجاکاری لِدَرگاهیِ کَریمْ بی

دنیرم اَز سَلامْ بُویه وَحْدَتْ
تَقْلِهَفْ بُونْ چِقاسیِ بُویه زَحْمَتْ

خوزی وی نَه کَسیِ نَاسْکیِ نَه کَسْ وی
لِویدی بِمْری کَسْ نَگْری لِسَرْ وی

اَیا رَبُ تُومَه وْ دُوستا عَفُوکَه
لِبَرْ رَحْمَاتَه عَیْبَامَه بِچُوکَه

Şev û rojê bihêjmêrî ji ‘umrê
Heta şevkî bibit mihvanê qebrê

Siparê rehmeta Rebbê Rehîm bî
Ricakarê li dergahê Kerîm bî

Dinêrim ez selamet bûye wehdet
Tevlihevbûn çiqasî bûye zehmet

Xwezî wî ne kesî nas kî ne kes wî
Li wêdê bimrî kes negrî li ser wî

Eya Rebbî tu me w dosta ‘efû ke
Li ber rehma te eyba me biçûk e

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢١)

حَمْدُو ثَنَا رَبُّ ژْتَرَا عَلِي لْدِنِي گَلْكِي گَرَا
قَطْ وِي نَدِي دُوسْتَكْ ژْخوَه رَا كِيرْ بِي دِرُوژَا طَنْگِيِ

بُويَه غَلاَ دُوسْتِي ژِدِلْ يِيكِي تُو نَابِينِي ژ چِلْ
ژْبُونَا اَفِي بُومْ دِلْ بِكِلْ مَامَه دِ تَقْنُ و حَرِيِ

بَرْيَا نِهُو پَيْدَا دِبِينْ وَقْتَا كُو وَا دِي بُغْضُ و كِينْ
اَمْ هِشْتِنُ و تَقْدَا رَقِينْ بِمْرِنْ اَمِي بْقِي ژَحْرِيِ

قَطْ گُوهْ نَدِنْ دُوسْتِي زَمَانْ ژْمِنْ پُرْسْ بِكِنْ حَالِي اَوَانْ
ژْدَسْتِي اَوَانْ صَدْ اَلاَمَانْ قَطْ ژْوَانْ نَخوَازِنْ قَنْجِيِ

مِنْ دِهْنْ دِدَا اَهْلِي دِنِي هَرْ كَسْ دِفِيتِنْ خوَه تِنِي
اَفْ چِه دَمَه اَمْ كَتِنِي خِيرْ كِتْ خُدَا پَاشَهِيِ

21.

Hemd û sena Rebbî j'te ra
'Elî l'dinê gelkî gera
Qet wî nedî dostek j'xwe ra
Kêr bê di roja tengiyê

Bûye xela dostê jidil
Yêkî tu nabînî ji çil
J'bona evê bûm dilbikil
Mame di teqn û heriyê

Berya nihû peyda dibîn
Weqta ku wa dî buxd û kîn
Em hiştin û tev da revîn
Bimrin emê b'vê jehriyê

Qet guh nedin dostê zeman
J'min purs bikin halê ewan
J'destê ewan sed el-eman
Qet j'wan nexwazin qenciyê

Min dihn dida ehlê dinê
Herkes divêtin xwe tinê
Ev çi dem e em ketinê
Xêr kit Xuda paşehiyê

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دُوستي تَه دي خوش كِر بدَفْ تُو اَوْ ژ دِلْ نَگْهَا يي هَفْ
حَتَّى تُو كَاري ژي بِرَفْ ژَحْر بِگْري ژْوي دُوستَانِيي

تي بِيژي اَفْ دُوستَه زَلَالْ قُربَانْ بِكِمْ اَزْ جَانُ و مَالْ
هي تَه نَه گُوتي (دَالُ و ذَالْ) وي لَتَه بِكي بي بَختِيي

جَمْ كَسْ نَما بَختي تَمَامْ آغَا بِبِيتِنْ يَانْ غُلَامْ
هَا مَأمُومي بي هَا اِمَامْ نِينِنْ ژ غَيْري رَحْتِيي

اَوَّلْ وَكَه دُوستَا دِبِنْ دَا اَوْلِهِشْ حِيلاَ بِكِنْ
زُو نَه دَرَنگْ ژْهِشْدُو دِچِنْ زَانِنْ بِكِنْ نِيَارْتِيي

سُوزي نِهُو هَري هَري سَبْ خَاتِري ڤي خَبَري
دِبْژِنْ سُوزَا مِيري بَري اَفْ دِگْري شُونَا حَمِيي

چَاوَ امِه دِيتي اَز دِبِيمْ زِيدَه تِنِينِنْ بَلَكي كِيمْ
دُوستَانِيي بَاغْ مَايَه دِيمْ آفْ چِكِهَا ژَرْ كَهْنِيي

تِشْتَكْ نَما لَدَستي مَه دَا ژْغَيْري رَفَا بَآلي خُدَا
مَه ژْ خَوَه نَكي رَبْ جِدَا اَمْ ژْتَه دِكِنْ ڤي هِيڤِيي

Dostê te dî xweş kir bi dev
Tu ew ji dil neghayî hev
Hetta tu karî jê birev
Jehr bigrî j'wê dostaniyê

Tê bêjî ev dost e zelal
Qurban bikim ez can û mal
Hê te negotî "dal û zal"
Wê l'te bikî bêbextiyê

Cem kes nema bextê temam
Axa bibêtin yan xulam
Ha me'mûmî bê ha îmam
Nîn in ji xeyrê rehtiyê

Ewwel weke dosta dibin
Da ew li hev hîla bikin
Zû ne dereng j'hevdû diçin
Zanin bikin neyartiyê

Sozê nihû herê herê
Seb xatirê vê xeberê
Dibjin soza mêrê berê
Ev digrê şûna hemiyê

Çawa mi dîtî ez dibêm
Zêde tinîn in belkî kêm
Dostaniyê bax maye dêm
Av çikiha j'ser kehniyê

Tiştek nema l'destê me da
J'xeyrê reva b'alê Xuda
Me j'xwe nekî Rebbî cida
Em j'te dikin vê hêviyê

Kurd û Kurdistan

Dêm: Bêav,
Me'mûm: Yê ku li pey mela nimêj dike.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٢)

غَمْ رَقِينكْ مِنْ هَبُو پُرْ نَازِكُ و زِيَا خصَالْ
اَزْ ژِوِي دُورْ بُومْ بِتَلْبِيسَا رَقِيبِي دِينْ بَطَالْ

اَزْ پِزَانْدِمْ فِرقَتَا وِي نَازِكَا شِيرِينْ كَلَامْ
بِي كَسِمْ نَابِتْ لِمِنْ قَطْ پُرْسِيَارُو هَمْ سُؤَالْ

اَزْ بِرِينْدَارُو غَرِيبِمْ بِي دَوَا ژُ بِي طَبِيبِمْ
كُشْتِيِ جَوْرَا رَقِيبِمْ هِيڤِيَا مِنْ ذُوالْجَلَالْ

هَرْ دَمَا تِيتَه خِيَالِمْ صُحْبَتُ و بَزْمَا وِصَالِمْ
پُرْ دِنَالِمْ پُرْ دِكَالِمْ فِرقَتِي كِرمَه هِلَالْ

وَكْ عَلِي زَانتْ كَسِي جَامَكْ ژِهجْرَانِي قُخوَارْ
سَاعَتَكْ دُورَا فِرَاقِي پُرتِرَه ژْ سَالاَوصَالْ

اَيْ گُلُو دِيسَادِيتِنْ اَزْ بِبِينِمْ دِلْبَرِي
دَا بِدَسْتَا دِمْ لِسَرْ وَقْتِي فِرَاقِي اَرْزُوحَالْ

هَرْ كَسِي مِزگِينِيَا وَصْلِي ژُبُو مِنْ بِينِتِنْ
رُوحِي خوَه اَزْدِي بِدِمْ ژِيرَه دِشُونَا مِلْكُ و مَالْ

22.

Xemrevînek min hebû pur nazik û zîbaxîsal
Ez ji wê dûr bûm bi telbîsa reqîbê dînbetal

Ez pijandim firqeta wê nazika şîrînkelam
Bêkes im nabit li min qet pursiyar û hem sual

Ez birîndar û xerîb im bêdewa û bêtebîb im
Kuştiyê cewra reqîb im hêviya min Zulcelal

Her dema têtе xiyalim suhbet û bezma wîsalim
Pur dinalim pur dikalim firqetê kir me hîlal

Wek ‘Elî zanit kesî camek ji hicranê vexwar
Sa‘etek dûra firaqê purtir e j'sala wîsal

Ey gelo dîsa dibîtin ez bibînim dilberê
Da bi desta dim li ser weqtê firaqê erzûhal

Herkesê mizgîniya weslê ji bo min bînitin
Rûhê xwe ez dê bidim jê re di şûna milk û mal

Cewr: Sîtem, zilm.
Bezm: Sohbet.
Zîbaxîsal: Xuyperî. Ya ku wek bi xuy û tevgerên xwe wek periyan e.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٣)

مَـه هَـاوَارَه لِـدَرگَـاهِـي اِلَـهِـي
كـوُ اَوْ جَـارِكْ خَـلاَصْ كِـي مَـه ژْمَـنَـاهِـي

بِـكِـتْ رِزْقِـي مَـه اَوْ يَـكْ تَـوبَـه صَـافِـي
بِـبِـي ژْبُـومَـه لِـهَـرْدُو دُنْـيَـا كَـافِـي

مَـه نَـسْـپِـيرِي بِـدَسْـتِي نَفْـسُ و اِبْلِـيسْ
مَـه هِـيـڤِـي ژِي ژِ وَارَا مَـه نَـكِـي لِـيـسْ

ژِ غَـفْـلَـتْ مَـه بِـكِـي بْـفَـضْـلاَ خـوَه هِـشْـيَـارْ
بِـقَـانُـونَـا كُـو دَانِـي اَمْ بِـكِـنْ كَـارْ

حَـتَـا مِـرْنِـي لِـسَـرْ تُـو بِـي بِـمِـيـنْ
دِقَـبْـرِي خِـيـرُو هَـرْ خوَشْـيِـي بِـبِـيـنْ

بِـبِـنْ رُوسْـپِـي دِوِي رُوژَا حِـسَـابِـي
خِـلاَصْ بِـنْ اَمْ بِـيـكْ جَـارِي ژْعَـذَابِـي

23.

Me hawar e li dergahê Îlahî
Ku ew carek xelas kî me j'menahî

Bikit rizqê me ew yek tewbe safî
Bibî j'bo me li herdu dunya kafî

Me nespêrî bi destê nefs û Îblîs
Me hêvî jê ji wa ra me nekî lîs

Ji xeflet me bikî b'fedla xwe hişyar
Bi qanûna ku danî em bikin kar

Heta mirnê li ser tobê bimînin
Di qebrê xêr û her xweşyê bibînin

Bibin rûspî di wê roja hisabê
Xilas bin em bi yek carî j'ezabê

Menahî: Tişta ku hatî nehîkirin, qedexekirin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ژویرە قط تونینە کسکی مانع
دمتا کو او بدی عبدکی منافع

ایا ربّ علی عبدك ذلیلە
گنهکارو فقیرو بی دلیلە

تو آزاکە اوی روژا قیامت
ببە جنّت برحما خوە بسلامت

دگل آبا ژهم احباب و دوستان
بجاهی مصطفیٰ سردار دوستان

Ji wî re qet tunîn e keskî mani‘
Dema ku ew bidî ‘ebdkî menafi‘

Eya Rebbî ‘Elî ‘ebdek zelîl e
Gunehkar û feqîr û bêdelîl e

Tu aza ke ewî roja qiyamet
Bibe cennet bi rehma xwe b'selamet

Digel aba û hem ehbab û dostan
Bi cahê Mustefa serdarê dostan

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٤)

طَامْ ژدُنْيَائِي وَشِي بُويَه غَلاَ خِيرُوخوَشِي
بَرفَه قَطْ نَابِي رَشِي وِنْدَابُو نَامُوسُ و شَرَفْ

اِی نَدِينَه كَيْفْ تُونِينَه دِلْ حَزِينَه چَافْ گِرِينَه
هَيْ هَوَارْ اَمْ بِي خوَيِينَه ژِ ظُلْمِي رَا بُونَه هَدَفْ

وكْ كَرِيكْ پَظْ بِي شِفَانْ هَمْ خوَيِي ژِي بِي گُمَانْ
رَفْدَكِي گُرْ لِي خُوَيَانْ فِي مِلْ وِي مِلْ كِرْ تَلَفْ

كَتْ جِهِي رَحْمُ و عَدَالَتْ تَعْدِي ژُ ظُلْم و ظَلاَلَتْ
حَيرِنْ عَقْدُو عَلاَالَتْ رُوژِي رُوحْنِي بُونَه شَقْ

تُو بِنِيرَه اِی ژخُدِيرَه هَرْ لِژِيرَه خوَه فِشِيرَه
اَفْ چِه پِيلَه اَفْ چِه گِيرَه اَمْ كَتِينِي نِينَه قَفْ

24.

Tam ji dunyaê weşî
Bûye xela xêr û xweşî
Berf e qet nabê reşî
Winda bû namûs û şeref

Ê nedîn e keyf tunîn e
Dil hezîn e çav girîn e
Hey hewar em bê xweyî ne
Ji zulmê ra bûne hedef

Wek kerîk pez bêşivan in
Hem xweyî jê bêguman in
Revdekî gur lê xuyanin
Vî mil wî mil kir telef

Ket cihê rehm û ‘edalet
Te‘dî û zulm û zelalet
Heyirîn ‘evd û ‘elalet
Rojê rohnî bûne şev

Tu binêre ê j'Xudê re
Her li jêr e xwe veşêre
Ev çi pêl e ev çi gêr e
Em ketinê nîn e qef

Kurd û Kurdistan

Revd: Ref. bir.
Elalet: Zar û zêç, xelk.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ای کُو دُوهْ پیرْ عَیْنْ شفَانه ایرُو بَدَلْ آپَارْدِمَانه
چَا ژُ قَهْوه دَرگَفَانه شَقْشَقَا تَزبِی صَدَفْ

دُرُّ گَوهَرْ بُونَه وِنْدَا کَسْپُ و مَسْپِكْ مَانْ بِشُونْدَا
تُو بِنِیرْ سَرْدَارِی گُنْدَا آخُ و آخُ و صَدْ اَسَفْ

رِیزُو رَسْمَادِینْ نِزَانْ گَرْ بِزَانْ لِی نَبَانْ
اَزْ نَزَامْ بِیژْمْ چَوَانْ وَانْ بِبِینَه ژْوَانْ بِرَفْ

اَغْلَبِی وَانْ حِیلَه چِینْ شِیفُ و رُوژِی نُوبَه چِینْ
کَا ژکِی تِشْتَکِی بْچِقِینْ عِیشُ و کَارْ وَانْ بُونَه اَفْ

حَتَّی کَنگِی وِی وِهَابِی عِیشُ و کَارِی مَه فَنَابِی
اَفْ گَرِیکَا هَه فَنَابِی اَیْ خُدَا رَحْمَا تَه زَحْفْ

اَمْ ژَتَه رَحْمِی دِخوَازِنْ مَه لْدَرِی تَه گَرِیُ و گَازِنْ
مَاجَرِی دُورُو دِرَازِنْ صَافِی نَابِنْ قَطْ بِدَفْ

اَیْ عَلِی ژکِی رَا دِبِیژِی ژکَسْکِرَا نَاچِیتَه مِیژِی
تُو چِقَا عَزْمَانْ دِرِیژِی کَا دَفِی خَوه بِینَه هَفْ

Ê ku doh pêr eyn şivan e
Îro bedel apardiman e
Ça û qehwe dergevan e
Şeqşeqa tizbê sedef

Durr û gewher bûne wunda
Kesp û mespik man bi şûn da
Tu binêr serdarê gunda
Ax û ax û sed esef

Rêz û resma dîn nizanin
Ger bizanin lê neban in
Ez nizam bêjim çawa nin
Wan bibîne j'wan birev

Exlebê wan hîleçî nin
Şêv û rojê nobeçî nin
Ka ji kî tişkî bçeqînin
'Îş û kar wan bûne ev

Hetta kengî wê wihabê
'Îş û karê me fena bê
Ev girêka he venabê
Ey Xuda rehma te zehf

Em ji te rehmê dixwazin
Me l'derê te giryû gazin
Macera dûr û diraz in
Safî nabin qet bi dev

Ey 'Elî j'kî ra dibêjî
J'keskî ra naçête mêjî
Tu çiqa 'ezmandirêj î
Ka devê xwe bîne hev

Kurd û Kurdistan

Çeqandin: Standina bi hîle, xapandin.
Rezm û resm: Rêç û usûl. Ango rastî û heqîqeta dîn.
Kesp: Morî û pelikên ku dikin stûyê zarok û heywanan. Armanc, tiştên bêqîmet.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

25.

Me hewar e li deryê Xewsê Geylan*
Hewar û sed hewar e Xewsê Geylan

Rezîl bû me di nêv pê û destê xelqê
Mecala min tu yî ey Xewsê Geylan

Xwe têşînê li ser ehlê xwe herkes
E'jî j'ehlê te me ey Xewsê Geylan

Dilê mi şkestiye ez bê xweyî me
Tu wî bav û xweyê min Xewsê Geylan

Çiqa ez ketme tengî vê demê da
Bike himmet ji bo min Xewsê Geylan

Gelek ser me dikin fexr û kubarî
Nema hurmet j'me ra ey Xewsê Geylan

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Xewsê Geylanî re hatiye nivîsîn.

(٢٥)

مَـه هَـاوَارَه لِـدَرْيِـي غَـوْثِـي گَـيْـلاَنْ
هَـوَارُو صَـدْ هَـوَارَه غَـوثِـي گَـيْـلاَنْ

رَزِيلْ بُـومَه دنـيفْ پِـي وْ دَسْتِـي خَلْـقِي
مَـجَـالاَ مِـنْ تُـوِي اَيْ غَـوثِـي گَـيْـلاَنْ

خوَه تِيشِينِي لِـسَرْ اَهْلِي خوَه هَرْكَسْ
اَژِي ژَاهْـلِـي تَـه مَـه اَيْ غَـوْثِـي گَـيْـلاَنْ

دِلِـي مِـه شْكَسْتِـيَـه اَزْ بِـي خوَيِـي مَـه
تُوِيـي بَاقُ و خـوَيِي مِنْ غَـوْثِي گَـيْـلاَنْ

چِـقَـا اَزْ كَـتْـمَـه طَـنْـگِـي قِـي دَمِـيدَا
بِـكَـه هِـمَّـتْ ژِبُـو مِـنْ غَـوْثِـي گَـيْـلاَنْ

گَـلَـكْ سَـرْ مَـه دِكِـنْ فَـخْـرُو كُـبَـارِي
نَـمَـا حُـرْمَـتْ ژْمَـرَا اَيْ غَـوْثِـي گَـيْـلاَنْ

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Eger ku b'te xweş e min jî qebûl e
We ger ne des hilîne Xewsê Geylan

Bi heyrana te me taqet nema min
Zelek tu l'wa bide ey Xewsê Geylan

Belê b'rengek welê herkes bizanit
Ku tu sênca me yî ey Xewsê Geylan

Te hesp zîn kirye rim her daçikandî
J'xilasa bêkesan ra Xewsê Geylan

Tu wî îmdada herkes dûr û nêzîk
Were îmdada min ey Xewsê Geylan

اگـر كُـو بْـتـه خـوشـه مـنْ ژى قـبُـولـه
وگـر نـه دسْ هـلـيـنـه غـوثـي گـيـلاَنْ

بـحـيـرانـا تـه مَـه طـاقـتْ نـمـا مـنْ
زلـكْ تُـو لـوا بـدَه اَيْ غـوثـي گـيـلاَنْ

بـلـي بـرنـگـكْ ولـي هـركـس بـزانـتْ
كُـو تُـو سـينـجـا مـه يـي اَيْ غـوثـي گـيـلاَنْ

تـه هـسـپْ زيـنْ كـريـه رِمْ هـرْ داچـكـانـدى
ژْخـلاصـا بـي كـسـانـرا غـوثـي گـيـلاَنْ

تُـوى امـدادا هـركـسْ دُورُو نـيـزيـكْ
وَرَه امـدادا مـنْ اَيْ غـوثـي گـيـلاَنْ

Rim: Hacetekî şer e.
Zele: Lêdana bi destvekirî, şeqam.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Gelek cara tu îmdada me hatî
Tu vê car jî were ey Xewsê Geylan

Tu zanî ku ‘Elî bûye birîndar
Ji te derman dixwazî Xewsê Geylan

Ji min ra cih nemaye ez çewa kim
Tu cehkî şanî min de Xewsê Geylan

Hezar rehmet bibarî j'canibê Heq
Şev û rojê li ser te Xewsê Geylan

گـلـك جـارا تـو امـدادا مـه هـاتـي
تـو ڤـي جـار ژي وره اي غـوثـي گـيـلانْ

تـو زانـي كـو عـلـي بـويـه بـريـنـدارْ
ژتـه درمـانْ دخـوازي غـوثـي گـيـلانْ

ژمـن را جـه نـمـايـه ازچـواكـم
تـو جـهْ كي شـانـي من ده غـوثـي گـيـلانْ

هـزارْ رحـمـتْ بـبـاري ژ جـانـبـي حـقْ
شـفْ وروژي لـسـرْ تـه غـوثـي گـيـلانْ

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٦)

بِغَفْلَتْ عُمْرِى مَه بُورِى بْتَمَامِي
نِزَامْ كَنْگِي اَمِي لْخوَه بِبْنَه هِشْيَارْ

اَمِي بِمْرِنْ بِچِنْ حَشْرُو حِسَابِي
جِهِي قَنْجَايَه جَنَّتْ يِي دِنِي نَارْ

بِكِنْ تَوْبَه ژْدِلِي صَافِي ژُ پَاقِژْ
حَتَا مَرْنِي بِبِنْ تَازَه وَفَادَارْ

نَه عِيشْكْ زَارُوكِيَه عِيشِي تَوْبِي
بِزَانِنْ كُو بْخُدَارَا بُويَه بَازَارْ

هِنْكْ جَذْبُ و گِرِينَه دَانِي صُبْهِي
دِكِنْ گُوفْنْدُو رَقْصِي دَانِي اِيقَارْ

بِوَانْ فَخْرِى دِكِتْ مَلْمُونِي اِبْلِيسْ
كُو ژِيرَا بِوُنَه اَفْ دَسْتَه قُومَانْدَارْ

26.

Bi xeflet umrê me bûrî b'temamî
Nizam kengî emê l'xwe bibne hişyar

Emê bimrin biçin heşr û hîsabê
Cihê qenca ye cennet yê dinê nar

Bikin tewbe j'dilê safî û paqij
Heta mirnê bibin taze wefadar

Ne 'îşek zarokî ye 'îşê tewbê
Bizanin ku b'Xuda ra bûye bazar

Hinek cezb û girîne danê sibhê
Dikin govend û reqsê danê êvar

Bi wan fexrê dikit Mel'ûnê Îblîs
Ku jê ra bûne ev deste qumandar

Kurd û Kurdistan

Cezb: Di zikir de xwewindakirina sofiyan.

Deste: Cur, celeb.
Nar: Agir.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

نـه خـوسـكـاوي ژڤـي بـنـدي وبـمـري
دوي وقـتـي نـه گـازي ژ نـه هـاوار

دوي رژا حـسـابـي وي، بـبـت كـفـش
لـمـيـدانـي كـيـه مـلاً كـيـه قـار

أڤـه شـيـطـيـن بـجـارك بـريـه تـالان
ده كـا رابـن نـبـن ژوان سـسـتـي مـردار

ده بـلـكـي هـون بـزڤـريـنـن ژ دس وي
وگـر نـه بـونـه هـون سـيـويـي ديـوار

عـلـي بـيـژه تـوي لـجـم خـوه نـهـيـلـه
ده تـو پـاشـي نـبـي مـسـؤول و عـيـبـدار

Ne xweska wî ji vê bendê we bimrê
Di wî weqtî ne gazî û ne hewar

Di wê roja hîsabê wê bibit kifş
Li meydanê kî ye mella kî ye qar

Eve şeytên bi carek birye talan
De ka rabin nebin j'wan sistê mirdar

De belkî hûn bizivrînin ji des wî
We ger nebûne hûn sêwiyê dîwar

'Elî bêje tuwî l'cem xwe nehêle
De tu paşî nebê mes'ûl û 'eybdar

Kurd û Kurdistan

Mella=Mela: Yê ku kar kirî. Yê ku di qurekirinê de dibe yekemîn.

Qar: Xisirî. Yê ku di qurekirinê de dibe yê paşî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٧)

ژغـریـبـا ازنـه نـالـیـمـه تـو جـارا
ژ دوسـت و اقـربـا بـومـه بـریـنـدار

یـکـی جـارك دگـو امـامـی نـعـمـان
مـحـبـم ازژتـرا بـی حـدّ و مـقـدار

اوی گـوتـونـه پـسـمـامـی نـه جـیـران
اون ای مـو دبـی لـجـم وا ظـرردار

حـتـا کـاری ژ پـسـمـامـا بـبـه دور
ژبـر پـسـمـامـا درکـت صـاحـبـی غـار

چـقـا تـو ژوان بـبـی دور تـی عـزیـز بـی
وگـر نـه تـی بـبـی نـك واصـپ وصـار

حـسـدچـیـنـه ژتـرا وقـتـا بـبـی تـیـر
طـنـازچـیـنـه بـتـه گـافـا بـبـی ژار

27.

J'xerîba ez nenalîme tu cara
Ji dost û eqriba bûme birîndar

Yekî carek digo Îmamê Ni'man
Muhibb im ez j'te ra bê hedd û miqdar

Ewî go tu ne pismam î ne cîran
Ew in ê mû dibê l'cem wa zererdar

Heta karî ji pismama bibe dûr
Ji ber pismama derket Sahibê Xar

Çiqa tu j'wan bibî dûr tê ezîz bê
We ger ne tê bibî nik wa sipûsar

Hesedçî ne j'te ra weqta bibî têr
Tinazçî ne bi te gava bibî jar

Kurd û Kurdistan

Sahibê Xar: Xwediyê şikeftê; ango Muhemmed (s.x.l.).
Sipûsar: Bêqîmet.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Ji ber pismamê xwe ‘Evdo dinalî
Bişarê Çetto ku hinde bû navdar

Me cerband me nedî xweştir ji dûrî
Di bazara nêzîkî me nekir kar

Çiqa xweş bî ku em cem hev bimana
Feqet jev ra bibûna em emekdar

Nekû b'tehlî û dilrehtî û gazind
Wekî zarokê bêeql û neguhdar

Ji wan herkes dibînê xwe li heqyê
Hevalê xwe dibînê neheq û ‘ar

Xwe nakêşin bi mîzana Xudayî
Heçî ne b'hemdê wî kî bî dibê har

ژبر پسمامي خوه عقدو دنالي
بشاري چتو كو هندە بو نافدار

مە جربانذ مە نە دي خوشتر ژدوري
دبازارا نيزيكي مە نكر كار

چقا خوش بي كو ام جم هف بمانا
فقط ژفرا ببونا ام امكدار

نە كو بتحلي ژ دلرحتي ژگازند
وكي زاروكي بي عقل و نە گهدار

ژوان هركس دبيني خوه لحقيي
هقالي خوه دبيني نە حق و عار

خوه ناكيشن بميزانا خدايي
هچي نە بحمدي وي كيبي دبي هار

Bişarê Çeto: Mêrekî mala Faro ye, bi şervanî û lehengiya xwe navdar bû.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

خُدَا ژی رَازی بی یی کو خوه نَاسْبکی
نَبی ژْبَنْدَا اوی نَفْسَا کُو غَدُارْ

بِبی تَسْلِیمْ ژْبُونَا حُکْمِی شَرْعِی
ژْشَیْطَانِی لَعِینْ رَا اَوْ نَبِی یَارْ

ژ نِیزِیکِی گَلَکْ کَتْنَه ددلْدَا
بِرِینْ اَقْدُوری ژِیرَا بُویَه نُوژْدَارْ

مَه هِیڤی ژْوَه نَکَنْ گَازِنْدُو لُومَا
بِرَا چَنْدَا بِرَانَه بَاشْقَه بَازَارْ

عَلِی بَاری تَه گِیرْ بُویَه نُوَالِی
نَخُوزْکَاوی کَتِی نْوَالِی نِهُو بَارْ

اَنَابِینِمْ کَسِی بَاری تَه بَارْکِی
ژْغَیْرِی دَرْگَهِی رَبْ نِینَه هَاوَارْ

Xuda jê razî bî yê ku xwe nas bkî
Nebê j'benda ewê nefsa ku xeddar

Bibî teslîm ji bona hukmê şer'ê
Ji Şeytanê Le'în ra ew nebî yar

Ji nêzîkî gelek ketne di dil da
Birîn ev dûrî jê ra bûye nûjdar

Me hêvî j'we nekin gazind û loma
Bira çenda bira ne başqe bazar

'Elî barê te gêr bûye newalê
Nexwezka wî ketî nwalê nihû bar

E'nabînim kesê barê te bar kî
Ji xeyrê dergehê Reb nîn e hawar

Kurd û Kurdistan

Nûjdar: Dermanê bi şîfa, dermanê ku li birînê tê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٨)

مَه دزانبو ژعشقا دلا كو يك دبون شيخ وملا
نهو لهف دبن بلا وك بگلرا شيخ وملا

هر يك دڤيتن خوه تني هاڤالي وي وك تيتني
تحل و ظراف بي ددني بيژن اوي شيخ و ملا

اگر وها دوام بكت طرسك مزن وي ژي كڤت
مرا ربّ خدا نكت ژدينرا دبت دردو بلا

تشتك وه دي ژ جه دركتي بنه گهي هڤ بشيرتي
نه بنكل و عداوتي چه نك شيخا چه نك ملا

لدينذا نبت هركس خوه بين جم وي وبت كس دي تونين
اڤ عيبه كه لديني مبين نه لائقي شيخ و ملا

28.

Me d'zanibû j'şqa dila
Ku yek dibûn şeyx û mela
Nihû li hev dibin bela
Wek beglera şeyx û mela

Heryek divêtin xwe tinê
Havalê wî wek titinê
Tehl û zirav bê didinê
Bêjin ewê şeyx mela

Eger wiha dewam bikit
Tirsek mezin wê jê kevit
Me ra Rebbî Xuda nekit
J'dîn ra dibit derd û bela

Tiştek we dî j'cih derketî
Bibne guhê hev b'şîretî
Ne b'nikil û 'edawetî
Çi nik şeyxa çi nik mela

L'dîn da nebit herkes xwebîn
Cem wî we bit kes dî tunîn
Ev 'eybek e l'dînê mubîn
Ne laîqê şeyx û mela

Kurd û Kurdistan

Mubîn: Vekirî, yê ku rastî û nerastiyê ji hev vediqetîne, eşkere dike.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ضَرْبُ و مَثَلْ مَشْهُورْهَيَه خَوشْ كَتِيَه لْجِهي خَوَيَه
كُو هَابِكِنْ شَيْخِي مَيَه رَحْمَةُ اللهْ لْمَه جَاهِلاَ

شَيْخُ و مَلاَ كُوُ هَا بِبِنْ جَمْ هَڤْ سِكُ و عَيْبْدَارْ بِبِنْ
جَاهِلْ دِي بِي هَفْسَارْ بِبِنْ گُنَهْ سْطُوِي شَيْخُ و مَلاَ

هُونِنْ شِڤَانِي اُمَّتِي كُو هُونْ بِخوَه خَوهْرْكِنْ خَتِي
جَاهِلْ دِي چِيكِنْ حِيجَتِي ژْبِيْ وَه بِبِنْ تَرْتُ و بَلاَ

قَلْبَا بِهَڤْ شِيرِينْ بِكِنْ بَنْدِي بَشْيْطِينْ رَا بِكِنْ
دِينِي مُبِينْ كَسْكِينْ بِكِنْ اَڤَه حَقِي شَيْخُ و مَلاَ

تَڤْدَا بِبِنْ ژْڤْرَا مُعِينْ رَاكِنْ ژْنَافْ خوَه بُغْضْ و كِينْ
ژْ عَرْدِي هِلِينِنْ بَارِي دِينْ گَشْ بِنْ بِهَڤْرَا وَكْ گُلاَ

تَڤْدَا بِبِنْ ژْهَڤْرَا هَڤَالْ ژْڤْرَا بِكِنْ قَلْبَا زَلاَلْ
رَاكِنْ ژْنَافْ خوَه قِيلُ و قَالْ صُوفِي فَقَه شَيْخُ و مَلاَ

Derbûmesel meşhûr heye
Xweş ketiye l'cihê xwe ye
Ku ha bikin şeyxê me ye
Rehmetullah l'me cahila

Şeyx û mela ku ha bibin
Cem hev sik û 'eybdar bibin
Cahil dê bê hefsar bibin
Guneh stûwê şeyx û mela

Hûn in şivanê ummetê
Ku hûn bi xwe xwehr kin xetê
Cahil dê çêkin hêcetê
J'pey we bibin tert û bela

Qelba bi hev şîrîn bikin
Bendê bi şeytên ra bikin
Dînê mubîn keskîn bikin
Ev e heqê şeyx û mela

Tev da bibin j'evr a mu'în
Rakin ji nav xwe buxd û kîn
J''erdê hilînin barê dîn
Geş bin bi hev ra wek gula

Tev da bibin j'hev ra heval
J'ev ra bikin qelba zelal
Rakin ji nav xwe qîl û qal
Sofî feqe şeyx û mela

Kurd û Kurdistan

Derbûmesel: Gotina pêşiyan.
Hêcet: Hêncet, bihane.
Tert û bela: Belawela.
Sik: Kirh, nexweşik.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Dînê me yek dîn e temam
Ez b'xwe bibîm jê ra xulam
Ê ku ji dîn ra bit zelam
Heskî bila bit j'Kerbela

Em hêvî û zarî dikin
Ji sofiya ‘eksê nekin
Wek sofiyê safî bikin
Ew xidmeta şeyx û mela

Rêza şerî‘etê biçin
Resma terîqetê biçin
Bendê nekin ferqê nekin
Di mabeyna şeyx û mela

Sofîtî ne b’şaş û rih e
L'heddê xwe da tiştek b'cih e
Ew sofî bêşek ebleh e
Ku guh nedê şeyx û mela

Sofî divêtin hûr û kûr
Şeyx ra nebê eyb û qusûr
Ser ya xwe bê nêzîk û dûr
Razî bin jê şeyx û mela

Lakin ewê bê buxd û kîn
J'dîn ra emekdar û emîn
Sax bin bi wa derd û birîn
Qismê wiha şeyx û mela

دینی مه یك دینه تمام ازبخوه ببیم ژیرا غلام
ای كو ژ دین را بت زلام حسكی بلا بت ژكربلا

ام هیقی ژ زاری دكن ژ صوفیا عكسی نكن
وك صوفیی صافی بكن او خدمتا شیخ و ملا

ریزا شریعتی بچن رسما طریقتی بچن
بندی نكن فرقی نكن دما بینا شیخ و ملا

صوفیتی نه بشاش و رهه لحدی خوه دا تشتك بجهه
او صوفی بی شك ابلهه كو گوه ندی شیخ و ملا

صوفی دفیتن هوروكور شیخ را نبی عیب و قصور
سریا خوه بی نیزیك و دور رازی بن ژی شیخ و ملا

لكن اوی بی بغض و كین ژ دینرا امكدارو امین
ساغبن بوا دردو برین قسمی وها شیخ و ملا

Buxd: Buxz, kîn.
Ebleh: Ehmeq, bêhiş.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

لْگُوهيِ خوَه كِنْ ڤي شيِرَتيِ بْجَاهيِ حَبيِبيِ اُمَّتيِ
هُونْ صَارْ نَكِنْ طَرِيقَتيِ رَسْمَا زَلَالْ بُويَه غَلاَ

هَرْ چِه طَرِيقَا نَقْشيِ يَه وِرْدِي وِي ذِكْرِي قَلْبيِ يَه
حَرْبُ و شَرِي وِي بْدزِيَه هَا گُوتِنَه شَيْخُ و مَلاَ

قَلْبيِ خوَه بَاشْ صَافيِ بِكِنْ ذِكْرِي خَفيِ تِيدَه بِكِنْ
خوَه ژْ هَرْكَسيِ وِنْدَا بِكِنْ گَرْ وَه دِڤيِ يَا بيِ بَلاَ

هَرْ كيِ بِكِتْ اعْلاَنِيَه دَا خَلْقْ بِزَانِنْ اَوْ كِيَه
بيِ شُبْهَه اَو نُقْصَانِيَه پِرْسِي بِكِنْ ژْشَيْخُ و مَلاَ

گُوڤَنْدُو رَقْصُ و هَيْ هَيَه گَرْ چِه لْطَرِيقَادَا هَيَه
نِكْ نَقْشِيَا اَوْ سَخْتَه يَه دَاهُونْ نَبِنْ پيِ مُبْتَلاَ

لَكِنْ كُو شَوْقْ غَالِبْ بِتِنْ رُوحْ غَالِبيِ قَالِبْ بِتِنْ
بيِ حَمْدِي وِي جِهْ رَاكِتِنْ فَتْوَا دِدِنْ شَيْخُ و مَلاَ

L'guhê xwe kin vê şîretê
B'cahê hebîbê ummetê
Hûn sar nekin terîqetê
Resma zelal bûye xela

Her çi terîqa Neqşî ye
Wirdê wî zikrê qelbî ye
Herb û şerê wî b'dizî ye
Ha gotine şeyx û mela

Qelbê xwe baş safî bikin
Zikrê xefî tê de bikin
Xwe j'herkesî winda bikin
Ger we divê ya bêbela

Her kî bikit î'laniye
Da xelq bizanin ew kî ye
Bêşubhe ew nuqsanî ye
Pirsê bikin j'şeyx û mela

Govend û reqs û heyhey e
Ger çi l'terîqa da heye
Nik Neqşiya ew sexte ye
Da hûn nebin pê mubtela

Lakin ku şewq xalib bitin
Rûh xalibê qalib bitin
Bêhemdî wî cih rakitin
Fetwa didin şeyx û mela

Kurd û Kurdistan

Î'lanî: Eşkerekirin.
Qalib: Cesed.
Wird: Dubarekirina, zikr selewat û hwd...

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

نَبِي نَبِي هُونْ اَيْ بِرَا رَقْصِي بِكِنْ ژْكَيْفَا خوَه رَا
بِيژْنْ هَيَه اَفْ مَاجَرَا دَرْ مَكْتَبَا شَيْخُ و مَلاَ

جَاهِلْ دِڤِي تَسْلِيمْ بِبِنْ لْتَوْبِيدَا مُسْتَقِيمْ بِبِنْ
هَرْكَسْ ژْ وِي سَلِيمْ بِبِنْ فَيْدِي بِكِنْ ژْ شَيْخُ و مَلاَ

فَقَه دِڤِيتِنْ ژْبُو خُدِي دْعَاْمِي خوَه دَا جَهْدِي بِدِي
دَا اَوْ بِگَهْتَه مَقْصَدِي دُورْ بِي ژْرَسْمَا جَاهِلاَ

هَرْ كَه مَلاَيِي كُو وَبِي عِلْمُ و عَمَلْ تَقْوَى هَبِي
كِبْرُو حَسَدْ جَمْ وِي نَبِي پِيرُوزْبِي لِي رُتْبَا مَلاَ

شَيْخْ لاَئِقَه ژْوَانْ زِيدَه بِي دْعِلْمُ و عَمَلْ سَرْدَسْتَه بِي
لْدِينِي مَه دَا پِيشْيَا مَه بِي قُرْبَانْ بِبِمْ شَيْخُ و مَلاَ

اَزْ قَحِرِيمْ لَوْ اَفْ مِه گُوتْ ڤِي تَحْلِيِي قَلْبِي مَه صُوتْ
تَقْدَا حَمِي بُونَه سُكُوتْ سَرْ ڤِي يَكِي شَيْخُ و مَلاَ

Nebî nebî hûn ey bira
Reqsê bikin j'keyfa xwe ra
Bêjin heye ev macera
Der mekteba şeyx û mela

Cahil divê teslîm bibin
L'tewbê da musteqîm bibin
Herkes ji wî selîm bibin
Feydê bikin j'şeyx û mela

Feqe divêtin j'bo Xudê
Di'lmê xwe da cehdê bidê
Da ew bigehte meqsedê
Dûr bî ji resma cahila

Her kî melayê ku we bê
'Ilm û emel teqwe hebê
Kibr û hesed cem wî nebê
Pîroz bî lê rutbe mela

Şeyx laiq e j'wan zêde bî
D''lm û emel serdeste bî
L'dînê me da pêşya me bî
Qurban bibim şeyx û mela

Ez qehirîm lew ev mi got
Vê tehliyê qelbê me sot
Tev da hemî bûne sukot
Ser vê yekê şeyx û mela

Kurd û Kurdistan

Musteqîm: Rast.
Sukot: Sukût, dengnekirin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

كَسْ نينه صُلْحَا وَانْ بِكي پَاقِژْ بِكي وَا ژْفِي رِكي
اَفْ رَبَنِي ژِ فِنْدِكي نَاكِنْ بِي شَيْخُ و مَلا

لَكِنْ هَنه ژْفِي عَسْكَرِي سَرْ سُنَّتَا پَيْغَمْبَرِي
اَفِي دِينِي بِبِنْ سَرِي شُعْلَه بِدِنْ وكْ مَشْعَلاَ

مِنَّتْ ژِ كَسْ هِلْنَاگِرِنْ دَائِمْ ژْخُدَا رَا حَاضِرِنْ
صَافِي ژْوِيرَا اَوْ حُرِنْ گَرْ چِه بِبِتْ حَوْلُ اَلْوَلاَ

يَارَبْ لَدَرِي تَه اَلاَمَانْ تُو مَه بْگَرِي ژْحِزْبَا اَفَانْ
وِنْدَا نَكِي دْفِتْنَا زَمَانْ مَه وْ دُوسْتِي مَه وْ شَيْخُ وَمَلاَ

عَزْمَانْ دِرِيژِي تُو عَلِي ژْهَرْ تِشْتِي تُو دِشْتَغِلِي
حَقِي تَه يَه ژْبِي عَقِلِي مُو لْتَه بِدِيتِنْ چَنْدْ زَلاَ

Kes nîn e sulha wan bikê
Paqij bikê wa j'vê rikê
Ev rebenê ji Findikê
Nakin bi yê şeyx û mela

Lakin hene j'vî 'eskerî
Ser sunneta peyxemberî
Evî dînî bibin serî
Şul'e bidin wek meş'ela

Minnet ji kes hilnagirin
Daîm j'Xuda ra hadir in
Safî ji wî ra ew hur in
Ger çi bibit "hewlul-wela"

Ya Reb l'derê te el-eman
Tu me b'gerî j'hizba evan
Winda nekî d'fitna zeman
Me w dostê me w şeyx û mela

'Ezmandirêj î tu 'Elî
J'her tiştê tu dîstexilî
Heqê te ye j'bê'eqilî
Mû l'te bidîtin çend zela

Kurd û Kurdistan

Ger çi bibit "hewlulwela": Çiqas dunya têkilhev jî bibe.
Zela: Şeqam.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٢٩)

اَيْ عَلي رَابَه دَرَنْگَه هـي لِدَرْسَا اَبْجَدي
عُمْرِي تَه هَاهَا خِلاَصْ بِي تَه تُو فَايْدَه ژِي نَدي

وَقْتْ دِبُورِنْ تُو دِمِينِي ظَنْ دِكِي هَرْ وِي وَبِي
تِي بِچِي ژُ وَقْتِي بِيتِنْ تُو نَه حَاضِرْ هَوْ تَدي

كَاتَأَمُّلْ بِكَه جَارِكْ وَرَه سَرْ جَعْدِي بِمَشْ
اَزْتَرَا كَتْمَه بَلاَيِي تُو سِلِي نَابِي كَدي

تُو بِقِي دُنْيَايَا فَانِي نَبَه مَغْرُورُو بِزَانْ
تِي بِبِي پُوشْمَانْ يَقِينِي كُو تُو دَفْ ژِي بَرْنَدي

تُو ژْدِلِي صَافِي بِكَه تَوبَه مَبِيژْ ايرُو صبَا
كُو كَتَه لْدَسْتِي تَه دَا بِگْرَه بِلَزْ دَا بَرْنَدي

اَفْ چَه يَازُوخَه چَه حَيْفَه بِقَا چَنْدْ رُوژِي دِنِي
تُو ژْدَسْتِي خَوَه بِكِي لَذَّتُ و كَيْفَا اَبَدي

Ey ‘Elî rabe dereng e hê li dersa ebced î
‘Umrê te haha xilas bî te tu fayde jê nedî

Weqt dibûrin tu dimînî zen dikî her wê we bî
Tê biçî û weqtê bêtin tu nehadir hew te dî

Ka te’emmul bike carek were ser ce‘dê bimeş
Ez te ra ketme belayê tu sil î nabî kedî

Tu bi vê dunyaya fanî nebe mexrûr û bizan
Tê bibî poşman yeqînî ku tu dev jê bernedî

Tu j'dilê safî bike tewbe mebêj îro siba
Ku kete l'destê te da bigre bi lez da bernedî

Ev çi yazox e çi heyf e bi va çend rojê dinê
Tu ji destê xwe bikî lezzet û keyfa ebedî

29.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دُورَه هَرْ كِي تِي دِنِي چَنْدْ كِي دِمِينِي زُ دِچِي
هِنْ نَچِنْ تِيدَه بِمِينِنْ نَه مَه سَحْ كِرْ نَه مَه دِي

پِشْتِي چُونِي دِي بِچِنْ حَشْرُو حِسَابِي جُمْلَه خَلْقْ
نَبَخُوزِي وِي كُو دِوِي رُوژِي بِبِي شَرْمُ و فَدِي

اَزْدِكِمْ گَازِي اَدَرِي تَه يَا كَرِيمُ و يَا رَحِيمْ
غَيْرِي تَه كِيدِي هَيَه تِشْتَكْ بِدِي گَرْ تُونَدِي

صَدْ هَزَارْ حَمْدْ ژَتَرَا كُو مِنْ بِتَه اِيمَانْ هَيَه
هَمْ حَبِيبِي تَه مُحَمَّدْ كُو لَدِنِي ذَاتِي تَه دِي

≈≈≈

Dor e her kî tê dinê çendkî dimênî û diçê
Hin neçin tê de bimînin ne me seh kir ne me dî

Piştî çûnê dê biçin heşr û hisabê cumle xelq
Ne b'xwezî wî ku di wê rojê bibê şerm û fedî

Ez dikım gazî l'derê te ya Kerîm û ya Rehîm
Xeyrê te kî dî heye tiştek bidî ger tu nedî

Sedhezar hemd ji te ra ku min bi te îman heye
Hem hebîbê te Muhemmed ku l'dinê zatê te dî

≈≈≈

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٠)

اَمْ كَتنه نافْ كُلافي ڤي دنيدا هَيْ هَوَارْ
كَنْگي اَمْ دي دَرْكَڤْنْ ژْدَسْتي اَڤي پيرا غَدَارْ

شَفْقَتُ و رَحْمَتْ تنينه حيلَه بازُو سِحْرَبَنْدْ
وَكْ مَه پُرْخاپَانْدنه لاَطيدَه بِرْنَه كِرْنَه خَارْ

عِبْرَتي اَمْ ناگِرِنْ ژْوَانْ كُو طَرابُونَه بَري
اَمْ ژي دي، وَكْ وَانْ بچِنْ وَكْ وَا اَمي بِنْ شَرْمِسارْ

لاَزِمَه لَسَرْمَه كُو اَمْ هِشْيارْ بِبِنْ ژْڤي غَفْلَتي
ناگِهي پاشْيا دِني كَسْ نَه پَيا ژُ نَه صُوارْ

آخِرَتَه مالاَ حَقيقي دُنْيا مُلْكَكْ فانيه
حَيْفُ و يازُوخَه كُو اَمْ ژْبُونا دِني بِنْ بَنْدَه وَارْ

سُوزُو بَختي وي، تُونينَه اَوْ ژِكْسْرا نابي دُوسْتْ
كَاني آغا كَاني پاشا كا خُدَاني ذُوالْفَقارْ

30.

Em ketine nav kulafê vê dinê da hey hewar
Kengî em dê derkevin j'destê evê pîra xedar

Şefqet û rehmet tinîn e hîlebaz û sihrebend
Wek me pur xapandine latê de birne kirne xwar

'Ibretê em nagirin j'wan ku tera bûne berê
Em jî dê wek wan biçin wek wa emê bin şermisar

Lazim e l'ser me ku em hişyar bibin j'vê xefletê
Nagihê paşya dinê kes ne peya û ne suwar

Axret e mala heqîqî dunya mulkek fanî ye
Heyf û yazox e ku em j'bona dinê bin bendewar

Soz û bextê wê tunîn e ew ji kes ra nabê dost
Kanî axa kanî paşa ka Xudanê Zulfeqar

Kurd û Kurdistan

Kulaf: Lep. Lepên teyran.
Sihrebend: Sihirbaz.
Xudanê Zulfeqar: Zulfeqar navê şûrê Îmamê 'Elî ye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

تَفْ حەمي چُونە ژْدنيِ دُنْيَا بخوە هي وَكْ خوە يە
رَشْ لِسَرْ كَسْكيِ گرينادى ژ كَسْرَا نَابي ژَارْ

هَرْكَسيِ عَاقِلْ بِتْنْ فِكْرَا خُدى قِيرَا هَبي
اَزْ دبيـژْمْ قي دنيِ نَاكي ژْخوە رَا پِشْتي ژُ بَارْ

بَاقْ و بَاپِيرى مَه كُوشْتنْ كَسْ ژَوانْ جِهْدَا نَهِشْتنْ
اَمْ چقَاسي نَه تِتِشْتنْ دَسْتي مَه لي نَابي صَارْ

مَقْصَدَا مَه ژْفي دنيِ دُنْيَا كُو آخْرَتْ تي نَبي
چُونْكي مَعْلُومَه كُو آخْرَتْ بي دنيِ نَاچي دِيَارْ

دُنْيَا كُو صَرْفْ بِتْ د آخْرَتْ بي غَرَضْ ژْبُونَا خُدَا
اَوْ ژْآخْرَتْ تي حِسَابيِ نَه ژ ڤي دُنْيَا مِرَارْ

Tev hemî çûne j'dinê dunya bi xwe hê wek xwe ye
Reş li ser keskî girênadê ji kes ra nabê jar

Her kesê aqil bitin fikra Xudê vê ra hebê
Ez dibêjim vê dinê nakî j'xwe ra pişti û bar

Bav û bapîrê me kuştin kes ji wan cihda nehiştin
Em çiqasî netitişt in destê me lê nabê sar

Meqseda me j'vê dinê dunya ku axret tê nebê
Çunkî me'lûm e ku axret bê dinê naçî diyar

Dunya ku serf bit di axret bê xered j'bona Xuda
Ew ji axret tê hisabê ne ji vê dunya mirar

Kurd û Kurdistan

Xered: Bê armancên şexsî û nefsî.
Pişti: Barê ku bi piştê tê hilgirtin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

لي بلي هر كس دبيژي دنيا مه ژبو آخرته
عالمي غيبي دزاني وي ژبر هلني ستار

وي دمي راست و دروچي وي ژهفدو كفش بين
نبخوزي وي كو دوي روژي بي اعتبار

اي علي پيشيا ته دا ريكي هيه گلكي بطرس
صد امانت من لته دا تو نچي بي كارو بار

كارو بار تقوى خدايه نه رم و شورو تفنگ
هركسي تقوى هبي او دي خلاص بي بي خسار

اي خدا تقوى خوه كه رزقي مه ام هيفي دكن
مه ژ پنجي ڤي دني درخه افا هنده نيار

Lêbelê herkes dibêjî dunya mi j'bo axret e
'Alimê xeybê dizanî wê ji ber hilnê sitar

Wê demê rast û derewçî wê ji hevdu kifş bibin
Ne b'xwezî wî ku di wê rojê bibî bêi'tîbar

Ey 'Elî pêşya te da rêkî heye gelkî bitirs
Sed emanet min li te da tu neçî bêkar û bar

Kar û bar teqwa Xuda ye ne rim û şûr û tifing
Herkesê teqwa hebê ew dê xilas bê bêxusar

Ey Xuda teqwa xwe ke rizqê me em hêvî dikin
Me ji pencê vê dinê derxe eva hinde neyar

Kurd û Kurdistan

Hinde: Ewqas.
Teqwa: Tirsa ji Xwedê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣١)

سَلاَمْ سَرْ تَه جَمِيلْ هَرْ تُو جَمِيلْ بِي
نَيَارِي تَه دِهَرْ وَقْتِي ذَلِيلْ بِي

ژ آلْتُونْ چَايْ، تَه صُنْدُوقْ هَرْ تَژِي، بِي
نَصِيبِي دُوسْتَانِي تَه وْ مَه ژِي بِي

بِزَانَه تُو بِرَادَرْ رَاسْتُ و بِي شَكْ
ژ هِنْگِيفَا نَه چُوژْبِيرَا مَه ايشَكْ

مَه گُو بَلْكِي بُويَه صَافِي بِپَاكِي
ژَلَوْرَا تُو ژَكَسْ پُرْسْيَارِي نَاكِي

ددُو لاَزِمْ بِدِنْ شَهْدَه بِرَسْمِي
كُو دَسْتِي تَه لِسَرْ وِي نِينَه ظُلْمِي

وِيَاژْدَفْ هَرْيَكِي دُودِي، بِبِيژْنْ
بَلِي بْشَرْعِي ژِي، اَوْ نُطْقِي بِرِيژْنْ

31.

Selam ser te Cemîl tu her cemîl bî*
Neyarê te di her weqtî zelîl bî

Ji altun çay te sundoq her tejî bî
Nesîbê dositanî te-w me jî bî

Bizane tu birader rast û bêşek
Ji hingê va neçû j'bîra me êşek

Me go belkî bûye safî bi pakî
Ji lewra tu ji kes pursyarî nakî

Dido lazim bidin şehde bi resmî
Ku destê te li ser wî nîn e zulmî

Weya j'dev her yekî do dê bibêjin
Belê b'şer'ê ji ew nutqê birêjin

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Cemîl re hatiye nivîsîn.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دبت كافي كو فرعين يك ژهردوان
بين فرعي اوي ديتر ژي اي جان

دڤي حاكم بزانت شرطي هردو
تميزا اصل و فرعا كت ژ هڤدو

اگر نيڤي نصابا شاهدابت
بصوندا ته دبت حقي ته ثابت

تُوي صوندبخوي بخدا كو شاهدي من
دبيژت راستيي ام مستحقن

وهايه ظاهري حكمي شريعت
چه لازم هون بكن قيرو هزيمت

Dibit kafî ku fer'ên yek ji herdwan
Bibin fer'ê ewê dîtir jî ey can

Divê hakim bizanit şertê herdu
Temîza esl û fer'a kit ji hevdu

Eger nîvê nîsaba şahida bit
Bi sonda te dibit heqqê te sabit

Tuwê sond b'xwî b'Xuda ku şahidê min
Dibêjit rastiyê em mustehеqq in

Wiha ye zahirê hukmê şerî'et
Çi lazim hûn bikin qîr û hezîmet

Fer': Şax, beş. Ya ne eslî.
Nîsab: Gihaştina hedê zikatê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٢)

اَيْ دلِي مَسكَنِي دَرْدَا مَا تُو زَانِي كُو چه بِي
اَوْ سَعِيدِي جَانْ فِدَا ژْ دِينِي مَه رَا ژْكِيسِي مَه بِي

بَيْرَقَا كُو وِي هِلَانِي ژْبُو فِي دِينِي مُبِينْ
مَه چِقَا پُرْسِي ژُ سَحْ كِرْ فِي دَمِي كَسْ دِي نَبِي

چِيرَا دِينْ گِرْتبُو پَاكِي ژ كَسْكِي نَدكِرْ
حَقْ دِزَانِي حَقْ دِگُوتُ و حَقْ دِكِرْ هَرْدَمْ وَه بِي

اَوْ دكَانَا كُو وِي دَانِي اَوْ مَتَاعِي دِفرُوتْ
اَوْ لِشَامُ و مِصْرُو بَغْدَايِي نِهُو پَيْدَا نَبِي

چُو وَفَاتْ كِرْ چه مُصِيبَتْ صَدْ هَزَارْ رَحْمَتْ لِسَرْ
ژْ اَهْلِي فِي دِينِي مُبِينْ رَا چه نُمُونَكْ تَازَه بِي

32.

Ey dilê meskenê derda ma tu zanî ku çi bî*
Ew Se'îdê canfida j'dînê me ra j'kîsî me bî

Beyreqa ku wî hilanî ji bo vî dînê mubîn
Me çiqa pursî û seh kir vê demê kes dî nebî

Çepera dîn girtibû pakî ji keskî nedikir
Heq dizanî heq digot û heq dikir herdem we bî

Ew dikana ku wî danî ew meta'ê difirot
Ew li Şam û Misr û Bexdayê nihû peyda nebî

Çû wefat kir çi musîbet sedhezar rehmet li ser
J'ehlê vî dînê mubîn ra çi numûnek taze bî

*Ev helbest ji Bedîuzzeman re hatiye nivîsîn.
Çeper: Sênc.
Meta: Pertal, malê ticaretê.
Pakî nedikir: Neditirsiya, minnet jê nedihilanî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

سيصدُو حفتي وْ نهي پشتي هزاري هجرتي
درگهي باغي بهشتا كرمي لْبرْ وي قبي

اوْ لنورْسي هاته دُنيا وي لأُورفا يي وفاتْ كرْ
اوْ شهير بُو اوْ بديعْ بُو اوْ چه بيمْ سرْدستَه بي

اي سعيدي هردُو دُنيا ديدنا ته بُو كدرْ
اَمْ ژْخداي خوَه دخوازنْ لآخرتي اَمْ لْجمْ نبي

اي علي گرْ چه سعيدْ چُو لي رسالي نُورْ نچُونْ
صدْ اَمانتْ من لته دا تُو ژوانْ محرُومْ نبي

Sêsed û heftê-w nehê piştî hezarê hicretê
Dergehê baxê bihişta keremê l'ber wî vebî

Ew li Nûrsê hate dunya wî li Urfayê wefat kir
Ew Şehîr bû ew Bedî' bû ez çi bêm serdeste bî

Ey Se'îdê herdu dunya dîtina te bû keder
Em j'Xudayê xwe dixwazin l'axretê em l'cem te bî

Ey 'Elî ger çi Se'îd çû lê Rîsalê Nûr neçûn
Sed emanet min li te da tu ji wan mehrûm nebî

Şehîr: Meşhûr, navdar.
Bedî': Bêhemta.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٣)

دِيـــتِـــنْ عَـــلـــيِ دْعُـــمْـــرِي خـــوَه دا
اَوْقَـــاسْ عَـــجـــيِـــبْ ژْحَـــدَى دَرِي

يَـــكْ ژِي اَوَه ژْدَسْـــتَـــيِ مَـــه چُـــو
سُـــوزُو وَفَـــا اَهْـــلـــيِ بَـــرِي

تَـــي بـــيِـــژِي اَفْ وكْ مِـــنْ بِـــقْـــيِ
مَـــاشَـــاءَ اللّٰهْ قُـــيِ جَـــوْهَـــرِي

تَـــيِ چَـــنْـــدَكِـــيِ تَـــجْـــرِيـــبَـــه كِـــيِ
نَـــابِـــيـــنِـــيِ ژْغَـــيْـــرِي غَـــدَرِي

حَـــتَّـــىٰ مَـــلاَ وْ شَـــيْـــخِـــيِ مَـــه ژِي
بُـــوتَـــه نَـــيَـــارِي خَـــنْـــجَـــرِي

33.

Dîtin ‘Elî d''umrê xwe da
Ewqas ‘ecîb j'heddê derê

Yek jî ew e j'destê me çû
Soz û wefa ehlê berê

Tê bêjî ev wek min bivê
Maşaellah vê cewherê

Tê çendekî tecrîbe kî
Nabînî j'xeyrê xederê

Hetta mela-w şeyxê me jî
Bûne neyarê xencerê

Xeder: Neheqî, sitem.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

هَـــرْیَـــكْ ژِوَانْ جَـــمْ خـــوَه دِبـــیِ
یَـــا حَـــقْ اَوَه كُـــو اَلْ سَـــرِی

مِـــیـــزَانَـــا رَاسْـــتْ نَـــاكِـــنْ قَـــبُـــولْ
خَـــطْ نَـــانِـــقْـــیِـــسِـــنْ لْـــمَـــسْـــطَـــرِی

تُـــو بِـــیـــژِی كِـــی نَـــه وَكْ تَـــه یَـــه
تِـــی بِـــی نَـــیَـــارْ لْـــسَـــرْ دَفْـــتَـــرِی

دَرْمَـــانْ لِـــكُـــوْ پَـــیْـــدَا بِـــكِـــنْ
جَـــمْ كِـــی اَمِـــی كِـــنْ مَـــهْـــدَرِی

اَمْ ژْرَبِّـــیِ خـــوَه هَـــیـــڤِـــیِ دِكِـــنْ
بِـــگْـــرِی دَرِی ڤـــیِ ظَـــرَرِی

Heryek ji wan cem xwe dibê
Ya heq ew e ku e'l'serê

Mîzana rast nakin qebûl
Xet nanivîsin l'mesterê

Tu bêjî kî ne wek te ye
Tê bî neyar l'ser defterê

Derman li kû peyda bikin
Cem kî emê kin mehderê

Em j'Rebbê xwe hîvî dikin
Bigrî derê vê zererê

Mehder: Şefaet.
Mester: Rastek, cedwel.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٤)

هَـــوَارَه هَـــيْ هَـــوَارَه هَـــيْ هَـــوَارَه
نَـــزَانِـــي اَهْـــلِـــي وَقْـــتْ اَمْ كِـــرْنَـــه صَـــارَه

ژ دَسْـــتِـــي وَانْ نَـــزَانِـــنْ اَمْ چَـــوَاكِـــنْ
خَـــبَـــرْ نَـــاچِـــنْ گُـــوهِـــي وَا وَكْ دِيـــوَارَه

نَـــزَانِـــنْ اَوْ نَـــزَانِـــنْ كُـــو نَـــزَانِـــنْ
كِـــي كَـــارِى وَا ژْرِيَـــاوَانْ بِـــيـــنِـــي خـــوَارَه

دِنِـــيـــرِى صُـــوفِـــيِ شِـــيـــسْـــتْ سَـــالِـــي رِهْ سْـــپِـــي
اَگَـــرْ شِـــيـــرتَـــكِـــي لِـــيـــكِـــي اَوْ نِـــيَـــارَه

دِبِـــيـــنِـــي بِـــهْـــنْ بِـــبِـــهْـــنْ عِـــيـــشْ تِـــي خِـــرَابْـــتِـــرْ
حَـــچِـــي سَـــالَـــه دِبِـــيـــژِى خـــوزْكَـــا پَـــارَه

بِـــرَا نَـــابِـــي ژْبِـــرَا رَا دُوسْـــتِـــي صَـــافِـــي
كُـــرَه ژْبَـــاڤِـــي خـــوَه رَا وَكْ گُـــرِيـــي هَـــارَه

34.

Hewar e hey hewar e hey hewar e
Nezanê ehlê weqt em kirne sare

Ji destê wan nizanin em çewa kin
Xeber naçin guhê wa wek dîwar e

Nezan in ew nizanin ku nezan in
Kî karê wa j'riya wan bînî xware

Dinêrî sofiyê şêst salî rihspî
Eger şîretkî lêkî ew neyar e

Dibînî bêhn bi bêhn 'îş tê xirabtir
Heçî sal e dibêjî xwezka par e

Bira nabê j'bira ra dostê safî
Kure j'bavê xwe ra wek guryê har e

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

نَـزَانْ بُـونَـه مَـزِنْ زَانَـه كِـچِـكْ بُـونْ
ژِڤِـي دَرْدِي هَـرَاقَـطْ نَـيـنَـه چَـارَه

مَـرُوڤِـي زَانَـه ژِيـرَه نَـيـنَـه لَـذَّتْ
نَـزَانِـي بِـي عَـقـلْ ژِيـرَا بِـهَـارَه

دِظَـاهِـرْدَه هِـنَـكْ نَـرِمْ وَكْ هَـڤَـيـرِنْ
بِـژَحْـرَاخَـوَه دِبَـاطِـنْ عَـيْـنِ مَـارَه

اَڤِـي دِبْـژِمْ عَـلِـي دَا تُـو نَـخَـاپِـي
ژِچُـونِـيـرَا بِـكَـه ژِدِلْ كَـارُو بَـارَه

خُـدَا بِـگُـرَه هِـرَا وِيـرَا نَـه بَـرْدَه
نَـه طِـرْسَـه جَـدِّي تَه خَـوِيْ ذُوالْـفَـقَـارَه

عَـلِـي هِـيـڤِـي ژِعَـلِـي كَه هَـرْدَمْ وگَـافْ
بَـسَـه ژِبُـو تَـه لِـدُلْـدُلْ هَـرْصُـوَارَه

Nezan bûne mezin zane kiçik bûn
Ji vî derdê he ra qet nîn e çare

Mirovê zane jê re nîn e lezzet
Nezanê bê'eqil jê ra bihar e

Di zahir de hinek nerm wek hevîr in
Bi jehra xwe di batin 'eynî mar e

Evê dibjim 'Elî da tu nexapî
Ji çûnê ra bike j'dil kar û bare

Xuda bigre hira-wêra neberde
Netirse ceddê te Xweyzulfeqar

'Elî hîvî j''Elî ke her dem û gav
Bes e j'bo te li Duldul her suwar e

Hira-wêra: Virde-wêde, filankes û bêvankes.

Kiçik: Piçûk.
Xweyzulfeqar: Îmamê Elî.

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٥)

مَه دیِ لْدِنیدَا پُرْ عَجیبْ نَایینْ حِسَابُ و دَفْتَریِ
یَكْ ژیِ ژِوَانْ دُوسْتَانْ نَمَا قَطْ شُبْهَتیِ دُوسْتیِ بَریِ

تیِ بیِژیِ اَفْ دُوسْتیِ ژْدِلْنْ مَا شَاءَ اللهْ تَفْ كَاكِلْنْ
یَكْ رُوحْنُ ودُو شَكِلْنْ تَه هَوْدیِ بُونْ لْفِكْرَا كَریِ

بَلْكیِ ژِوَانْ كَرْ چیتَرَه چُنكیِ رَبَنْ بَارْ هِلْگَرَه
بِكُو بِبِنْ بَیِ قِرْقَرَه نَه وَكْ فَا دَسْتْ سَرْخَنْجَریِ

دُوسْتَانیَا ژْدِلْ بُو غَلاَ حَتَّی دنیِفْ شَیْخُ و مَلاَ
رِحْ لْعَاقِلاَ بُویَه بَلاَ حَتَّیْ دِفِنْ بْچِنْ مَقْبَریِ

زُوژْهَفْ دچِنْ دُوسْتُ و هَفَالْ سَرْ هَفْ دِدِنْ اَوْ اَرْزُوحَالْ
سَبْ تِشْتَكیِ پُرْ بَیِ كَمَالْ تُو مَیْزَه كیِ لْبِنْ حَجَریِ

35.

Me dî l'dinê da pur ‘ecêb
Nayên hisab û defterê
Yek jî ji wan dostan nema
Qet şubhetê dostê berê

Tê bêjî ev dostê j'dil in
Maşaellah tev kakil in
Yekrûh in û duşekil in
Te hew dî bûn l'fikra kerê

Belkî ji wan ker çêtir e
Çunkî reben barhilgir e
Bi kû bibin bê qirqir e
Ne wek va dest ser xencerê

Dostaniya j'dil bû xela
Hetta di nêv şeyx û mela
Rih l'‘aqila bûye bela
Hetta divin b'çin meqberê

Zû j'hev diçin dost û heval
Ser hev didin ew erzûhal
Seb tiştkî pur bêkemal
Tu meyzekî l'bin hecerê

Kurd û Kurdistan

Hecer: Kevir.
Meqber: Tirb.
Şubhet: Mîna.
Xela: Tunetî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

نيـنْ حـكـيمْ عـيـشْ چـيـبـكـنْ نـافْ عـالـمـيـدا بـنْ سـكـنْ
دردُو بـلا درمـانْ بـكـنْ شـوقـي بـدي وكْ فـنـري

مـه ژ ربّي خـوه هـيـڤـي هـيـه كُـو بـيـنْ زولْهـانـا مـه يـه
هـلـنـي اڤـي ژنـافـا مـه يـه اَمْ بـنْ بـرايـي جـگـري

پـشـتـي اڤـا قـحـرُو كُـلا درمـانْ بـكـنْ دردُو بـلا
گـشْ بـنْ بـهـڤـرا وكْ گـلا حـتـا مْ بـچـيـنـه مـحـشـري

اَيْ سـيـدْ عـلـي نـبـي نـبـي طرسا تـه قـطْ ژكـسـكـي هـبـي
امـامْ عـلـي جـدّي تـه بـي گـرتْ دسـتـكـي دريـي خـيـبـري

Nîn in hekîm ‘îş çêbikin
Nav ‘alemê da bin sekin
Derd û bela derman bikin
Şewqê bidî wek fenerê

Me j'Rebbê xwe hîvî heye
Ku bîtin zû l'hana me ye
Hilnî evê j'nava me ye
Em bin birayê cegerê

Piştî eva qehr û kula
Derman bikin derd û bela
Geş bin bi hev ra wek gula
Hettam biçîne mehşerê

Ey Seyd ‘Elî nebî nebî
Tirsa te qet j'keskî hebî
Îmam ‘Elî ceddê te bî
Girt destkî deryê Xeyberê

Han: Hewar.
Hettam: Kurtiya “heta em” e.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٦)

دَمَا عِيشْ تَمَامْ بُو زَوَالاَ وِى تِي
وِهَا هَاتْيَه دِيتِنْ لِگُورْ عَادَتِي

نَه بَه شَابِعِيشْكْ كُو بُو اَوْ كَمَالْ
چِكُو لُجَمْ كَمَالِي يَه دُورَا زَوَالْ

كُو (اَكْمَلْتُ) رِيكِرْ خُدَايِي مَجِيدْ
دِنَافْ صَحَابَانْ بُو شَاهِي ؤُعِيدْ

دِنَافْ وَانْ تِنِي هَرْ اَبُو بَكْرْ گِرِي
دِزَانِي اَوِى دِينْ چِه هَاتَه سَرِي

وَفَاتْ كِرْ حَبِيبِي خُدَا وِى دَمِي
اَبُوبَكْرِ گِرِيَا سَبَبْ وِى غَمِي

صَلاَتِي خُدَا سَرْ حَبِيبِي وِى بِي
رِضَا آ خُدَا سَرْ اَبِي بَكْرِ بِي

36.

Dema ‘îş temam bû zewala wê tê
Wiha hatye dîtin li gor ‘adetê

Nebe şa bi ‘îşek ku bû ew kemal
Çikû l'cem kemalê ye dora zewal

Ku “ekmeltu” rêkir Xudayê Mecîd
Di nava sehaban bû şahî û ‘îd

Di nav wan tenê her Ebû Bekr girî
Dizanî ewî dîn çi hate serî

Wefat kir Hebîbê Xuda wê demê
Ebû Bekrî girya sebeb wê xemê

Selatê Xuda ser Hebîbê wî bê
Rida a Xuda ser Ebî Bekrî bê

Kurd û Kurdistan

Ekmeltu: Ayeta ku dibêje; “min ji we re dînê we temam kir.”

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

وَهْم بِي سَرْ آلْ و صَحَابِي دِيڑِي
بِهِنْگَه سَمَاوَاتْ و اَرْضَانْ تَڑِي

بِدَه خَاطِرِي وَانْ عَلِي فِنْدِكِي
بِگَلْكِي قَبُولْ كَه ژِوِي هِنْدِكِي

بِبِي جَنَّتِي وِي بِفَضْلْ و كَرَمْ
نَدَه وِي بْجَهَنَّمْ تُو ايِشْ و اَلَمْ

چَه تِشْتَا تُو كِي هَرْ لَمَيْدَانْ اَوَه
هِنَكْ دِي هَنَه كُو بِبِيژِنْ نَوَه

هَزَارْحَمْدْ ژْتَرَا كُو مُسْلْمَانِمْ اَزْ
لَكَسْ نَادِمْ اَزْ نَه پَحِينْ و نَه گَزْ

فَقِيرَكْ قْشَارْتِي دقُنْجَاخَوَه مَه
د ايرُو صِبَا لْهِيڤْيَا مِرْنَا خَوَه مَه

We hem bê ser al û sehabê dî jî
Bi hinge semawat û erdan tejî

Bide xatirê wan ‘Elî Findikî
Bi gelkî qebûl ke ji wî hindikî

Bibî cennetê wî bi fedl û kerem
Nede wî b'cehennem tu êş û elem

Çi tişta tu kî her li meydan ew e
Hinek dî hene ku bibêjin ne we

Hezar hemd j'te ra ku musilman im ez
Li kes nadim ez ne pehîn û ne gez

Feqîrek veşartî di qunca xwe me
Di îro siba l'hêvya mirna xwe me

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٧)

گـلـي بـرانـا هـوارَه صـدْ هـوارَه
سـرِي ژمـه سـتـانـدْ اقي دُنـيـا بـطـالـه

تـأمُـلْ كـنْ دكـيـفُ و لـذَتـا وي
بـتـحـقـيـقـي وكـي خـونُ و خـيـالـه

گـلـكْ دينـه گـلـكْ دينـه گـلـكْ دينْ
كـسـي ژيـرَه بـبـتْ دُوسـتُ و هـڤـالـه

بـنـيـرنْ وانْ مُـلـوكـي بـتـاجي زيـريـنْ
كـو دُنـيـا لـدسـتي وا نـدا بـبـو طـالـه

ژرتـبـا خـوَه كـتـنْ اوْ بـونْ پـريـشـانْ
قـبـرْ نـشـكـا ژ وانـرا بـويـه مـالـه

اسـيـرْ بـونـه دقـبـرا طـنـگُ و طـاري
خـوزي وه بـزانـيـا كـا وانْ چـه حـالـه

37.

Gelî brana hawar e sed hawar e
Serî j'me stand evê dunya betal e

Teemmul kin di keyf û lezzeta wê
Bi tehqîqê wekî xewn û xiyal e

Gelek dîn e gelek dîn e gelek dîn
Kesê jê re bibit dost û hevale

Binêrin wan mulûkê b'tacê zêrîn
Ku dunya l'destê wan da bibû tale

Ji rutba xwe ketin ew bûn perîşan
Qebir nişka ji wan ra bûye male

Esîr bûne di qebra teng û tarî
Xwezî we bzaniya ka wan çi hal e

Kurd û Kurdistan

Mulûk: Piraniya "melîk" e. Padîşah.
Teemmul: Fikirîn, baldayin.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

اگـرْ كُـو بْـكـارنـا دي وانْ بـگُـوتـا
بـقـرُنْ اَيْ بـرا دُنْـيـا چـه چـالـه

نـه وكْ رُوڤـي بـحـيـلـه دركـڤـنْ ژي
هـنـي بـمـنـنْ وكـي هـرْچـا سُـوتـالـه

لـنـكْ اَهْـلـي خُـدي پـيـركْ پـطُـوطـه
لـنـكْ بـي عـاقـلانْ شـنـگُ و شـپـالـه

گـلـكْ غـرانْ بـوي اَوْ ژي مـرنْ چُـونْ
كُـو جـاركْ دي ڤـگـرُنْ لـي مُـحـالـه

لـدُنْـيـا مـانـا مـه ژُبُـو امْـتـحـانـه
دحـدّي ذاتـي خـوه اَوْ بـي كـمـالـه

نـه كـنْ گـازنـدْ ژْ عـلـي كُـو قـرڤـري كـتْ
بـريـنـدارَه ژْكـزبْ نـبـژنْ نـه نـالـه

لـمـلْكـي كُـوشـتـنُ و لـيـكـي شـلانْدنْ
لـمـلْكـي فـحـشـكـي سـانـكـي حـلالـه

نـكـنْ گـرافْ اڤـي ديـنـي مُـبـارَكْ
ژسـركـهـنـي چـقـا ديـنـكْ زلالـه

Eger ku bkarîna dê wan bigota
Biqerrin ey bira dunya çi çal e

Ne wek rûvî bi hîle derkevin jê
Hinê bimnin wekî hirça sûtale

Li nik ehlê Xudê pîrek petot e
Li nik bêaqilan şeng û şepal e

Gelik xirran bi wê ew jî mirin çûn
Ku carek dî vegerrin lê muhal e

Li dunya mana me j'bo îmtihan e
Di heddê zatê xwe ew bê kemal e

Nekin gazind j''Elî ku qirqirê kit
Birîndar e j'kezeb nebjin nenale

Li milkî kuştin û l'yêkî şelandin
Li milkî fehşekî sankî helal e

Nekin gerrav evî dînê mubarek
Ji serkehnî çiqa dînek zelal e

Sûtal: Paqrût, serserî.
Petot: Gelekî extiyar. Riziyayî.
Xirran: Ji rê ketin, pê xapiyan.
Şepal: Xweşik, delal.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

مَه هيڤي ژوَه بكن هُونْ خدمَتا دينْ
بكنْ قُربانْ ژويرا جانُ و مالَه

ژ دُنْيارا بشُغلنْ قاسي هُونْ تي
دمينتْ چندَكي پاشي زوالَه

ددُنْيايدا بنْ هَرْ وَكْ غَريبانْ
چكُو ايرُو صبا ژى ارْتحالَه

لدُنْيارا هَبنْ وَكْ شَخْصي ريوى
لچَلْتي ويدا نانكْ لْدَسْ كُپالَه

دكُو هُونْ لآخرتيدَه سَرفراز بنْ
ژ وَه راضي بتنْ لْوى ذُو الْجَلالَه

چقا دُنْيا هَبي لْدَسْتي وَه دا بتْ
ظَرَرْ ناكتْ كُو دِلْ نَبْتَه هَڤالَه

كَسي دُنْيايي صَرْفْ كتْ دْ آخرَتيدَه
لجَمْ خالِقْ لجَمْ عَبْدا دلالَه

Me hêvî j'we bikin hûn xidmeta dîn
Bikin qurban ji wî ra can û male

Ji dunya ra bişuxlin qasî hûn tê
Dimînit çendekî paşî zewal e

Di dunyayê da bin her wek xerîban
Çikû îro-siba jê irtîhal e

Li dunya ra hebin wek şexsê rêwî
Li çeltê wî da nanek l'des kupale

De ku hûn l'axretê de serfiraz bin
Ji we radîbitin l'wê Zulcelale

Çiqa dunya hebê l'destê we da bit
Zerer nakit ku dil nebte heval e

Kesê dunyayê serf kit d'axretê de
Li cem Xaliq li cem ‘ebda delal e

Kurd û Kurdistan

Çelte: Çente, tûrik.
İrtihal: Barkirin.
Kupal: Gopal.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٣٨)

هَـــڤَـــالـــيِ رَاسْـــتْ دِخـــوَازِنْ اَمْ
دِايـــرُو اَوْ هَـــڤَـــالْ كَـــانـــيِ

دِ هَـــرْ اِقْـــلـــيـــمُ وهَـــرْ جَـــايـــيِ
گَـــرَاڤْ بُـــوَيَـــه مُـــسُـــلْـــمَـــانـــيِ

نَـــه مُـــحْـــبَـــتْ مَـــا نَـــه صُـــحْـــبَـــتْ مَـــا
نَـــه گُـــنْـــدِيـــتِـــى نَـــه جِـــيـــرَانِـــى

حَـــتَـــا نَـــاڤْ هَـــنْ مَـــلاَ وْ شَـــيْـــخَـــا
بُـــوَيَـــه حَـــرْبَـــكْ نَـــه رَحْـــمَـــانـــيِ

ژِوَانْ هَـــرْ كَـــسْ دِبِـــيـــنْـــتْ خـــوَه
لِـــسَـــرْ حَـــقِـــيـــيِ بِـــحِـــسَـــابِـــيِ خـــوَه

ژِ سُـــوءِ ظَـــنْ هَـــڤَـــالـــيِ خـــوَه
دِبِـــيـــنْـــتْ حِـــزْبَـــا شَـــيْـــطَـــانـــيِ

38.

Hevalê rast dixwazin em
Di îro ew heval kanî

Di her iqlîm û her cayî
Gerav bûye musulmanî

Ne muhbet ma ne suhbet ma
Ne gundîtî ne cîranî

Heta nav hin mela w şeyxa
Bûye herbek ne rehmanî

Ji wan herkes dibînit xwe
Li ser heqyê b'hîsabê xwe

Ji sûê zen hevalê xwe
Dibînit hizba şeytanî

Kurd û Kurdistan

Cay: Cî.
Gerav: Şîlo, ne zelal.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Bi wan bû sulh di nav xelqê
Bi wan bû we'z û rêzanî

Wekî ew b'xwe bikin bendê
Tu îşê cahila zanî

Emê çi bkin bi kû va çin
Li me roj bûne wek şêva

Emê peyda bikin l'kûdê
Ji bo vî derdî dermanî

'Elî navê wiha çêbê
Reben çi bkî tu pê nabê

Dikit hêvî ji rehma Reb
Bixî nav wan da şîranî

بـــوانْ بُـــو صُـــلْـــحْ دنَـــافْ خَـــلْـــقـــی
بِـــــوانْ بُـــــو وَعْـــظُ و ریـــــزانـــــی

وَکـــی اَوْ بْـــخـــوه بِـــکِـــنْ بَـــنْـــدی
تُـــو عـــیـــشـــی جَـــاهِـــلاَ زَانـــی

اَمـــی چـــه بْـــکِـــنْ بِـــکُـــو قُـــاچِـــنْ
لـــمـــه رُوژْ بُـــونَـــه وَکْ شـــیـــقَـــا

اَمـــی پـــیْـــدَا بِـــکِـــنْ لْـــکُـــودی
ژبُـــو قُـــی دَرْدی دَرْمَـــانـــی

عَـــلـــی نَـــا قُـــی وهَـــا چـــیـــبـــی
رَبَّـــنْ چـــه بْـــکـــی تُـــو پـــی نَـــا بـــی

دکِـــتْ هـــیـــقُـــی ژ رَحْـــمَـــا رَبْ
بِـــخـــی نَـــاقْ وَانْـــدَا شـــیـــرَانـــی

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Bira qencî bûye qehtî
Xirabî bûye erzanî

Kula herkes bûye ewqas
J'xwe ra peyda bikî nanî

Helal e yan heram e yê
Bikî pirsê gelek kêm in

Hema tirs tê nebit heskî
Bila bit malê Geylanî

Li ser 'erdê li bin 'erdê
Ji min seh kin evê ferdê

Eger îqbal hebit ew dê

.....

بـــرا قـــنـــجـــي بُـــويـــه قـــحـــتـــي
خـــــرابـــــي بُـــــويـــــه ارزانـــــي

كُـــلا هَـــركَـــس بُـــويـــه اَرْقَـــاس
ژْخـــوه را پـــيـــدا بـــكـــي نـــانـــي

حـــلالَـــه يـــان حـــرامَـــه يـــي
بـــكـــي پـــرســـي گـــلَـــك كـــيـــمـــن

هـــمـــا طـــرس تـــي نـــبـــت حـــســـكـــي
بـــلابـــت مـــالـــي گـــيـــلانـــي

لـــســـر عـــردى لـــبـــن عـــردى
ژمـــن ســـح كـــن اقـــي فـــردى

اگـــر اقـــبـــال هـــبـــت او دى

.....

İqbal: Siûd, bext.
Qehtî: Kêmayî, xela.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

39.

Selama Xuda l'ser te bit ey Cemîl*
Di dunya û uxra nebî tu zelîl

Çi mizgîniyek xweş me seh kir bira
Di mala hewe rohnîbû yek çira

Biçûkek ji bona we daye Xuda
Xuda wî bihêlî bi bab û bi da

Ji ewladê salih bigerînî wî
Bi şeytan û nefsê nexirrînî wî

Bixun fêkiyê 'umrê wî hûn b'xweşî
Nebînin li derheqqê wî tu reşî

Tu bimnî ji wî ra heta bibte mêr
Me hêvî j'Xuda mêrekî b'xêr û bêr

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Cemîlê qesîdebêj û muczzinê Şêx Seyda re -bi munasebeta çêbûna kurekî- hatiye nivîsîn.

Biçûkek: Zarokek.
Xirrîn: Ji rê derketin, xwe windakirin.
Zelîl: Belengaz.

(٣٩)

سَلاَمَا خُدَا لْسَرْ تَه بِتْ اَيْ جَمِيلْ
دِدُنْيَا وْ اُخْرىَ نَبِي تُو ذَلِيلْ

چه مِزگِينِيكْ خوَشْ مَه سَحْ كِرْ بِرَا
دِمَالاَهَوه رُوحْنِي بُوِيكْ چِرَا

بِچُوكَكْ زْبُونَا وَه دَايَه خُدَا
خُدَا وى بِهِيلِي بِبَابُ و بِدَا

ژَاوْلاَدى صَالِحْ بِگَرِينِي وى
بِشَيْطَانُ و نَفْسِي نَه غَرِينِي وى

بِخُونْ فِيكِي عُمْرى وى هُونْ بْخوَشِي
نَبِينِنْ لِدَرْحَقِي وى تُورَشِي

تُو بِمْنِي ژْوِيرَا حَتَا بِبْتَه مِيرْ
مَه هِيڤِي ژْ خُدَا مِيرِكِي بْخِيرُو بِيرْ

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Tu dilrehtiyê qet nebînî tu jê
Di dîn û di dunya tu razîbî jê

Ji wî ra bibîn pîrik û da sekin
Heta xêl û dawet ji wî ra bikin

Emanet tu navek xweşik dane ser
De paşî ji wî ra nebîtin keder

Ku nav her belaş bîn çira navê min
Nedanî ji navê xweşik navê min

De belkî bi fala wî navê temîz
Di nava hevalan bibîtin ‘ezîz

تُـو دِلْـرَحْـتِـيِ قَـطْ نَـبِـيـنِـيِ تُـو ژی،
دِدِيـــنُ و دِدُنْـــيَـــا تُـــو رَازِيـــبِـــيِ ژی،

ژْوِيـرَابِـبِـيـــنْ پِـيـــرِكُ و دَاسَـكِـــنْ
حَـتـَىٰ خِـيـــلُ و دَاوَتْ ژْ وِيـــرَا بِـكِـــنْ

اَمَـانَـتْ تُـو نَـاقَـكْ خـوَشـكْ دَانَـه سَـرْ
دَه پَـاشـيِ ژْوِيـــرَانَـبِـيـــتِـنْ كَـــدَرْ

كُـو نَـاقْ هَـرْ بَـلاَشْ بِـيـنْ چِرَانَـاقِـيِ مِـنْ
نَـدَانِـيِ ژْنَـاقِـيِ خـوَشـكْ نَـاقِـيِ مِـنْ

دَه بَـلْـكِـيِ بِـفَـالاَ وِيِ نَـاقِـيِ تَـمِـيـزْ
دِنَـــاقَـــا هَـــقَـــالاَنْ بِـــبِـــتِـنْ عَـزِيـزْ

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Çawa hûn dixwazin j'we ra ew we bit
Derê xêr û xweşî li ser we vebit

Dereng e Fehîme* bibîne j'me ra
Keça yek jinûbî feqet têrpere

Weyaxud keça sofiyek taze têr
Sexî bit di mala xwe da merdemêr

Berê me nede qet tu şeyx û mela
Çikû ew ji mû ra dibîtin bela

چـــاوا هُـــونْ دخـــوازنْ ژورا اوْ وبـــتْ
دَرِى خـــيـــرُوخـــوشـــي لـــســـرْ وَه قـُـبـــتْ

درَنْـــگـــه فـــهـــيـــمـــه بـــبـــيـــنـــه ژمـــه وه
كـــچـــا يـــكْ ژنُـــوبـــي فـــقـــطْ تـــيـــيـــرْ پـــره

وياخـــود كـــچـــا صـــوفـــيـــك تـــازه تـــيـــر
ســـخـــي بـــتْ دمـــالاَ خـــوه دا مـــرده مـــيـــر

بـــرى مـــه نـــه ده قـــطْ تُـــو شـــيـــخُ ومـــلاَ
چـــكُـــو اوْ ژمـــرُورا دبـــيـــتـــنْ بـــلاَ

Kurd û Kurdistan

* **Fehîme:** Dêya Cemîlê muezzin e.
Jinûbî: Jinebî.
Mû: Mirov, meriv.
Sexî: Comerd, çavfire.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

40.

Muhemmed ‘Eta pur selam ser te bê*
Derê xêr û xweşyê li ser te vebê

Me seh kirye tiştek çi şîrîn û xweş
Me çav bûye rohnî me dil bûye geş

Ku ferxik te bûn cot bi fedla Xudê
Xuda wan bihêlî bi bab û bi dê

Bi bapîr û pîrik bi mam û bi xal
Bi keyf û bi şahî bi ‘izz û delal

Ne herdû tenê bin gelek dî hebin
Di dîn û di dunyayê serdeste bin

*Ev helbest ji Muhemmed Eta re hatiye nivîsîn. Muhemmed Eta kurê Şêx Seyda yê mezin e.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٠)

مُحَمَّدْ عَطَا پُرْسَلاَمْ سَرْتَه بِي
دَرِي خِيرُو خوَشْيِي لِسَرْتَه قُبِي

مَه سَحْ كِرْيَه تِشْتَكْ چه شِيرِينْ و خوَشْ
مَه چَافْ بُويَه رُوحْنِي مَه دِلْ بُويَه گَشْ

كو فَرخك تَه بون جوت بِفَضلا خدى
خُدا وَانْ بِهِيلِي بِبَابُ و بِدِي

بِبَاپِيرُو پِيرِكْ بِمَامُ و بِخَالْ
بِكَيْفُ و بِشَاهِي بِعِزُّو دَلاَلْ

نَه هَرْدُو تَنِي بِنْ گَلَكْ دِي هَبِنْ
دِدِينْ و دِدُنْيَايِي سَرْدَسْتَه بِنْ

Xuda wa spehî kit bi ‘ilm û ‘emel
Di wan da nehêlê tu ‘eyb û xelel

Li ser rêza ecdadê xwe ew biçin
Di şer‘a şerîf da bibin ew rikin

Me ra hê tu sax bî bibin ew mezin
Bi fedl û kemal û bi mal û bi jin

Di destê me nîn e ku laîq bitin
Tu tiştek ji xeyrê du‘a em bikin

Me hêvî j'Xudayê Te‘ala ew e
Nebînin di ‘umrê xwe derdê hewe

Rikin: Bingeh, binyat.
Xelel: Newekhevî.

خُدا وا سپحي كتْ بعلْمُ و عَملْ
دوانْدا نهيلي تُو عَيْبُ و خَلَلْ

لسَرْ ريزا اَجْدادى خوه اَوْ بچِنْ
دشَرْعَا شَريفْ دا بِبِنْ اَوْ رِكِنْ

مَرا هي تُو سَاغْ بي بِبِنْ اَوْ مَزِنْ
بِفَضْلُ و كَمَالُ و بِمَالُ وبِژِنْ

ددَسْتي مَه نِينَه كُو لاَئِقْ بِتِنْ
تُو تِشْتَكْ ژغَيْرى دُعَا اَمْ بِكِنْ

مَه هيڤي ژْخُدَايي تَعَالىٰ اَوَه
نَبِينْ دعُمْرى خوه دَرْدى هَوَه

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤١)

اَيْ شهيِ حلْوَه وْ حـدَّادَا رُوحنـيَا چاڤيِ دمنْ
اَزْدزانـمْ پشْـتيِ تَه لَـذَّتْ نَمـا دْ عُـمْرىِ دمـنْ

مه چـه ديتُ و چـه نَه ديتُ و دڤيِ عُمْـرىِ خوَيـيِ كِنْ
عَـسْكَـرىِ دَرْدُ و غَمـا هَرْدَمْ هُـجُـومَاتَـه لِمـنْ

مَـسْتَـرىِ دَرْدُو غَمـا بُو چُـوينَا شَـيْخيِ عَزيزْ
گَرْ چَـه مِنْ ديتِنْ ددُنْـيَايـيِ مُصـيبَـاتُ و حزنْ

چُونْكيِ أَزْ نَابِينمْ قَـطْ كَسْكيِ جهيِ وىِ بگرىِ
كُو ژْ بِرَايـيِ مَه مُسْلْمَـانْ رَا بِيتْ صَبْـرُو سكِنْ

چُونْكيِ عُمْرىِ خوَه تَلَفْ كِرْبُو اَوىِ دْرِيَا خُدىِ
مَـنْزِلُ و قُـونَـاغيِ ڤيِ رىِ وىِ دزَانيِ سَرُو بـنْ

اَزْ چـقَا بـيـژمْ ژكِـيـمَـا هـيِ دبـيـژمْ وَصْـفيِ شَـاهْ
اىِ كُـوديـتيِ بـيِ غَرَضْ بَـاوَرْدكِتْ قَـوْلىِ دمِـنْ

41.

Ey şehê Hilwe û Heddad rohniya çavê di min*
Ez dizanim piştî te lezzet nema d''umrê di min

Mi çi dît û çi nedît û di vî umrê xwe yê kin
'Eskerê derd û xema herdem hucûmat e li min

Mesterê derd û xema bû çûyina şeyxê 'ezîz
Ger çi min dîtin di dunyayê musîbat û hezin

Çunkî ez nabînim qet keskî cihê wî bigirê
Ku j'birayê me musulman ra bibit sebr û sekin

Çunkî 'umrê xwe telef kirbû ewî d'rêya Xudê
Menzil û qûnaxa vê rê wî dizanî ser û bin

Ez çiqa bêjim ji kêmahî dibêjim wesfê şah
Ê ku dîtî bêxered bawer dikit qewlê di min

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Şêx Îbrahîm Heqqî re hatiye nivîsîn. Şêx Îbrahîm Heqî şêxê Şêx Seyda ye.

Hilwe û Heddad: Du gundên Qamişlo ne.
Bêxered: Bêyî armancên şexsî. Bi rastî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

گَرْ كُو چافي مه بِبِتْ سِبي وكي يعْقُوبْ ژِ گرِينْ
هِنْدكه هيژي ژِفَحْرا چُوينا شاهي مَزِنْ

گَلْ ڤي قاسي اَمْ دكِينْ هيڤي وْ رِجا ئي ژِ خُدا
كُو نه چكْهي كهْنيا زيرينا باصْرتْ اَوْ ژِبنْ

وكْ فراتُ ودجلَه بتْ هردم بهركي شيفُ و رُوژْ
فَيضُ و نُورا ذُرِيتا ڤي قُطبي اَوْ لكُودي هبنْ

اَيْ علي غافلْ نبه گَرْ تُو وفَاداري ژِ دلْ
اَفْ دُعا دائم مُدامْ گافُ و سعَتْ وِردي تَه بِنْ

صدْهزَارْ رَحْمتْ بِبارِنْ ژْجانبِي ربّي رَحِيمْ
اَيْ شهي حلْوه مه قُربانا لسر رُوحي تَه بِنْ

سيصدُو هشتي وسِي پشتي هزاري هجْرتي*
(شاهي بُهطانْ) شيخْ ابْراهيمْ حقي اَمْ سيوي كِرِنْ

اَوْ لِباصْرتْ بُو ژدائي مدْفنا وي حلْوه هاتْ
صدْ خوزي وا كُو دنافْ وا اَفْ عزيزْ بُويه دفنْ

Ger ku çavê me bibit spî wekî Ye'qûb ji girîn
Hindik e hêjî ji qehra çûyina şahê mezin

Gel vîqasî em dikin hêvî w ricaê ji Xuda
Ku neçikhê kehniya zêrîn a Basret ew ji bin

Wek Ferat û Dîcle bit her dem biherkê şêv û roj
Feyd û nûra zuryeta vî qutbî ew l'kûdê hebin

Ey 'Elî xafil nebe ger tu wefadar î ji dil
Ev du'a daîm mudam gav û sa'et wirdê te bin

Sedhezar rehmet bibarin j'canibê Rebbê Rehîm
Ey şahê Hilwe mi qurbana li ser rûhê te bin

Sêsed û heştê w sisê piştî hezarê hicretê
Şahê Buhtan Şeyx Brahîm Heqqî em sêwî kirin

Ew li Basret bû ji daê, medfena wî Hilwe hat
Sed xwezî wa ku di nav wa ev 'ezîz bûye defin

Li gor navê Şahê Buhtan -Şêx Îbrahîm Heqqî- wefata wî ya bi hesabê ebced.

300	ش	Ş
1	ا	A
5	ه	H
10	ي	Ê
2	ب	B
5	ه	H
9	ط	T
1	ا	A
50	ن	N

383 h. beramber 1961 m.

Kurd û Kurdistan

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٢)

عَـلـيِ ژَارَا تُـو زَانـيِ مَـا چـه قَـوْمـيِ
جَـوَابَـكْ هَـاتُ و شَـوْطـيِ دَا فُـوئـَادِي

كُـو شَـاهْ حَـقَـيِ چُـو وُجـهْ بـيِ خَـوه يـيِ مَا
اَجَـلْ هَـاتُ و كَـتَـه پـيـشْـيَـا مُـرَادِي

خُـدَا زَانـيِ لـجَـمْ مَـه اَوْ عَـزيـرْ بُـو
شـيـريـنْ تـرْ بُـو ژ بَـاقـيِ مَـه وْ ژدَادِي

اَمـيِ چـه بـكـنْ ژ دَسْـتـيِ مَـه تُـو نَـايـيِ
كَـزَبْ پـرطـيِ بُـو وَكْ كُـنـكـيِ صَـرَادِي

لـجَـمْ خَـالـقْ دِ مـرنـيِ نـيـنَـه فَـرقـيِ
اَجَـلْ ژْ كـيـرَا كُـو هَاتْ تَـأخـيـرِي نَـادِي

خـلاَصـيِ ژْمرنـيِ قَـطْ ژْكَـسْـرَا تُـونـيـنْ
مُـحَـمَّـدْ مُـصْـطَـفَـىْ چُـو لَـسَـرْ قـيِ جَادِي

42.

‘Elî jara tu zanî ma çi qewmî*
Cewabek hat û şewtê da fuadê

Ku Şah Heqqî çû û cih bêxweyî ma
Ecel hat û kete pêşya muradê

Xuda zanê li cem me ew ‘ezîz bû
Şîrîntir bû ji bavê me w ji dadê

Emê çi bkin ji destê me tu nayê
Kezeb pertî bû wek kunkê seradê

Li cem Xaliq di mirnê nîn e ferqî
Ecel j'kê ra ku hat te'xîrê nadê

Xilasî j'mirnê qet j'kes ra tunîn in
Muhemmed Mustefa çû l'ser vê cadê

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Şêx Îbrahîm Heqqî re hatiye nivîsîn.
Kunk: Qul, qulik.
Fuad: Dil.
Serad: Cureyekî bêjingê ye, bêjinga qulikên wê gir.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Wekî ew çû gelo kî dê bimînit
Ji wî çêtir Xuda nanî îcadê

Xuda sebrê bidê ehlê wî tev da
Bi rehma xwe derê vê huznê dadê

Bidit zarwê wî rutba wî temamî
Bibit heryek ji wan qutbê cîhadê

Hezar rehmet bibarin j'canibê Heq
Li qutbê Hilwe û şahê Hedadê

Hezar û sêsed û heştêy sisê da
Wefata Şahê Bohtan hat sewadê

Li Basret bû ji dayê Hilwe şîrîn
Bûye medfen Xuda da wa kî nadê

Hat sewadê: Hate nivîsîn.
Medfen: Ciyê ku mirî lê tên veşartin.

وكـيِ اَوْ چُـو گـلُـو كـيِ دى بـمـيـنـتْ
ژوى چـيـتـرْ خُـدَا نـانـيِ ايـجـادى

خُـدَا صَـبْـرى بـدى اَهْـلـيِ وى تَـقْـدَا
بـرَحْـمَـا خـوه دَرى قُـيِ حُـزنـيِ دَادى

بـدتْ زَارْوى وى رُتْـبَـا وى تَـمَـامـى
بـبـتْ هَـرِيـكْ ژوَانْ قُـطْـبـيِ جِـهـادى

هَـزَارْ رَحْـمَـتْ بَـبَـارنْ ژْجَـانـبـى حَـقْ
لِـقُـطْـبـيِ حِـلْـو ژُ شَـاهـيِ حَـدَادى

هَـزَارُو سِـيـصَـدُو هَـشْـتـيِ سَـيـدَا
وَفَـاتَـا (شَـاهـيِ بُـوهْـطَـانْ) هَاتْ سَوَادى

لِـبَـاصْـرَتْ بُـو ژدَايـيِ حِـلْـوَه شِـيـريـنْ
بُـويَـه مَـدفَـنْ خُـدَا دَاوَاكَـه نَـادى

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

43.

Me çiqa pursî û seh kir Şah Heqî qet me nedî*
Teb'ekî şîrîn bi mislê teb'ê te ey nûrî 'eyn

Pur 'ecîb nîn e çikû fer'ê ji bo wî eslê pak
Qutbê eqtabê zeman şeyxê me Şeyx Hacî Huseyn

Ger çi cismê we di axa merqeda nûranî ye
Rûhê we em hîvîdar in l'cennete bê kizb û meyn

Ya îlahî tu xweyî ke rûhê wa şeyxên 'ezîz
Der riyadê rehmeta xwe daîma bê te'b û eyn

*Ev helbest ji Şêx Îbrahîm Heqqî re hatiye nivîsîn.
Bê kizb û meyn: Bê vir û mir, bi rastî.
Hacî Huseyn: Bavê Şêx Îbrahîm Heqqî ye.
Riyad: Mêrg.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٣)

مه چقا پرسي ؤ سح كر شاه حقي قط مه ندى
طبعكي شيرين بمثلي طبعي ته اي نورِ عين

پر عجيب نينه چكو فرعي ژبو وى اصلي پاك
قطبِ اقطابِ زمان شيخي مه شيخ حاجي حسين

گر چه جسمي وه د آخا مرقدا نورانيه
روحي وه أم هيڤي دارن لجنته بي كذب و مين

يا الهي تو خويكه روحي وا شيخين عزيز
در رياضي رحمتا خوه دائما بي تعب و اين

هم بده اعلا مراتب هديئى اولادى وان
تو دواندا قط نهيله ذره يكى عيب و شين

هركسى گوهدارىا وان سر وى بستانا بكت
تو بده وى ناف و ناموسى دشرق و مغربين

او كسى دلرحتى چيكت ژ بووا جزنكى
تو بفضلا خوه هلين وى رحتيى زوكا ژ بين

اى خدا ام ژ ته دخوازن تو قبول كى فا دعا
هم نكى محروم علي ژانظارى اولادى حسين

Hem bide e'la meratib hedyeê ewladê wan
Tu di wan da qet nehêle zerreyekî 'eyb û şeyn

Herkesê guhdariya wan serwîbostana bikit
Tu bide wî nav û namûsê di şerq û mexribeyn

Ew kesê dilrehtiyê çêkit ji bo wa cuz'ekî
Tu bi fedla xwe hilîn wê rehtiyê zûka ji beyn

Ey Xuda em j'te dixwazin tu qebûl kî va du'a
Hem nekî mehrûm 'Elî j'enzarê ewladê Huseyn

Kurd û Kurdistan

Enzar: Nêrîn, raman.
Meratib: Rûtbe.
Serwîbostan: Bejinbilind.
Şeyn: Qisûr, kêmasî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٤)

سَلامَا دخوازمْ لسَرْ وَه برا
دكمْ پُرسْ وحالي هچي كُو لْورا

بزانَه مَه مَكْتُوبْ ژ تَه لْقرْ ستانْدْ
جَوابَا وي مَكْتُوبي قَه مَه شيانْدْ

اگَرْ هُونْ لحالي مَه پُرسي دكنْ
هزارْ حمدْ ژ خُدايي خوه را امْ دكنْ

سَلامَتْ و صحَّتْ هَيَه مَه نهَا
اَونْ تشتَا نافْ عالَميدا بهَا

مَه هيڤي ژخُدا كُو ژ وَرا ژي هَبنْ
كُوصاغْ و سَلامَتْ ژي هُونْ وكْ مَه بنْ

اگَرْ هُونْ دپُرسنْ لحالي وَلاَتْ
زڤستانكي هُولي مَه كيمْ دي كُو هَاتْ

44.

Selama dixwazim li ser we bira*
Dikim purs û halê heçî ku l'wira

Bizane me mektûb ji te l'vir sitand
Cewaba wê mektûbê ve me şiyand

Eger hûn li halê me pursê dikin
Hezar hemd j'Xudayê xwe ra em dikin

Selamet û sihhet heye me niha
Ew in tişta nav 'alemê da biha

Me hêvî j'Xuda ku j'we ra jî hebin
Ku sax û selamet jî hûn wek me bin

Eger hûn dipursin li halê welat
Zivistankî holî me kêm dî ku hat

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Seyid Zahirê Wanî re hatiye nivîsîn. Seyid Zahir dostekî Seyid 'Elî ye.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Ji baran û berf û ji sirr û seqem
Cihê me hema bêj ku bûye ‘edem

Sewalê cihê me telef bû kesîr
Ne şîr e ne mast e ne dohn û penîr

Eve hat bihar û ema nav bihar
Ne kehrik ne berxik dikin barebar

Heta kı niha jî zira‘et niye
Xuda zanitin ‘aqîbet ka çi ye

Me hêvî j'Xuda ye ku rehmê bikê
Derê xêr û xweşyê li ser me vekê

Kurd û Kurdistan

Aqîbet: Dawî, encam.
Kesîr: Pir.
Sewal: Heywanên malê.
Sirr: Bayê pir sar, serma dijwar.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ژبارانُ و بـرفُ و ژ صـرُو سـقـم
جـهـي مـه هـمـا بـيـژ كـو بـويـه عـدم

سـوالـي جـهـي مـه تـلـفْ بُـو كـثـيـرْ
نـه شـيـرَه نـه مَاسْـتـه نه دُهْـنُ و پـنـيـرْ

أفـه هـاتْ بـهـارُو أمـا نـافْ بـهـارْ
نـه كـهـرگْ نـه بـرْخـكْ دكـنْ بـارَه بـارْ

حـتـا كـو نـهـا ژى زِرَاعـتْ نـيـه
خُـدَا زَانـتـن عـاقـبـتْ كـا چـيـه

مـه هـيـڤـي ژْخُـدَايـه كـو رَحـمـي بـكـي
دَرِي خـيـرُوخـوشـيـي لْـسَـرْمَـه ڤـكـي

چـه تـشـتـا وى ڤـتْ هَـرْ اَوَه كُـو هَـبـى
اَوَا وى نَـڤـى قَـطْ نَـمَـا كُـو بِـبـى

بِـزَانْ بُـويَـه زَاڤَـا مُـحَـمَّـدْ اَمِـيـنْ
بَـدَلْ بُـويَه گِـريْـي وى تَـڤْـدَا بْـكَـنِـيـنْ

دلـي وى هَـيَـه كُـو بِـخُـونـتْ تَـمَـامْ
اَگَـرْ حَـزْبِـكِـتْ خَـالِـقـي لاَ يَـنَـامْ

دِكَـنْ زَارُو تَـڤْـدَا سَـلاَمَـا لْـهَـوَه
اَوَا ژْبِـيـرْتَـكِـنْ هَـرْ كُـلاَ وَانْ اَوَه

Çi tişta wî vit her ew e ku hebê
Ewa wî nevî qet nema ku bibê

Bizan bûye zava Muhemmed Emîn
Bedel bûye giryê wî tev da b'kenîn

Dilê wî heye ku bixûnit temam
Eger hez bikit Xaliqê la yenam

Dikin zaro tev da selama l'hewe
Ewa j'bîr nekin her kula wa ew e

La yenam: Yê ku ranazê.
Nevî: Nevê, nexwazê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

45.

Selam ser te Mela Ehmed bi zehfî*
Me hêvî j'te tu vê car me nedehfî

Tu bişyîne j'me ra tozek ji çayê
Çikû l'cem me nema sebra me nayê

Li sûkê kîlo çû sih banqenotan
Neqam bûye ji xeyr tuccar û lortan

Emê dê jê vebin lê hêdî hêdî
Tu vê neqlê bi libkî me bke hêdî

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Mela Ehmed Elo re hatiye nivîsîn. Mela Ehmed Elo muezzin û birêvebirê îqtîsadê yê Şêx Seyda bû.

Nedehfî: Me red nekî.
Neqam: Kûrahiya ji bejnekê zêdetir.
Tozek: Hinek, miqdarekî hindik.
Lort: Dewlemendên mezin, pozbilind.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٥)

سـلاَمْ سَـرْ تَـه مـلاَ اَحْـمَـدْ بِـزَحْـفـيِ
مَه هـيـڤـيِ ژْتَه تُو ڤـيِ جَارْ مَـه نَدَحْـفـيِ

تُـو بِـشْـيـنَـه ژْمَـرَا تُـوزكْ ژْجَـايـيِ
چـكُـو لْـجَـمْ مَـه نَـمَـا صَـبْـرَا مَه نَـايـيِ

لـسُـوكـيِ كـيـلُـو چُـو سَـه بَـانْـقَـنُـوطَـانْ
نَـقَـامْ بُـويَـه ژْ غَـيْـرْ تُـجَـارُو لُـورْطَـانْ

اَمـيِ دِي ژْيِ فَـبِـنْ لـيِ هـيـدِي هـيـدِي
تُـو ڤـيِ نَـقْـلـيِ بِـلِـبْـكـيِ مَـه بْـكَـه هـيـدِي

46.

Selaman dixwazim dewamen mudam*
Ji ser we ji Rebbê Kerîm ê Selam

Du'ayan dixwazim di xeyb û hudûr
Ji bo we ji Rebbê Kerîm ê Xefûr

Dixwazim du'a her demadem ji we
Dikim daîma pursa halê hewe

Di piştê rica a du'a em dikî
Dibêjit ji bo we 'Elî Findikî

Eger hûn dipursin li ehwalê me
Li tengî w firahî we keyfa di me

* Ev helbest ji Mela Necmeddînê Kercosî re -bi munasebeta hatina kurê wî- hatiye nivîsîn. Mela Necmeddîn Seydayê Seyid Elî ye.

Demadem: Hertim, bênavbir.
Hudûr: Hazirbûn.
Mudam: Daîmî, hertim.
Xeyb: Nehazirbûn.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٦)

سَلاَمَانْ دِخوَازِمْ دَوَامَاً مُدَامْ
ژِ سَرْ وَه ژِ رَبِّي كَرِيمِ سَلاَمْ

دُعَايَانْ دِخوَازِمْ دِغَيْبُ وَ حُضُورْ
ژِبُو وَه ژِ رَبِّي كَرِيمِ غَفُورْ

دِخوَازِم دُعَا هَر دَمَا دِم ژِ وَه
دِكِمْ دَائِمَا پُرسَا حَالِي هَوَه

دِ پِشتِي رِجَاَ دُعَا اَمْ دِكِي
دِبِيژِتْ ژِ بُو وَه عَلِي فِندِكِي

اَگَرْ هُونْ دِپُرسِنْ لاَحْوَالِي مَه
لِطَنگِي وْ فِرَاهِي وَ كَيْفَا دِ مَه

هَـزارْ حَـمْـدْ ژ بُـو خَـالـقـي لاَ يَـنَـامْ
كُـو اَمْ رَاحَـتـن كَـيْـفْ خوشْـن بِالـتَّـمَـامْ

دخـــوازنْ ژ بُـــو وَه وصَـــا رَاحَـــتـــي
كُـو هُونْ قَـطْ نَـبِـيـنْ تُو جَـازَحْـمَـتـي

لـدُنْـيـا ؤ عَـقْـبـى بِـكَـيْـفُ و صَـفَـا
خُـدَا وَه خـويـكـتْ نَـدتْ وَه جَـفَـا

اگَـرْ هُـونْ دپُـرْسـنْ اَخـي مـنْ ددِيـنْ
عَـزِيـزى هـوَه لَـهـرْ مُـحَـمَّـدْ اَمِـيـنْ

بِـفَـضْـلاَ خُـدى قَـطْ تُونِـيـنْ تُـو غَـمْ
ژ غَـيْـرِ فِـرَاقَـا وَه اَيْ مُـحْـتَـرَمْ

دقُـنْـجَـا سَـلاَمَـتْـدَه رُونـشْـتِـيـه
بِـقَـصْـدَا كُـو پِـي هَـاتِـي اَوْ چِـيـبِـيـه

بِـتَـحْـصِـيـلاَ عِلْـمِـي دكَـتْ اشْـتِـغَـالْ
بِـرُوژُو بِـشُـفْ نَـامِـيـنِـي قَـطْ بَـطَـالْ

Hezar hemd ji bo Xaliqê la yenam
Ku em rahet in keyfxweş in bit-temam

Dixwzin ji bo we wisa rahetê
Ku hûn qet nebînin tu ca zehmetê

Li dunya û ‘uqba bi keyf û sefa
Xuda we xweyî kit nedit we cefa

Eger hûn dipursin exî min di dîn
‘Ezîzê hewe l'hir Muhemmed Emîn

Bi fedla Xudê qet tunîn in tu xem
Ji xeyrî firaqa we ey muhterem

Di qunca selamet de rûniştiye
Bi qesda ku pê hatî ew çêbiye

Bi tehsîla ‘ilmê diket iştîxal
Bi roj û bi şev namênê qet betal

Kurd û Kurdistan

Exî: Bira.
La yenam: Yê ku ranazê.
Uqba: Axret.
Qunca selamet: Ciyê ewleyiyê.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

دلـی وه ژطـرف وی قـه راحـت بـتـن
لـجـم مـه سـپـاری خـدا اَو بـتـن

اگـر کـو خـدی عـمـری وی، کـت دریـژ
بـقـی طـرزی وی اَو کـلا دل بـریـژ

خـدایـا بـبـی تـو ژبـو وی مـعـیـن
بـدی وی مـرادی ددنـیـا ژ دیـن

دگـل بـاب و دا ژ بـرایـیـن هـیـی
وهـا رنـگـه اَم ژی نـبـن بـی خـویـی

تـمـام اَم بـبـن تـابـعـی مـصـطـفـیٰ
بـچـن جـنـتـیـدا بـصـدق و صـفـا

هـزاران صـلات و هـزاران سـلام
بـبـارن ولا یـنـقـطـع بـالـدوام

لـسـر وی رسـولـی کـریـمـی اَمـیـن
و هـم آل و اَصـحـابـی وی اَجـمـعـیـن

Dilê we j'teref wî ve rahet bitin
Li cem me siparê Xuda ew bitin

Eger ku Xudê ‘umrê wî kit dirêj
Bi vî terzî wê ew kula dil birêj

Xudaya bibî tu ji bo wî mu‘în
Bidî wî muradê di dunya û dîn

Digel bab û da û birayên heyî
Wihareng e em jî nebin bêxweyî

Temam em bibin tabi‘ê Mustefa
Biçin cennetê da bi sidq û sefa

Hezaran selat û hezaran selam
Bibarin wela yenqetî‘ bîd-dewam

Li ser wî Resûlê Kerîm ê Emîn
We hem al û eshabê wî ecme‘în

Bîd-dewam: Bê navbir bidomin.
Ecmeîn: Tev, tevan.
Mu‘în: Alîkar.
Xudaya: Ey Xweda.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٧)

سَلامٌ عَلَيْكُمْ سُكَانَ الإزَارْ
سُكَانَ الإزَارِ عَلَيْكُمْ سَلامْ

سَلامٌ عَلَى أَهْلِ مَأوَاكُمُ
إِلَى أَنْ تَفُوزُوا بِدَارِ السَّلامْ

وَبَعْدُفَفِي الْهِجْرِ مَا قَدْ مَضَى
فَهَلْ لِجُرُوحِ الْفُؤَادِ التِيَامْ

وَلَمْ يَبْقَ فِي الْعُمْرِ مِنْ فُسْحَةٍ
فَهَلْ مِنْ ضِيَاءٍ يُزِيلُ الظَّلامْ

47.

Li ser we selam bin ey ehlê Îzar*
Gelî ehlê Îzar ser we bit selam

Selam bit li ser ehlê warê hewe
Heta ku hûn biçine Darus-Selam

Di piştvê, tişta ku li hicrê bûye
Ma saxbûn heye j'bo birîna dilan

Di 'umrêm nemaye qet tu firehî
Ma heye roniyek belav kit zelam?

Kurd û Kurdistan

*Eslê vê helbestê erebî ye, me wergerande kurdî.
Darus-Selam: Navekî bihiştê ye.
Îzar: Gundekî Kerboran e. Ev gund havîngeha Şêx Seyda bû.
Zelam: Tarî, tarîtî.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Ezê çi bêjim û ezê çawa kim
Jixwe l'min teng bûye mecala kelam

Spas j'wî ra bit bo tiştên buhurî
'Elîm e Hekîm e bi ya l'nav kesan

Mîrê min Xuda 'umrê we drêj bikit
Cejna we wek navê we bit her dewam

'Elî nexweş e hem 'Elî belengaz
Tiştê dîtiye, wek dîtiye d'xewnan

فَمَاذَا اَقُولُ وَ كَيْفَ اَجُولْ
فَضَاقَ عَلَيَّ مَجَالُ الْكَلَامْ

لَهُ الْحَمْدُ دَوْمًا عَلَى مَا مَضَى
عَلِيمٌ حَكِيمٌ بِمَا فِي الْأَنَامْ

فَعُمْرُكُمُ سَيِّدِي فِي الْمَزِيدْ
وَعِيدُكُمُ كَاسْمِكُمْ بِالدَّوَامْ

عَلِيٌّ عَلِيلٌ عَلَى ذَلِيلْ
كَأَنْ قَدْ رَأَى مَا رَأَى فِي الْمَنَامْ

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٨)

بَـــرْقَـــكْ فِـــدَا ژْ جَـــنْـــبِـــي هَـــوَه
أَفْـــيِـــتَـــه سَـــرْ جَـــنَّـــتْ بَـــرِي

اَژْ پَـــرْطَـــانْـــدِمْ دَرْبَـــكِـــي
پُـــشْـــمَـــانْ كِـــرِمْ لَـــحَـــالِـــي بَـــرِي

ظَـــنْ وْ گُـــمَـــانْ كَـــنْـــگِـــي هَـــبُـــو
كُـــو اَفْ فَـــقِـــيـــرْ بِـــي وِيـــدَرِي

شَـــيْـــخِـــي عَـــزِيـــزْ اَمْـــرِي بِـــكَـــي
چَـــاوَا كُـــو هَـــاتِـــي وِي هَـــرِي

مَـــهْـــدَرْچِـــيـــي خَـــلْـــقِـــي اَبُـــومْ
ژْبُـــو مِـــه كِـــيـــي كِـــتْ مَـــهْـــدَرِي

48.

Berqek veda j'cenbê hewe*
Avête ser cennet berê

Ez peritandim derbekî
Poşman kirim l'halê berê

Zenn û guman kengî hebû
Ku ev feqîr wê bê derê

Şeyxê 'ezîz emrê bikê
Çawa ku hatî wê herê

Mehderçiyê xelqê e'bûm
J'bo mi kî yê ket mehderê

Kurd û Kurdistan

*Ev helbest ji Şêx Seyda re hatiye nivîsîn.

Cenb: Alî.
Mehderçî: Şefaetvan.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

ديتن بلا لدنيا نبي
ترسا مه روژا محشري

هيڤي وْ رجاآ مه اوه
سيدا نشو مه ژدفتري

باڤي عجيبا دنيه
نمنن عجيبْ ژ في ماجري

بلكي ژ في مستر هيه
دْ مخزنا خيرو شري

مرنا مه وا نيزيك بُوي
هاها بچينه مقبري

Dîtin bila l'dunya nebî
Tirsa me roja mehşerê

Hêvî w rica a me ew e
Seyda neşo me j'defterê

Bavê 'ecêba dunye ye
Nemnin 'ecîb j'vê macerê

Belkî ji vê mestir heye
Der mexzena xeyr û şerê

Mirna me wa nêzîk buwî
Ha-ha biçîne meqberê

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٤٩)

اَڤـه عـيـدْ هَـاتُ و پـيـرُوزُو مَـبَـارَكْ
بِـتِنْ لْـتَـه كِفْـلَـتِي تَـه صَـدْ هَزَارْ جَـارْ

نَـه يَـكْ دُوبِـنْ گَـلَـكْ دِيـژِي وِهَـا بِـنْ
بِـوَانْـدَا هُـونْ بِـبِـنْ بْـشَـانُ و شَـرَفْـدَارْ

اَگَـرْ هُـونْ لْـمِـنْ دِپـرْسِـنْ اَزْ چَـه بِـيـژِمْ
دِنَـافْ حَـمْـيَـا لِـمَـيْـدَانِـي اَزِمْ قَـارْ

عَـلِي ژْ مِـرْيَـا حَـسَـابْ كِـنْ نَـه ژْ سَاغَـا
دُعَـا ژِيـرَا بِـكِـنْ خِـيـرَا خَـوَه جَـارْ جَـارْ

مَـه جَـرْبَـانْـدِنْ ژْ اَهْـلِـي ڤِـي دِنِـي پُـرْ
گَـلَـكْ كِـيـمْ بُـونْ دِنَـافْ وَانْـدَا وَفَـادَارْ

اَڤـه حَـالِـي مَـه ژُ دُنْـيَـا نَـبِـي تُـو
خُـدَا رَبِـي لَأَخْـرَتْ مَـه بْـكَ خَـوَيْ كَـارْ

هَـزَارْ حَـمْـدُو ثَـنَـا رَبِـي ژْ ڤِـي حَـالِـي
كُـو بَـاپِـيـرِي مِـنَـه اَوْ شِـيـرِي كَـرَّارْ

49.

Eve ‘îd hat û pîroz û mubarek*
Bitin l'te kifletê te sed hezar car

Ne yek do bin gelek dî jî wiha bin
Bi wan da hûn bibin b'şan û şerefdar

Eger hûn l'min dipirsin ez çi bêjim
Di nav hemya li meydanê ez im qar

‘Elî j'mirya hesab kin ne ji saxa
Du‘a jê ra bikin xêra xwe car car

Me cerbandin ji ehlê vê dinê pur
Gelek kêm bûn di nav wan da wefadar

Ev e halê me û dunya nebî tu
Xuda Rebb li axret me b'ke xweykar

Hezar hemd û sena Rebbî j'vî halî
Ku bapîrê min e ew Şêrê Kerrar

Kurd û Kurdistan

* Ev helbest ji Şêx Seyda re hatiye nivîsîn.
Kiflet: Zar û zêç.

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

50.

Wefadarî nema ye ey birader
Bi cem kê va biçit ew wî dikit der

Xedir cih girtiye şûna emînî
Ji bo te ez çi bêjim tê dibînî

Gelek kêm in gelek kêm in wefadar
Ji me bawer dikit yê dîtî bazar

Bira hişyar bibe taze binêre
De tu bzanî kî mêrkok e kî mêr e

Ne heçyê ku bi dev xweş kir zelam e
Zelamî tiştek e derman dewam e

Belê hetta ti karî bke îdare
Nema gelkî ‘umur ha-ha êvar e

Me cerbandin gelek ehlê zemanî
Ne wek xwe derketin bûne beranî

Hira-wêra nebûn cem xwe temam bûn
Hinek sofî hinek şeyx hin îmam bûn

Dizî j'kelha dibit ev hatye gotin
Şete l'derna dinêrî vêle wê bin

Kurd û Kurdistan

Hira-wêra: Virde wirde.
Şet: Çem, robar.
Vêl: Ne kûr, ya ku binê wê bilind.

(٥٠)

وَفـــاداری نـــمـــايـــه اَيْ بـــرادَرْ
بِـجَـمْ كـيـڤـا بـچِـتْ اَوْ وی دِكـتْ دَرْ

غَـدِرْ جـهْ گـرتـيـه شُـونـا اَمـيـنـي
ژ بُـو تـه اَز چـه بـيـژم تـي دِبـيـنـي

گَـلَـكْ كـيـمـنْ گَـلَـكْ كـيـمـنْ وَفـادارْ
ژ مـه بـاوَرْ دِكـتْ يـي ديـتـي بـازارْ

بـرا هـشـيـارْ بـبـه تـازه بـنـيـره
دَه تُو بـزانـي كـي مـيـرْكُو كـه كـي مـيـره

نـه هـچـيـي كُـو بـدَفْ خـوَشْ كـرْ زَلامَـه
زَلامـي تـشـتـكَـه دَرْمـانْ دَوامَـه

بَـلـي حـتـىٰ تـه كـاری بْـكَـه ادارَه
نـمـا گَـلـكـي عُـمُـرْ هـاهـا ايـڤـاره

مَـه جَـرْبـانـدنْ گَـلَـكْ اَهْـلـي زَمـانـي
نـه وَكْ خـوَه دَرْكَـتـنْ بُـونـه بـرانـي

هـراويـرا نَـبُـونْ جَـمْ خـوَه تَـمـامْ بُـونْ
هـنَكْ صُـوفـي هـنَكْ شَـيْـخْ هـنْ اِمامْ بُـونْ

دزی ژْكَـلْـهـا دبـتْ اَفْ هـاتـيـه گُـوتـنْ
شَـطَـه لْـدرْنـا دنـيـری ڤـيـلَـه وی بـنْ

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Welê baş e ku dostê mû Xuda bit
Ew e kafî tu tişt bê wî qe nabit

Belê hin jî hene dostê Xudayî
Bila j'wan ra miro b'kit canfidayî

Nîşanê wa hene cem imtîhanê
Heçî 'aqilbitin ew wan dizanê

Heçî dost bit heq e dostek durust bit
Ne wek te w min j'dizî va dostê sist bit

E'jî j'wan im ne ez dostek wefî me
Hemî kes min dizanê ez 'Elî me

Sipî ne bêhnekî em bêhnkî qîr in
Wekî kuç bêhnkî, bêhnkî wek hevîr in

Ji bo te ey birader ez çi bêjim
Ne lazim ez kula dil j'dil birêjim

Hema hindek dibit nîşanê gelkî
Dişewtit fêrisek gunda bi pelkî

Li axret herkesê bighête ya xwe
Ne xwezya wî bibit poşman li ya xwe

وَلي بَاشه كُو دُسْتي مُو خُدا بِتْ
اَوَه كَافي تُو تِشْتْ بي وي قَه نَابِتْ

بَلي هِنْ ژي هَنَه دُوستي خُدَايي
بِلاَ ژْوَانْرا مِرُو بْكِتْ جَانْ فَدَايي

نِشَانِي وَا هَنَه جَمْ اِمْتِحَانِي
هَچِي عَاقِلْ بِتِنْ اَوْ وَانْ دِزَانِي

حَچِي دُوسْتْ بِتْ حَقَه دُوسْتَكْ دُرُسْتْ بِتْ
نَه وَكْ تَه وْ مِنْ ژْ دِزِيقَا دُوستي سِسْتْ بِتْ

اَژِي ژْوَانِمْ نَه اَزْ دُوسْتَكْ وَفِيمَه
هَمِي كَس مِن دِزَانِي اَز عَلِي مَه

سِپِينَه بِيهْنَكِي اَمْ بِيهْنَكِي قِيرِنْ
وَكِي كِچْ بِيهْنَكِي بِيهْنَكِي وَكْ هَڤِيرِنْ

ژْبُو تَه اَيْ بِرَادَرْ اَزْ چَه بِيژْم
نَه لاَزِمْ اَزْ كِلاَ دِلْ ژْ دِلْ بِرِيژْم

هَمَا هِنْدَكْ دِبِتْ نِيشَانِي گَلْكِي
دِشُوطِتْ فِيرِسَكْ گُنْدَا بِپَلْكِي

لاَخْرَتْ هَرْكَسِي بِگْهِيتَه يَا خُوَه
نَخُوزْيَا وِي بِبِتْ پُوشْمَانْ لِيَا خُوَه

https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

(٥١)

گـــر پـــرســـا مـــن دكـــي تُـــو
كـــا حـــالـــي مـــن چـــه حـــالـــه

پـــشـــتـــي تـــه دي چـــوا بُـــوم
بُـــومـــه پـــطُـــوطـــه ركـــالـــه

ڤـــارُوژا از كـــتـــيـــمـــه
لـــنـــگـــي مـــه نـــالـــه نـــالـــه

دچـــم بـــريـــڤـــا بـــيـــپـــا
يـــي تـــازه تـــر كـــپـــالـــه

دُنـــيـــا تـــژي بـــلايـــه
خـــلاصـــي ژوا مُـــحـــالـــه

خـــوزي وي كُـــو هـــشـــيـــاربـــي
نـــكـــي ژخـــوه را هـــڤـــالـــه

بـــكـــي تـــيـــدا ادارَه
نـــكُـــو بـــكـــي وي مَـــالـــه

نـــكـــيـــتـــن حـــيـــلـــه بـــازي
بـــخـــوي كـــدا حـــلالـــه

فـــيـــدا كـــســـي تُـــو نـــادي
غـــيـــر قـــلـــبـــي زلالـــه

عـــلـــي ژ خـــدا دخـــوازت
خـــلاص بـــي بـــي سُـــؤالـــه

بـــخـــوي كـــدا دَســـتـــي خـــوَه
بـــلا جـــه بـــت نُـــوالـــه

نـــيـــنـــه چـــيـــر ژقـــنـــاعـــت
طـــمـــاعـــي نـــه نُـــو حـــالـــه

51.

Ger pirsa min dikî tu
Ka halê min çi hal e

Piştî te dê çewa bûm
Bûme petote w kale

Va roja ez ketîme
Lingê me nalenal e

Diçim b'rê va bi sê pa
Yê tazetir kopal e

Dunya tejî bela ye
Xilasî j'wa muhal e

Xwezî wî ku hişyar bê
Nekê j'xwe ra hevale

Bikê tê da îdare
Ne ku bikê wê male

Nekitin hîlebazî
Bixwê keda helale

Feyda kesî tu nadê
Xeyrî qelbê zelale

'Elî j'Xuda dixwazit
Xilas bê bê sual e

Bixwê keda destê xwe
Bila cih bit nuwal

Nîn e çêtir j'qena'et
Temahî ne tu hal e

Kurd û Kurdistan
https://www.facebook.com/pages/Kurd-û-Kurdistan/432208003502433

Seyid Eliyê Findikî

DÎWAN

Seyid Eliyê Findikî, di sala 1309ê Hîcrî (1892ê Mîladî) de li Findika Botan hatiye dunyayê. Di sala 1387ê Hîcrî (1967ê Mîladî) de jî wefat kiriye. Alimekî gelek mezin e û di gelek medresên kurdan de ders daye.

Seyid Eliyê Findikî *Dîwan*a xwe bi zimanekî şîrîn û zelal nivîsandiye. Gelek şiîrên wî, bi qelema hinek mela û feqiyan hatine nivîsandin. Şiîrên wî di nav xelkê de belav bûne û hatine jiberkirin, lêbelê heta roja îro çap nebûne.

Me ev *Dîwan*a hêja bi du alfabeyan amade kiriye: li alîkî tîpên erebî, li aliyê din jî tîpên latînî hatine danîn. Bi vî awayî, em hêvî dikin ku wê bêhtir kes vê pirtûkê bixwînin.

Şiîrên Seyid Eliyê Findikî, gelekî dewlemend in. Mijarên şiîrên wî cihê cihê ne. Di şiîrên xwe de ji orf û adetên kurdan nimûneyan dide; ji çêkirina nivişтan, ji bihevnekirina xizm û pismaman, ji derengmayina biharê, ji nedana zikatê bi musteheqan, ji terka hezkirina dunyayê, ji xurbet û xerîbiyê û ji mirinê behs dike.

Seyid Eliyê Findikî, sedema nivîsandina şiîrên xwe di şiîreke xwe de weha eşkere dike:

Ne ez şeyx im ku we'zê kim
Ne maldar im ku xêrê kim
Du-sê beyta ezê çêkim
Ji xeyrî vê ji min nayê

Nûbihar